T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
SANAT TARİHİ ABD
KÜRT DILI VEKÜLTÜRÜ BİLİM DALI

# REHENDÊN DÎROKÎ Dİ ROMANA "XEWNA ZELAMÊN ÎRANÎ" MARDÎN ÎBRAHÎMÊ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN: Sahand Safeen Saadi SAADI

DANIŞMAN: Yar.Doç.Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN – 2016

K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

**REHENDÊN DÎROKÎ Dİ ROMANA "XEWNA ZELAMÊN ÎRANÎ" YA MARDÎN ÎBRAHÎMÊ**

TEZA LÎSANSA BILIND

AMADEKAR: Sahand Safeen Saadi SAADI

ŞÊWIRMEND: Yar.Doç.Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN – 2016

K.T
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# REHENDÊN DÎROKÎ Dİ ROMANA “XEWNA ZELAMÊN ÎRANÎ” YA MARDÎN ÎBRAHÎMÊ

TEZA LÎSANSA BILIND

AMADEKAR: Sahand Safeen Saadi SAADI

VAN – 2016

TEZA LÎSANSA BILIND

Sahand SAADI

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN
Haziran, 2016

**REHENDÊN DÎROKÎ Dİ ROMANA "XEWNA ZELAMÊN ÎRANÎ" MARDÎN ÎBRAHÎMÊ**

## KURTE

Gelek buyerên dîrokê dikarin bibin çavkaniya îlham û bibin amûr ji bo wêje yê, roman nivîs buyerên giring ên dîrokî yan jî çend buyerên ku hatine jibîrkirin û ji aliyê dîrokzanan ve pir zêde giringî jê re nehatiye dayîn, yan jî qesdî nehatine tomar kirin gelek car wan buyerane dixin nav berhemên xwe yên wêjeyî de. Wê demê çavkaniya îlhamê ya wêje yê gelek car bi buyerên dîrokî ve girêdayî ye.Lê nabe vê yekê ji bîrbikin ku roman nivîs, dîrok nivîs nîne. Ji ber ku cudayiyek zêde di navbera wan de heye. Fîlozofeke wek Arîsto di pirtûka xwe ya bi nave ''Hûnera helbestan'' de bi awayekî xweşik û balkêş vê cudayî yê ronahî dike. Li gor Arîsto dîrok nivîs tenê dikarin wan buyeran vegote bikin, ku di raboriyê de pêkhatine. Lê wêjevan yan jî roman nivîs hêza wî heye û dikare wan buyeran vegote bike ku hîn pêk nehatine û lê dibe ku pêk jî bên. Wê demê cudayiya di navber wêje û dîrokê di vêde ye ku wêje hêza vê ya pêşbînî kirinê û gotin pêşxistinê heye li ser pêşerojê û dikare gotin li ser buyerên dibe ku di pêşerojê de pêkbên bike.Li beranber da dîrok bi tu awayekê nikare gotin li ser pêşerojê bike û bi tu awayekê hêza xeyal, fantazî û estetîkê nikare bikar bîne. Bi piştîwaniya wan gotinên li jor hatine kirin, em dikarin bêjin cudayî ya wêje û roman nivîsan li gel kesên din ên asayî da ew e ku wêjevan dikare agahiyan li ser êş û azarên kesên din bide, ji ber ku mirov hemû jî xwediyê gelek çîrok, bîranîn û xemên kûr ên xwe yên taybet bi wan ve girêdayî li gel xwe digerînin û hêza vegote kirina wan çîrok, bîranîn û êş û azaran tuneye. Ji vê derê roman nivîs hin buyerên dîrokî yên giring ên serdema xwe û yên serdema berî xwe bi yek ve girêdide û romaneke dîrokî ji vê derdixînê û dike berhem. Ji ber vê jî em dikarin bibêjin rastiyên nav romanê, heman rastiyên nav dîrokê nînin. Roman pêkhateya hin buyeran hatiye avakirin û rastiyên ku di romanê de xeyalî ne, ne ew rastiyên ku em dibînin û

hest pê dikinin. Ji bo mînak dîrok wêneyekî pir giştî û yê mezin ê buyeran dikşîne. Lê roman nivîs dikeve nav hurkariyan û hurgiliyên jiyana karakterên dîrokî û bi vê dîtinê ve dîrok tenê vê dibêje me ku, Ehmedê Xanê filan salê jiyan kiriye, yan jî Nalî yê helbestvan filan salê çuye ser dilovaniya xwe û koça dawî kiriye. Lê wêje hêz vê heye ku behsa ji xew rabûn, razan, evîndarî, Xemgînî û jiyana sade ya rojane û behsên hûr û rêvebirina jiyana wan helbestvanan ji bo me bike.

Dawiyê de em dikarin bibêjin roman bask û mijarên wêjeyî yê giringe û bi piştîwaniya rehendên dîrokî ve çend buyer, cîh û kesayetiyên dîrokî dike amûr û keresteyê bingehîn bo berhemanîna romana dîrokî. Herwaha ji bo zêdetir tegeheştin li her romaneke dîrokî û peydakirina gelek wateyên veşartî, pêwîste lêkolînerê rexnegirê wêjeyî hewla ponijandin û lêhûrbûna hin rêgez û diyardeyên giring bide, ji wan jî diyardeyên (Serdem, Jînge û Nijad) in.

Bi ponijandin û lêhûrbuna navnîşana romanê ve îşaret bi aliyên dîrokî tê kirin. Ji ber ku behs li xewna sê zilamên Îranî tê kirin, ku girêdayiye bi buyereke dîrokî ve û xewin bi dayîkbuna hezretî Mesîh a li Orşelîmê ve dibînin, ev çîroke jî bi aşkerayî di nav pirtûka Încîlê û li gor tê vegotekirin ‘’Meta’’ behsa wê derê hatiye kirin. Ji vî alî ve jî bi awayeke giştî wek çavkaniyeke dîrokî sûd li pirtûka pîroz a Încîlê hatiye vergirtin. Wê demê ev romana Xewna Zilamên Îranî, romaneke bi temamî romaneke dîrokî ye. Li gel dîrokî buna vê, di romanê de xeyal û fantaziyekî berfireh heye. Bi taybetî jî di beşa dawiyê ya romanê de, pêwîste em amaje bi vê yekê bikin ku, di nav romanê de fikra nasyonalîzma Kurdî bi awayeke berçav xwe diyar dike û dervey nasyonalîzmê jî em dikarin bibêjin wêjeya Mardîn Îbrahîm wêjeyekî mirovî ye. Ji ber ku agahiyan li hemû êş û xemên mirovahiyê, bê giringîdan û cudayî bixe navbera çemkê niştimanî tîne ziman. Diyare bi hevdu ve girêdana nêrîna nasyonalîzmê û pêşkeşkirina wêjeya mirovî di nav yek romanê de karekî hin de asan nîne. Ji bo vê em dikarin bibêjin roman nivîs heta astekî zêde bi awayekî serkeftî kar li ser wan du babetên dijî yek kiriye û bi yek ve girêdaye. Li gel fikra nasyonalîzmê û netewî, qala rewendê Kurdî aliyekî din ê vegotekirina vê piroseyê ye, ku tê de pêşketina fikra nasyonalîzma Kurdî piştî raperîna sala 1991ê derdixe pêş û piştî têkçûna rejîma Baas jî, li ser bingehê rexneya biyografî (jiyanameya nivîskar) em dikarin vê bibêjin ku, jiyana nivîskar bi aşkera li nav romanê de reng daye û mirov pê di hese. Wê demê roman nivîs piraniya buyeran de jiyana xwe veguhestiye nav romana xwe: Kuştina

jin wek diyardeyek bi rêya Ereban ve têkelî çanda Kurdî buye û ev yek bi aşkerayî di nav romanê de tê qal kirin. Ehmedê Xanê jî di romanê de wek helbestvan û kesayetekî dîrokî yê wek rêberê fikra netewî ya Kurd tê pênase kirin. Em dikarin vê jî bibêjin ku roman nivîs di nav bingehê buyerên dîrokî de, bi xeletî destnîşan kirina naveke dîrokî, cîheke dîrokî û salên dîrokê dike.

Kilîlê peyvan : Xewin
Jimareyên rûpel : 98
Şêwirmend : Yar.Doç.Dr. NESİM SÖNMEZ

YÜKSEK LİSANS

Sahand SAADI

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
Haziran, 2016

# MARDİN İBRAHİMİN "İRANLININ RUYASİ" ROMANINDA TARİHİ BOYUTLER

## ÖZET

Bir çok tarihi olay genel anlamda edebiyat için hem malzeme hem de büyük bir ilham kaynağı olabilir. Roman yazarları önemlî tarihsel olayları, ya da unutulan bazı olay ve olguları, tarih yazarlarının çok önem vermediği, ya da önem vermemekten ziyade, bilinçli olarak gözardı ederek tarihe kaydetmedikleri olay ve olguları edebiyat konusu haline getirirler.Demek kî çoğu edebiyatçının temel ilham kaynağı tarihsel olaylara bağlı olabiliyor.Fakat şu gerçeği unutmamak gerekiyor ki roman yazarları, tarihçi değillerdir.Çünkü her iki dal arasında belirgin bir fark vardır.Ondan dolayı da Aristo gibî bir filozof bu farkı ''Şiir Sanatı'' adlı kitabında çok dikkat çekici bir tarza aydınlatmış ve Aristo'ya göre tarih yazarları sadece geçmişte yaşanmış olan olayları dile getirebilir ve kaydedebilirler.Ancak diğer taraftan edebiyatçılar ya da roman yazarları yaşanmamış ya da yaşanabilecek olay ve olguları da dile getirebilecek imkanlara sahiptirler. Bu anlamda edebiyat ile tarih dalları arasında belirgin bir fark vardır ve bu farkta edebiyatın olay ve olgulara yaklaşımında hiç bir kalıp ve dogmayı tanımadığı gibi, yaşanmamış ya da yaşanabilecek olay ve olguları öngörebilme imkanlarına sahip iken, buna karşılık tarih hiç bir şekilde geleceğe ilişkin bir öngörüde bulunamaz ve edebiyatta var olan hayal gücünü kullanma, fantazi ve estetik güzelliği kendi tarih yazımı çalışmasına dahil edemez. Yukarıda belirttiklerimizden yola çıkarak, diyebiliriz ki tarih yazarları ile roman yazarları arasındaki fark; sıradan insanlara göre edebiyatçılar başka insanların yaşadığı acıları dile getirebilir ve herkesi bu konulardan haberdar edebilirler. Çünkü bir bütün olarak insanların kendilerine özgü oldukça önemli

hikaye, anı ve yaşanmış acıları vardır ve her insanın bu yaşanmışlıkları dile getirme gücü, uslubu ve hitabı yoktur.Tam da bu noktada roman yazarı kendisinin yaşadığı çağ ile kendisinden once yaşanan çağı, kendisine en iyi malzeme olabilecek bazı önemli olay ve olguları kendi romanına konu ederek yaratmak istediği eseri yazmaya başlar.Bundan dolayı da denilebilirki romanda geçen olaylar ile tarih sayfalarında yazılı olanlar bir değildir.Roman bazı olayların bir araya getirilmesi ile yaratılan bir eser olduğu gibi, romanda yazılı olan gerçekler agırlıkta yazarın hayal gücünün bir ürünü ile yoğrulmuş ve gerçek hayatta yaşadıklarımız ve hissettiklerimizden farklı olabilmektedir.Örnegin tarih, olay ve olguların oldukça genel bir fotoğrafını çeker, ama roman yazarı oldukça ince ayrıntılarla uğraşmakta ve kendi tarihi karakterinin hayatını her anlamda dile getirmeye çalışmaktadır. Örneğin tarih bize Ahmedê Xanê'nin falan yıl yaşadığını söyler, ya şair Nalî'nin falan yıl da vefat ettiğini söyler. Fakat edebiyatçı yatıp kalkmasından tutalım, aşkına, acısına ve günlük hayatın en sade yönlerine ve hayatını idame ettirme tarzına kadar en yalın ve akıcı bir dille bu şairlerin hayatını konu eder ve anlatımını yapar.

Sonuç olarak diyebiliriz ki roman, edebiyatın en önemli dallarından biri olduğu gibi, tarihi olay ve olguların gücünü de arkasına alarak, bir kaç olay, yer ve tarihi karakterleri de kendi çalışmasının temel aracı haline getirerek tarihi bir romanı elde etme uğraşında olur. Yine her romanı daha fazla anlamak ve kavramak ve romanda var olan gizli gerçekleri anlamak için, edebiyat araştırmacısının ve eleştirmenin ilkelerde ciddi bir yoğunlaşmayı yaşaması ve önemli olguları ve faktörleri gözden kaçırmaması gerekmektedir. Bunların başında da(çağ, ekoloji ve ırk) gelmektedir.

Romanın kimliği üzerine yapılan yoğunlaşmalar bizi romanın konu ettiği tarihi olaylara götürür.Çünkü romanda bahsedilen konu İranlı üç adamın rüyasıdır ve bu tarihi olay bir diğer rivayet olan Hz. Mesihin Orşelimde doğacağını konu edinen rivayetten bir alıntı gibidir.Dolayısıyla bu hikaye oldukça yalın bir şekilde İncilden bir alıntıdır.Yani genel anlamda bu romanda tarihi bir kaynak olarak kutsal kitap olan İncilden faydalanılmıştır. O zaman Üç İran'lının rüyası romanı her anlamda tarihi bir romandır. Aynı zamanda tarihi bir roman olmakla birlikte, bu romanda hayal gücü ve geniş fantaziler vardır.

Özellikle romanın son bölümünde, Kürt ulusalcılığı ve yurtseverliğinin de oldukça yalın bir şekilde ön plana çıkması roman içerisindeki diğer önemli konuların başında gelmektedir.Kürt yurtseverliği ve ulusalcılığının yanı sıra Mardin İbrahim’in edebi eserinin bir de insani boyutu vardır. Çünkü romanında insanlığın yaşadığı acı ve gam dolu olaylara yer vermiş ve hiç bir ayrıcalık gözetmeksizin diğer halkların yaşadığı acıları bir taraftan dile getirirken, diğer taraftan da kendi halkının yaşadığı trajedilerin anlatımını yapmaktadır. Dolayısıyla farklı etnik kökenlerin yaşadığı acılar ile kendi yurtsever ve ulusalcı düşüncelerini biraraya getirerek, insani bir edebiyat çalışmasını geliştirmek kolay olmasa gerek. Bunun için de denilebilir ki, roman yazarı belli bir düzeyde başarılı bir çalışma yapmış, birbirine zıt konuları bile iç içe işleyerek bir arada ustaca birbirine bağlamayı bilmiş, bir taraftan yutsever ve ulusalcı düşünceler, diğer taraftan da Kürtlerin göçüne ve serhıldan dan sonra yani 1991 sonrasında Baas rejiminin kırılmasını dile getirmektedir. Ayrıca biyografi eleştirisi temelinde (yazarın hayatı) de şunları belirtebiliriz; yazarın hayatı yalın bir şekilde romanın ta kendisinde ve insan bunu açık bir şekilde hissedebilmektedir. Dolayısıyla roman yazarı, kendi yaşadıklarını bir biçimde romana aktarmıştır.Yine kadın katliamı Arap kültürü olmakla birlikte, Arap kültüründen Kürt kültürüne sızmıştır ve bu gerçek açık bir şekilde romana yansıtılmıştır.Ayrıca Ahmedê Xanê romanda bir şair ve tarihi kişiliğiyle Kürt ulusalcılığı düşüncesinin önderi olarak tanıtılmaktadır.Yine şunu da belirtebiliriz ki, roman yazarı tarihi olayların temelinde, yanlışlıkla tarihi bir ismi, tarihi bir yeri ve tarihi yılları dile getirmektedir.

Anahtar Kelimeler : Xewin
Sayfa Adedi : 98
Tez Danışmanı : Yar.Doç.Dr. NESİM SÖNMEZ

MASTER THESIS

Sahand SAADI

YUZUNCU YIL UNIVERISTY
SOCIAL SCIENCES INSTITUTE
June, 2016

## ABSTRACT

Many historical accidents could be tools for literature. Novelist, most of the time mentions these historical accidents as important historical events in his literature products, those events which are neglected by the historians so the base of the literary almost depends upon the historical event, but we shouldn't forget that novelist isn't historian. There is a great different between both of them. Philosopher Arstotalis mentioned these differences in an attractive style in his book (Art of Poetry). Philosopher Arstotalis only believes that historians can only mention those events which happened in the past. Novelist could also mention those events which will happen in the future or haven't happened yet. The difference between literature and history is that literature is able to speak or prophecy about future events or those events which may happen, whereas history can neither speak about the future nor produce visions. As evidence for the below ideas, the difference between novelist and literature with other normal people is that characterizes others suffering, because human being carry the same world, story, memory and one special deep grief. Those human being are unable to speak about their story, memory and their own deep grief. Novelist joins several –update important historic events with past historic events with which produces historic novel. Therefore, the reality of novel is not as history reality. Novel is a group of a – made reality and visual reality. We don't mean the reality which we see or feel. For example, history portraits very important and huge events, but novelist enters inside the details of historical character's life. From this view, the history tells us that Ahmadi Hani lived in certain year or Nali died in certain year, but literature could speak about getting up, sleeping, love, grief and daily life of those poets. Finally, we could say that novel is one of the most important literary sorts,

depending upon historical aspectmany historical characteristic with tools to build and produce historic novel. For understanding a historical novel and to find many invisible meaning, investigator and literary criticism must investigate form several group of sex and other important phenomena, for example (modern phenomena, weather and nationality). When we read the novel carefully we feel the historical side of the novel, because it speaks about the dream of three Persian persons who dreams of birth of Jesus in Jerusalem. It is a historical event. This story is mentioned openly by (Mete) in the Bible. Generally, they get benefit from the sacred Bible as a historical source, so this novel (the dream of Persian men) is absolutely historical novel. Though this novel is historic but the end of the novel is quite fantastic and visional. One must bear in mind the Kurdish nationalism ideas expressed in many places in this this novel. In spite of nationalism ideas, we could say Mardeen Ibrahim's literature is purely humanitarian which expresseshuman being suffering and grief. Without going back and paying attention to expression of home, it seems difficult to connect nationalism idea and produce a humanitarian literature in one novel. Therefore, we can say that novelist worked upon these two anti- subjects successfully which joined with each other. On the shadow of nationalism, the Kurdish deportees the process is coming back to home in which the lightening idea of Kurdish nationalism surf on the water after uprising of 1991 and after clasping of Saddam's regime. We can say that the biography of the writer reflects inside the novel we can easily feel it. Almost all the events inside the novel reflect the novelist's daily real life. Murdering of woman clearly mentioned in this novel, this phenomena (murdering of woman) entered to Kurdish culture from Arab culture. Ahmad Hani, as a poet and a historic character considered to be the leader of Kurdish national idea in the novel. Finally, the novelist, among historical events, points historical name, historical place and historical year wrongly.

Key Words : Xewin

Quantity of Page : 98

Thesis Supervisor : Yar. Doç.Dr. NESİM SÖNMEZ

**SİPAS KİRİN**

Ez pir sipasiya mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim. ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Herwiha ez pir sipasiya (Dr. Nesim Sönmez) dikim ku erkê serpereşti kirina vê lêkolînê li stûyê xwe girt. herwisa sipasiyeke min a bêhed ji birêz (Dr. Karzan Karim Amin) mamoste li beşê kurdî yê Zanîngeha selaheddinê ku pir alîkariya min kir. Li dumahî de ev xebat peşkeş bi bav û dayi xwe dikim û gelek sipasiye wan jî dikim.

**Sahand Safen Saadi**

**NAVEROK**

KURTE ........ I
MARDİN İBRAHİMİN "İRANLININ RUYASİ" ROMANINDA TARİHİ BOYUTLER ........ IV
ÖZET ........ IV
ABSTRACT ........ VII
SİPAS KİRİN ........ IX
NAVEROK ........ X
PÊŞGOTIN ........ XII
DESTPÊK ........ 1
BEŞE YEKEM: ROMAN Û DÎROK ........ 5
1.1.PEYVENDÎYÊN WÊJE ÛDÎROKÊ ........ 6
1.2.Têgîn û Pênase ya Romanê ........ 13
1.3.TÊGÎN Û PÊNASE YA ROMANA DÎROKÎ ........ 20
BEŞE DUYEM: RÊBAZÊN REXNE YA DÎROKÎ ........ 26
2.1. TÊGÎNA RÊBAZA REXNEYADÎROKÎ ........ 27
2.2. Dîrokaserhildana Rêbaza Rexneya Dîrokî Ûrêberên Vê Rêbazê Yên Herîdiyar ........ 31
1-SANT BEEF ........ 33
2-HÎPOLÎT TAYN ........ 34
3-FÊRDÎNAND BRONTÊR ........ 36
4-GOSTAV LANSON ........ 37
5-FELLMAN ........ 37
6-HANÎKAN ........ 38
2.3. BINGEHÊN RÊBAZAREXNEYA DÎROKÎ ........ 38
BEŞE SÊYÊM: PIRAKTÎZE KIRINA RÊBAZA REXNEY A DÎROKÎ LI SER ROMAN A "XEVN A ZELAMÊN IRANÎ" YA MARDÎN ÎBRAHÎM ........ 40
3.1. KURTE YA ROMANÊ ........ 41
3.2. BINGEHÊ REXNEYA DÎROKÎ DI ROMANA 'XEWNA ZELAMÊN ÎRANÎ'YAMARDÎN ÎBRAHÎM ........ 45
3.2.1. SERDEM ........ 45
3.2.2. JÎNGE ........ 54
3.2.3. NIJAD ........ 61

3.3. Rehendê Dîrokî Û Bingehê Hunerî Di Romana ‘’Xewne Zelamên Îranî’’ De ........ 64
3.3.1. Rehendê dîrokî û navnîşana romanê ........ 64
3.3.2. Rehendê dîrokî û cih ........ 69
3.3.3. Rehendê dîrokî û karekter ........ 72
3.3.4. Rehendê dîrokî û buyer ........ 75
3.3.5. REHENDÊ DÎROKÎ Û PIROSEYA VEGOTEYÊ ........ 80
3.4. Rêbaza Rexne Ya Bayografî “Jiyan Name Ya Roman Nvîs” ........ 82
ENCAM ........ 91
ÇAVKANÎ ........ 93
XWE JÎNENÎGARÎ ........ 98

## PÊŞGOTIN

Navnîşana Bingehê Dîrokê lêkolîneke hewl dide bingehê dîrokê weke beşek ji pêkhateyên ezmûna çêbûna teksta wêjeyî (edebî) û aliyên wê yên cûda şîrove bike. Herwiha çawaniya mameleya ligel pergal û bûyerên dîrokî. Ji ber ku rêbazên edebî bi berdewamî peywendiyên bihêz ligel zanista dîrokê hene. Ew jî bi sedema ku gelek bûyer û serpêhatiyên dîrokî yên giring dûbare tên nava romanan de û bi awayek din pêşkêş dike. Anjî gelek mijar û bûyerên din ji ber her sedem û aramancekê be, ji aliyê dîroknasan ve hatibin paşguh xistin; li vir romannivîs giringiyê dide van bûyer û bûyerên hatine paşguhxistin. Dîsan bi awayek hûnerî, statîstîkî, pişta xwe girêdana bi xeyal, fantazî û dîtinên xwe dadirêje. Roman li gor vê dîtinê 'Xewna Mêrên Îranî' weke pergalek ku dîrokê di nav de ji despêkê ve amadekariyek berbiçav heye. Mînak hatine wergirtin û hatiye şîrovekirin. Min bi pêwîst zanî di vê pêşgotinê de wê yekê bêjim ku ji dema roman weke rêbazeke edebî serî hildayî ve, roj bi roj zêdetir cihê xwe asê kiriye û weke yek ji rêbazên herî diyar yê edebî derketiye meydanê. Roman bûye kanalek zindî û derbirînê li xema mirovên serdemê dike. Lewra ji mêj de lêkolîn li ser vê rêbaza edebî destpê kirine. Ev lêkolîn niha û siberojê de jî wê her berdewam bikin. Bi dîtina hinek çavdêran pêşketina teknolojî û serhildana tevnên civakî bûye sedemê lewazbûna romanê. Lê bi dîtina me roman mil bi mil ligel hemû diyarde (fenomen) û pêşketinên cîhanê kariye taybetmendiyên xwe biparêze û xwendevanên zêdetir li derdora xwe kom bike.

## SEDEMA HİLBİJARTİNA VÊ LÊKOLÎNÊ:

Sedema hilbijartina vê lêkolînê vedigere ji bo kêmiya xebitîn û mamelekirina lêkolînên rexneyî yên wêjeya Kurdî li beramberî çawaniya dengvedana dîrokê ya di nava romanê de. Di vî warî de mirov dikare bêje lêkolînan bi awayekî gelek kêm giringiyê didin rêbaza dîrokî ya di nava romanê de. Sedemek din a hilbijartina vê lêkolînê, hewldana derxistina pênûsek nû ya romana Kurdî ye. Di çarçoveya lêkolînek serbixwe de.

**RÊBAZA LÊKOLÎNÊ**

Di warê rêbaza lêkolînê de em pişta xwe bi bingehê dîrokî, 'Wesfî û Şîrovekirinê' girêdaye. Herwiha di warê xebitînê de rêbaza rexnegirtin, di warê rexnegirtina rêbazê de jî di bazina bingehên rêbaza rexnegirtina dîrokî xebat hatiye kirin. Li ser vî bingehî romana 'Xewna zelamên Îranî' hatiye şîrovekirin. Di beşa yekemîn û dûyemîn de bi awayekî teorî di çend dem û cihên pêwîst de, sûd ji gelek rêbaz û çavkaniyan hatiye wergirtin. Dîtina nivîskar, rexnegirên cîhanî û xwemalî hatine wergirtin û me di cihên pêwîst de axaftin li ser kiriye. Herwiha di beşa sêyemîn a lêkolînê de bi awayek rasterast ev roman hatiye praktîzekirin.

**BERNAMEYALÊKOLÎNÊ**

Ev lêkolîn ji 3 beşên serekî, encam, lîsteya çavkaniyan û kûrtiya lêkolînê ya bi hersê zimanên Kurdî, Tirkî û Inglîzî pêkhatiye. Beşa yekemîn û dûyemîn taybet bi awayek teoriye. Herwiha beşa sêyemîn jî mijara karê me yê pratîkî digire nava xwe. Bi awayek giştî hemû karên me yên rexneyî ji bo beşên jêr tê parvekirin:

Beşa Yekemîn bi navê ' Roman û Dîrok ' ji 3 bendên peywendiyên di navbera roman û dîrokê de pêktê. Me hewl daye ku di benda yekemîn de bi awayekî giştî peywendiyên navbera edeb (wêje) û dîrokê de bixin ber çavan. Herwiha benda dûyemîn ji bo têgehîn û pênasayên romanê hatiye veqetandin. Me bi awayekî kurt li ser bingehê serhildan û jidayîkbûna romanê axiviye. Di Benda sêyemîn jî de me pênasayên romanê dîrokî kiriye.

Navê Beşa Dûyemîn jî 'Rêbaza Rexneyî ya Dîrokî' ye û ji sê bendan pêktê. Behsa rêbaza rexneyî ya wêjeyî dike. Di benda yekemîn de behsa beşa rêbaza rexneyî ya dîrokî hatiye kirin. Di benda dûyemîn de jî bingehê serhildana rexneyî ya dîrokî, raberên herî giring û diyar a vê rêbazê ketiye ber behsê. Di benda dûyemîn a vê beşê de jî bi şeş (6) xalan behsa dîtin û narîna raberên vê rêbazê hatiye kirin. Benda sêyemîn jî taybet li ser bingehên vê rêbaza rexneyîne. ku bi awayekî rasterast me li ser romanê praktîze kiriye yan jî xistiye pratîkê.

Navê Beşa Sêyemîn û beşa dawî ya lêkolîna me, 'Praktîzekirina Rexneya Dîrokê Li Ser Romana Xewna Zelamên Îranî ya Mardîn Îbrahîm' e. Di vê beşê de

bi çar bendên bingehên rêbazên rexneyî yên dîrokê hatiye behs kirin. Benda yekemîn ji kurtiya romanê, bi awayek kurt û sade bûyerên herî giring hatine behs kirin. Bi vê awayî yê ku Eger kesên vê lêkolînê bixwînin û hemû romanê jî nexwînin, xwendekar wê hemû romanê fêm bike. Benda duyem piraktîze kirina bingehên rêbazên dîrokî ye di nav romanê de. Ev bend jî ji sê xalan pêktê. Hersê regezên 'Serdem, Jîngeh û Nijad' hatine şîrovekirin. Benda Sêyemîn jî ji rehendên dîrokî û bingehên hûnerî yên romanê digire nava xwe. Ev jî li ser 5 xalan hatiye parvekirin. Ew jî evin; Rehenda Dîrokî û Navnîşan, Rehenda Dîrokî û Cih, Rehenda Dîrokî û Karekter, Rehenda Dîrokî û Bûyer, Rehenda Dîrokî û Vegêrandin. Her yek ji vane bi awayek cûda hatine şîrove kirin û hatine praktîzekirin. Beşa Sêyemîn jî ji Rêbaza Rexneyî ya Biyografî ango 'Jiyannameya Nivîskar' e û hewl hatiye dayîn ku bûyerên di nava romanê de ligel ezmûnên jiyana romannivîs ve hatine girêdan.

**DESTPÊK**

Di despêkê de ji bo bêhtir têgeheştina sedemê hilbijartina destanekî wek Mem û Zînê di nav romanê de, ku hemu giraniya buyerên nav romanê ketiye ser vê mijarê û pêwîste bi awayê çend babetan qala naveroka vê destanê bê kirin û giringî bi rehendên fikrî û felsefeyên nav destanê bê dayîn, ji wan aliyan ve pêwîste ew babetên helbestî yên nav destanê li berçav bigrin û di vê derbarê de hîn bêhtir li ser bi axivin. Dema ku Xanî dibêje:

((şerha xemê dil bikem fesane
zînê û memê bikem behane))

wek tê zanîn naveroka destana Mem û Zînê tenê ji aliyên dildarî û evîndariya bê encam a di navber Mem û Zînê de pêknayê, ji ber ku Xanî hewldaye Mem û Zînê bike amûrek, ku tîşk bixe ser xem, êş û azarên gelê xwe û Xanî bi rêya vê destanê ve xemên dilê xwe aşkera dike û ew jî xema nebûna dewletekî serbixwe ye. Bi giştî xem û azarên xwe di çarçoveya destanê de rawe dike û ew babetana hemû jî wa li roman nivîs dike ku kesayetiyekî mezin û dîrokî yê wek Ehmedê Xanê bike amûrê karakterê xwe yê serekî di nav romanê de. Ev jî rê vedike ku roman nivîs bikare bi temamî romanekî dîrokî, wek berhem bidest bixe.

Sedemekî din ê hilbijartin û kirina mijar a destan Mem û Zîn a Ehmedê Xanê, peyvendiya xwe bi giringî û **danisqeyî** ya destanê ve heye. Li hember vê yekê destana ku herî kêm lêkolîn û lêhurbun li ser hatî kirin e. Ji ber Mem û Zîn bi tu awayekê ji Romeo û Julyet kêmtir nîne, ku bi hezaran lêkolîn li ser hatine kirin. Lê Mem û Zîn heta naha bi vî awayî tu lêkolînek li ser nehatiye kirin û giringî jê re nehatiye dayîn. Wek mijar destnîşan kirina Mem û Zînê û bi awayekî aşkera di nav romanê de nîşandana vê û bêhtir balkêşendina ser destanê, dikare bê gotin ku îtîbar vegerandina ji destanê re ye. Bi sûd vergirtina ji vê dîrokê û bi piştîwaniya xeyal û fantaziyên Mardîn Îbrahîm ve, roman nivîs beşek berfireh ê romana xwe ji rexnekirina nasyonalîzma Tirk a di herêmê de heyî re û ji împaratoriya Osmaniyan re cuda kiriye, ku di serdemekê de bi rêya şewitandina destnivîsa û berhemên helbestî yên Kurdî re, şerê fikrî li dijî gelê Kurd ragehandiye û hewla têkbirina pêgehên Kurd daye. Piştre jî ev rexne kirina bi awayeke berevajî vê yekê, vê carê vedigere ser desthilatiya navmala Kurd. Ji ber vê roman nivîs vê destnivîsê dike sembol û bi rêya xewna sê zilamên Îranî ve hewla parastina vê destnivîsê dide, ku desthilatdariya

Osmaniyan dixwaze destnivîsê bi şewitîne û di vê karê xwe de jî serbikeve. Ji vê derê ve bi awayeke demildest, bi giştî li ser piroseya karê xwe em destpê dikin, ew jî pêkhateya awayê karkirin û destxistina wan zanyariyên li gel naveroka mijara me li gel yek diguncên. Elbet di wateya sedem û faktor çine?Pêwîste lêkolîner pêyrewiyê bike ku karê wî zanistî be û bê guman hewldan û westandineke zêdetir dixwaze. Ji ber vê jî eger em bixwazin lêkolînekî têr û tejî û temam pêkbînin, di derbarê karkirina li ser romanekê bêguman pêwîstiya me bi rêbazeke hatî diyar kirin û berfireh heye. Bi vê armancê jî rêbaza herî nêzîk û guncaw a ji bo vê mijarê, karkirine li ser romanekî dîrokî ya wek romana ‘’Xewna Zilamên Îranî’’ ku pêkhatiye rêbaza rexneyî ya dîrokî. Ji bo vê armancê jî, ku lêkolîna me bêhtir zanistîbe, pêwîste di destpêkê de em amaje bi peyvendiyên di navber wêje û dîrokê de derdikevin holê destnîşan bikin.

Di romana dîrokî de roman nivîs hewla vê dide ku dubare dîrok bi dîtin û cîhanbîniya xwe ve dariştin dike, buyerên dîrokî bi awayeke cuda û fantastîk dibin buyer û cil û berg û qalibeke hûnerî ve çîrokên dîrokî û kesayetên dîrokî di nav romanê de têne darijandin. Yan jî roman nivîs hemû bi giştî û bi taybet jî roman nivîsê dîrokî, di dema berhem anîna yekem romana xwe de mijûlê nivîsîna dîroka jiyan û ezmûnên xwe dibin. Yan jî dîroka jiyanê û ezmûnên kesên di heman serdema xwe de jiyan dikin û kesên nêzîkin ji fikrên wan bixwe re dinîvsîne û ji vê derê em dikarin bêjin ku eger roman nivîs rasterast jiyana xwe jî dinîvsîne. Wê demê beşa piraniya buyerên nav romanê rasterast peyvendiya jiyan û ezmûna xelkên nasyar di navxwe de digre, ku buye ezmûna jiyana roman nivîs bixwe. Bila ji bîrame neçe nivîskarê serkeftî ew nivîskare ku giringî bi buyer û diyardeyên civakî yên serdema xwe re dide û ji wan cuda nabe ye. Ji ber ku di dawiyê de roman nivîs ji mirovekî sade, zelal û asayî yê dinav civakê pêktê. Yan jî kur û keça wê civakê ye ku tê de jiyan dike.Ji ber vê jî gelek asayî ye ku diyardeyên di nav civakê de veguhezîne ser rûpelên nav romana xwe. Bi piştîwaniya wan gotinên li serê ve, em dikarin bibêjin wêjevan û roman nivîs li gel kesên din ew e ku wêjevan dikare agahiyan li ser êş û azarên kesên din dikare bide. Ji ber ku mirov hemu jî xwediyê gelek çîrok, bîranîn û xemên kûr ên xwe yên taybet in û hêza vegotekirina wan çîrok, bîranîn, êş û azarên di herkesekî de tuneye.Ji vê derê ve roman nivîs hin buyerên giring û dîrokî yên serdema xwe û yên serdema berî xwe bi yek ve girêdide û romaneke dîrokî jê

avadike.Wê demê nabe em jibîr bikin ku roman nivîs dîrok nivîs nîne.Ji ber ku cudayiyeke pir zêde di navber her du yan de heye. Fîlozofeke wek Arîsto di pirtûka xwe ya bi navê Hûnera Helbestan de bi awayeke xweşik û balkêş ev cudayî ye ronahî kiriye. Li gor Arîsto dîrok nivîs tenê dikarin wan buyeran vegote bikin ku di raboriyê de pêkhatine. Lê wêjevan yan jî roman nivîs hêza wan heye ku wan buyeran vegote bikin ku hîn pêknehatine û dibe ku li pêşerojê de pêk bên. Wê demê cudayiya di navber wêje û dîrokê de ya herî balkêş, wêje hêza wê heye ku pêşbînî û nirxandinan li ser pêşerojê û buyerên ku dibe di pêşerojê de pêkbên pêşbîniyê li ser bike. Li hember vê yekê dîrok bi tu awayekê nikare gotin li ser pêşerojê bike û bi tu awayekê hêza xeyal, fantazî û estetîk ve nikare berhem bidest bixe. Dubare pêwîste em bibêjin, ku roman nivîs ne dîrok nivîs e, roman nivîs dema ku dîrokê vedike, amûrê nivîsîna wêjeyî bi temamî rehendeke din ji dîrokê re dibexşe, ango di wateyek din de nû bunê li pêş dîrokê vedike.Ji ber vê jî em dikarin bibêjin waqiî ango rastiyên nav romanê heman rastiyên nav dîrokê nîne.Roman pêktê ji hin rastiyên ku hatine avakirî û rastiyeke xeyalî ye, ne wek rastiyên ku em dibînin û hest pê dikin e. Dîrok wêneyekî pir giştî û mezin ê buyeran dikşîne.Lê roman nivîs dikeve nav hûrkarî û mijarên jiyana karakterên dîrokî.Bi vê dîtînê ve dîrok tenê vî tiştî ji me re dibêje; ku Ehmedê Xanê filan salê jiyan kiriye, yan jî Nalî helbestvane û filan salê çuye ser dilovaniya xwe. Lê wêje dikare û hêz vê heye qala ji xew rabun û razan, evîndarî, xembarî û jiyana sade ya rojane û qala hurkarî û giştî jiyana wan helbestvanan bo me bike. Di vê derbarê de li gor ‘’Şêrzad Hesen’’: (roman nivîs dema bidestxistina berhemeke romanê de, dîrokê kopî yan jî dubare nake. Roman nivîs wan valatiyên ku dîrokê li du xwe hêlane tejî dike, yan jî ew saetên ku dîrokê ji bîr kirine wan tomar dike. Roman nivîs bi wateya karê xwe bi miriyê dîrokê tuneye. Di wêjeyê de dîrok tê ser rûpelan, lê berdewam wa tê nivîsîn ku mirov ecêb dimîne û mirov ji xwe pirs dike wan hemû hurkariyên ku dîrokê nedîtine ji kuderê berhev kirine! Roman nivîs perde li ser wan fezayan radike ku dîrok nivîs çavê xwe jê re girtiye.) ev tişta jî bila ji bîrame neçe ku gelek caran dîrok nivîs bi zanebun yan jî bi qest hin buyerên dîrokî tomar nakin. Ji ber ku ew buyerane xizmet ji îdeolojû û nêrînên wan dîrokzanan re nake û li hember berjewendiyên niştimanî yên wan in.

Bi giştî romanên dîrokî qala xem û xweşiyên karakterê xwe dike.Herwaha berhemê dîrokî vegotekirineke di asta rûkeşiyê de ye. Her çend romana Şer û Aştî ya

Tolstoy wek romaneke dîrokî jî hatibe naskirin, lê tu xwandevanek bi armanca şarezabuna bi dîroka şerê Rusya û Fransayê biryara xwandina vê pirtûkê nade. Ji bo vê armancê bi sedan heta bi hezaran berhemên dîrokî li ber destin, ku alîkar be bi têgeheştina şerê navbera Fransa û Rusyayê ji xwandevan re.(2)Ji ber ku xwandevan ji bo tam girtin ji dariştina xeyal û dîtina wêneyên estetîk û hûnerî yên bilind, awayê vegotekirin û ziman, biryara xwandina vê romana dîrokî didin. Wê demê aliyeke din ê cuda yên di navbera berhemê dîrokî û romana dîrokî dervey li xeyal û estetîk ango xweşikbuna ku berhemê dîrokî yê Derley, aliyeke vê ziman aliyeke giring ê romana dîrokî tê pênase kirin. Nabe roman nivîs ji ber ku mijûlî afirandina romaneke dîrokî ye zimaneke kevin bikar bîne.

Wê demê roman nivîs dîroka dîrokê nanivsîne. Ji ber ku wêje dinivsîne û wek çava karê vegotekirinê sûd ji gelek cîhan û rêgezên din ê wêjeyî verdigre, ew jî li zanistekî wek dîrokê sûd verdigrê. Dibe cudayî hebin di rawekirin û sererastkirina dîrokê de, ev yek jî wek cîhaneke wêjeyî yên li gel dîrok nivîs bixwe ne. roman nivîs dîrokê na nivsîne, li ser dîrokê lêhûrbun û fikir pêşdixe.

Di dawiya vê behsê de dikare romana dîrokî di çend risteyan de em rêz bikin ku, romana dîrokî berevajî berhemên dîrokî bêhtir azadî û dest valayî yê ji roman nivîs re fireh dike, bi sûd vergirtina li cîhanbînî û dîtina nêrînên taybet ên xwe ve. yek din ji taybetmendiyên romana dîrokî jî cîh, buyer û kesayetên dîrokî dike amûr, ji bo vegotekirina xeyal, estetîk, teknîk û awayên bilind ên vegotekirinê bi armanca komkirina bala xwandevanan bikartîne. Herwaha hewldane ji bo nivîsandina wan aliyên veşartî yên dîrokê de, dîrok nivîs pir zêde li ser ranewestiyane, yan jî bi qest jibîr kirine. Wek me got xeyal beşek berfireh di nav romanê de dagir dike, lê gelek car wa li hevtê ku roman nivîs hinde dîrokê dinivsînin û giringiyê didinê ku, pir zêde ji aliyê xeyalan ve naçin, ji ber ku gelek car roman nivîsên romana dîrokî, ji dîrok nivîsan rastgotintir in, di nivîsandina goşeyên tarî yên di nav dîrokê de.

# BEŞE YEKEM: ROMAN Û DÎROK

## 1.1.PEYVENDÎYÊN WÊJE ÛDÎROKÊ

Eger em bixwazin pênaseyekî bi giştî di derbarê wêjeyê de darijînin, emê rastî astengiyên dijwar bên û dibe ku ev hewldan nêzîkî şikestinê bibe, ew jî di ditîna wêjeyî de gelek pênaseyên cuda ku li her pêvajo û serdemekî de bi gelek awayên cuda hewlên nasandinê hatine dayîn û eger bi nêrîna teoriya wêjeyî ve be, divê destpêkê de balbikşînin ser bîr û nêrînên fîlozofên wek Eflatun û Arîsto, ((*ji ber ku yekemîn car Eflatun û Arîsto ew nêrîne anîn holê, bi vî awayî derxistina hin pirsên eqil yên di derbarê cevher û naveroka hûner û aliyên hevbeş û cudayiyên hûnerê de, dan destpê kirin*))[1] Eflatun (427-327 P.Z) di bîr û nêrînên xwe yên felsefîk de, di gelek cîhên cuda cuda de li ser hûnera helbestê bi awayekî gotûbêj û dialogan raweste dike, eger pirtûkekî serbixwe ya taybet nekiribe pirtûka wêjeyî û gotûbêjên li ser wêjeyê jî, lê bi vegotina gotûbêjan astengiyan li pêş bîr û nêrînên wî avadibe.[2]

Herwaha beşa 10.mîn a Komarê taybet kiriye bi beşa wêje û hûnerê ku, bi awayekî gotûbêjan li gel kesekî bi navê Glawkon baldikşîne. Armanc di vê beşê de (Komar) bandora helbestê ya li ser rewişt bi giştî u rewişta hemwelatiyan e.[3] Felsefeya Eflatun de sê cîhan hene. Ji wane cîhana nimûneyî, ku cîhanekî bi tamamî nayê gohertine, Herwisa cîhana diyardeyên hestane ku wêneyê cîhana nimûne ye, Cîhana sêyem jî, cîhana xeyal û siyê ye(sîber) di vê vegotinê de armanc cîhana karên wêjeyî û hûnerî ye.[4]

Diyare li gel Eflatun hûner cîhê pêkhateya teqlîdê ye, herwaha hûner û wêje dikeve nav çarçoveya cîhana sêyemîn, Rastûrast teqlîd mînake kî ji cîhana duyem e, Bi wê nêzîkatiyê ve hûnermend bi du awayan hûnerê ji rastî û heqîqetê dur dixin, Li gor nêrîna Eflatun di nav hewldana bandorekî xirap û nerênî li ser derûniya gel ava bikin.

Bi heman awayî Arîsto(384-322 P.Z) di derbarê hûner û wêjeyê de gelek gotin kirine, Di pirtûka xwe ya “hûnera helbestî” de bîr û nêrînên wî têne berçav, Herwaha navborî rêhevalê Eflatune ku, wêje pêkhateyeke di nav piroseya teqlîd kirinê de û dibêje: ((*Dibe ku helbestên ji ber kirî bi du sedeman serî rakiribe, herdu jî pir xwezayîne. Teqlîd kirin tiştekî zikmakiye di mirov de û di zarokatiyê de li gel mirov*

[1] *Hûner çiye?*Leo Tolstoy, Hejar Rehîmî, Dezgayê Mukriyan2009 R. 5
[2] *Teoriya wêjeyî,* Dr. Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaneya Mardîn, Hewlêr 2010 R. 324
[3] *Komara Eflatun,* Avan Mihemed, çapa yekem, Kerkûk 2010 R. 324
[4] *Teoriya wêjeyî,* Dr. Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaneya Mardîn, Hewlêr 2010 R. 19

*destpê dike. Mirov ji wê teqlîd kirinê tam verdigre…û sedemê din jî, fêrbûn xweş û bi tam e. Tenê ji bo fîlozofan ne ji bo her mirovekî fêrbûn xweş û bi tam e. Dema ku em li wêneyan dinêrin , ji ber ku ji dîtinê emm tam û sûd jê digrin û bi wate ye*.))[5] Diyare teqlîd kirin li cem Arîsto tiştekî xwezayî ye,[6] Mirov dema ku dayîk dibe xwesteka teqlîd kirinê tê de peyda dibe, Ji ber ku sûd û tam li gel yek ji vê piroseyê verdigre, Heta vêderê Arîsto rêhevale li gel Eflatun û bi giştî heman zaraveyê teqlîd kirinê bikardîne li hember helbestvanên wêjeyî.

Lê gelo wateya zaraveya têgîna teqlîdê de ew her du fîlozofe di yek têgînê de ne? Berewajî Mamostayê xwe ((*Li gor Arîsto nivîskar dema teqlîdê dike, tenê tiştan na goherê, ji ber ku destkariyê li ser wan dike.. dibêje: Helbestvan tenê teqlîda wan tiştane nake ku hene, ji ber ku teqlîda wan tiştan dike ku dibe pêkbên…Hûnermend dema wêneyê dîmenekê dikşîne, divê li xwe xweşiktir be, ne wekû girêdanekî bike li gel wan tiştên ku di nav wê dîmenê de ye. Di xwezayê de kêm û kurtasî hene, lê hûner wana hemiyan tejî dike.))*[7]Ji vê derê em dikarin bersiva vê pirsê bi awayekî nereni bidin, Ji ber ku her du fîlozof di yek quncikî ve çav li piroseya teqlîdkirinê nakin, Eger helbest û wêje li cem Eflatun pêkhateyek be ji teqlîd kirina aşkera û tezî ango rût be, ev yek li cem Arîsto pirsgirêkekî temamî berevajî wê yekê ye û teqlîd kirin berdewam kit û mit wek yek (kopî) nînin û di her buyerê de rastûrast ne wekhev in, ji ber ku destkarî kirin kirokiya karê teqlîd kirinê ye.

Dema ku hûnermend dîmenekê dikşîne pêwîste bi awayekî xweşiktir ê ji ku tişta heyî wê dîmenê ava bike, Heger na dema helbestvan pê agahdar dibin kêm û kurtasyên ne hewsengiyê hene li derdora wan, pêwîste wan cîhên ku kêm in tejî bikin, wan cîhên ku ne hewsengiyê avadikin di nav civakê de temam bikin, Ji wêderê em digehin wan rastiyan ku Arîsto nekû helwêstê wî yê li hember helbestvanan xirap nîne, berewajî Eflatun pesnê karên wan dike û wek pêwîstiyekî civakê dibîne.

Teorî (teqlîd kirin) xwe dispêre fikir û nêrînên felsefeyên Eflatun û Arîsto û hegemon dibe li ser tevgera wêjeyî ya Ewropa û heta sedsala hejdemîn, ku serîrakirina teoriya zanist ê, Serîrakirina teoriya agahî ku vedigere nîvê sedsala hejdemîn û bi şoreşa burjuvazî û herwaha rola takekes a di nav civakê de diyar dibe,

---

[5]*Arîsto mamostayê yekem,* Dr. Nerîman Ebdula Xoşnaw, Çapxaneya Rojhilat 2014 R. 212
[6]*Hûnera Helbestê(helbestvanî) Arîsto,* Ezîz Gerdî, Silêmaniye 2004 R. 31
[7]*Teoriya wêje,* Dr. Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaneya Mardîn, Hewlêr 2010 R. 32

di encama wê şoreşê de civaka Ewropa gelek gohertinên fikrî, felsefî, aborî û civakî di xwede avakir.

Di beşên piştre de emê li ser sedem û encamên wê şoreşê hîn tejî û pênaseyan diyar bikin, Bi şikanaçîna Arîstokrat û nemana bandora wan a li ser civakê bu, ev sedem bu ku civaka Ewropa ji serdemekî bi goherê û berbi serdemekî din ve biçê. Ew jî bu hêvinê ji nûve pênase kirina wêje yê. Wêjeyekî nûjen erkekî nûjentir bu sedemê serîrakirina wê teoriyê. (Kant 1724-1800), (Hegel 1770-1831) bi du rêberên felsefeya burjuvazî û ez eziyê hate avakirin. Bandorekî rastûrast li ser nivîskar û rexnegirên dema xwe li du xwe hiştin Herwaha wek rêberê teoriya agahiyê tên pênasekirin, Kant; wek çavkaniya bidest xistina agahiyê hest û eqil li yek cudakir û bîrkirina eqil wek banga wê bîr û fikrê pênase kir, *"Herçend li gor Hegel hûner û wêje astengiyên li pêş heqîqetêne û amurên wê astengiyê jî xeyalên takekes ango hûnermend bi xwe ne"*.[8] Bi dîtina wan du rêberên felsefê teoriya agahiyê pêşxistin bi vî awayî pênaseya wê teoriyê dikin û dibêjin: ((*Wêje agahî bidest xistine, yan jî agahî bi dest xistin tê wateya hest û soz a helbestvan. Wêje jî agahiya helbestvan û hestên ku dil ronî dike heqîqetê ye, (ne eqil) erk û wezîfeya wêjeyê jî xwe di darîştina peyvan ya diforêde dibîne*)).[9]

wekî ku me amaje pê kir, teoriya "Agahiyê" di encama şoreşa burjuvaziyê û vegera li xwe û agahiyên ku ji aliyê takekes ve hatiye hole, Berewajî li teoriya teqlîd kirinê, ku giringî dide eqil û idiye û hebunê dike nav bingeh, li dijî giştî zagon û makezagonekî rawestaye û giringiyê dide peyvên diforin yên kes an.

Teoriya sêyem, teoriya ''*Afirandinê''* ye, Diyare dîroka serîrakirina wê teoriyê vedigere sedsala 19.mîn, Ew sedsala sedsala kûrbuna lêkolînên teoriyê û pratikê ye, Herwaha bêhtir berbi pêşve çûna zanistê bu sedem ku bibe dermanê romantikan û dûrketin li agahî kirina ser xwe, Teoriya afirandinê, danîna bingehê serîrakirinekî bi bandor a li dijî sitranên hûnerî yên bazirganiyê ye. Ji ber vê daxwaza hûnerekî paqij û rasteqîn dikire armanca karên xwe, ku hûner nebe piştewanê rehendên aborî u civakî, fikrî û olî, ji ber giştî rêgezên hûnerî di xizmeta estetîk û civaniyê de bêne vegote kirin û kar li ser civanî û afirandinê bêne dahênan.[10]

---

[8]*Çavkaniye berê R.50*
[9]*rehendi komelayeti le romanekani atay nehayi,* hesen yusuf bireji, wesana mardin,2010, R50
[10]*El-Edep walifinune,* Dr. Mihemed Silêman, Dar Altinuyirg, Bîrut 1981R. 85

Teoriya ‘’Rengdanê’’ piştî teoriya wêjeyê ku me vegotinê de amaje pê kir, diyare bingehê serîrakirina vê teoriyê jî vedigere bo sedsala 19.mîn, Di encama pêşkeftina zanist û teknolojiyê, wêjeyekî wî awayî jî serhildide, ku wek wêjeya waqiî ango pêkhatî û wêjeya xwezayî tê pênasekirin, Piştî wêjeya bi xewn û xeyal kevin bu, bêhtir wêje giringî da bi serpêhatiyan (waqiî) û rewşa civakî û mijara serekî ya xwe li gor vê teoriya wêjeya rastûrast rengdana wê diyardeya civakî bu, ku li jîngeya derdorê wek çavkaniya xwe digirte dest, Di vê navendê de çend hewldanên din hebûn ku dubare nasandina wêjeyê bikin,[11] êk ji van raberan jî(Hipolit Tayn1828-1893 P.Z.) bu, di pirtûka xwe ya ‘*’Dîroka wêjeya Birîtanya*’’ ku di sala 1863 hatiye çap kirin, amaje bi vê yekê dike ku, gelek sedemên derve bandorê li ser babetên wêjeyî dikin, Ji wan (*Nijad û Jînge ûSerdem*)e.[12]

-Armanc li “Nijad” ewe ku her gelek û neteweyek xwediyê hin sifat û taybetmendiyanin ku wan ji gelên din cuda dikin, ji wan sifatan yên ji bo heyamekî hene, yên wek rengê çerim, aliyên bedenî …ew hemû cudayiye bi rol û bandor in, li ser awayê pêkanîna berhemên wêjeyî û rengdanên di nav berhemên wêjeyî de.[13]

- “Jînge” Ew sînorên erdnîgariyê digre navxwe ku hin sîmayên taybet ji berhemên wêjeyî re dibexşê, Wek rewşa erdnîgarî û rewşa bahewayê ya li girava Erebî, bandora derunî avadike li ser takekesê Ereb û rengdana wê jî dibe li ser berhemên wêjeyî,[14]Bi heman awayî jîngeya Ewropa û jîngeyekî Kurdî rengdana wê bandorekî temamî avadike li ser wêjeya wan gel an.

- ‘’Serdem’’ jî amajeye bo wê serdema dîrokî ku wêje tê de Li dayîk dibe, ku di civakekîyan hatiye diyar kirin, Ji ber ku wêje rengrêjiyekî diyar u morikên herdem ên serdema xwe ye, Yan jî rengdaneke ji wan mercên dîrokiye ku bi xwe tê de dinivîse.[15]

Bi dîtina felsefeya Tayn, ew hersê rêgezêne (Nijad, Jînge, Serdem) sedemin ku analîzên helsengandinê û diyar kirina nirx û erkê wêjeyê ne. berewajî li teoriyên beriya xwe, di wê teoriyê de wêje bandora xwe bicîh dihêle li ser hest û awazên

---

[11]*Teoriya wêje,* Dr. Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaneya Mardîn, Hewlêr 2010 R. 32
[12]*Menhec Al-neqid A-ladebî, n:* Dr. Îsmaîl Ebdulselam Mecîd, Dar Agilîe, Bîrut 1979 R. 92
[13]*Çavkaniye berê. R. 88*
[14]*Fî El-Şeir Wel Edeb,* Ehmed Fiçil Şiblul, Eni Dar Alimigbuat Cedîde-El-Îskenderiye-1984 R. 43
(*) (Îwan Cutgirîd Herder) 1744-1803 ji bo zanyariyên zêdetir li pirtûka deriyek li felsefeya dîrokî binêre , Û. Deven Hesen R. 312
[15]*Al-neqid Al-ictimaî fi El-edeb El-Erebi,* Dr. Hisên Ehmed Himdanî, Migbe Camie El-eyn El-Şemis 1971 R. 117

mirov û rehendê civakî û dîrokî dike bingehê xwe. Eger waye bi dîtina vê teoriyê dikare bê gotin: (Wêje rengdana hest û peyvên xeyalî yên mirovatiyê ye di her pêvajoyekê de. Herwaha wêje rêyekî hûnerî û mirovatiyê ya bilind a her gelekî ye)[16] Ji aliyê Tayn ve, wêje dibe pêkhateya cevher û qalikê dîrokê. Li gor pêwîstiyên agahiyê rastî dîrokê dike, ku armanc di raboriya mirovê Ademzade li dem û cîhê hatî diyar kirine.

Piştî nirxandinên li ser wan çar teoriyên wêjeyî, ev tişte ji bo me ronahî dibe ku, tişta herî giring û teoriya herî nêzîke li ya wêjeya zanistî dîrokî ve, ew jî teoriya ''rengdanê'' ye. Ji ber ku li gor nêrîna me "Tayin" bê agahdar nebuye ji bîr û nêrînên felsefeyî yên **''*Herder*''*** ê Elmanî, ku wek pêşengê mektebên dîrokê dihate naskirin, Li gor wî ((*Her serdemekî dîrokî, ruh û nirx û zincîreyên xwe yên taybet hene. Nabe dîrok nivîs bi çavê îro ve li raborî binêre. Ji ber ku xwezaya wê serdemê divê têbigehê, lêkolîn bike, hest bike û di wê çarçoveyê de divê jiyan bike*)),[17] Di vê navendê de vegera bo raborî û kirina mijara (Jînge, Nijad û Serdem) herdû bîrmendan (Tayin û Herder) wê bibe rê xweşkerê avakirina hebûna peyvendiyekî bihêz di navbera wêje û dîrokê de. Herwisa bidest xistina gelek xalên hevbeş û cuda di navbera wan dû zanistan de, di derbarê dîrokî ve hewldidin bi têr û tejî nirxandin li ser têgeh û zaraveyê wan bikin.

Lê di derbarê peyvendiyên di navbera wan dû zanistan de divê îşaret bi dîroka wêjeyê bi giştî neyê kirin, bi tenê û serbixwe be, dûr li her zanistekî be. Ji ber ku di encama hin peyvendiyên rêjeyî yên li gel zanistêndin tê nasandin, Her çend peyvendiyên wêje yên li gel dîrokê cuda ji zanistên din nayê kirin jî, lê em heman tiştî berewajî bikin, Ji ber ku wêje girêdayî ye bi mirov ve, ew dema ku mirovahiyê destpê kiriye, dîrokê jî dest pê kiriye. Lê zanistên xwezayî wek Matematîk û Kîmya û Astrolojî û hwd… Dîroka wan li gel mirovahiyê ne di heman temenî de ye. Ji ber vê jî peyvendiyekî du alî li pêş hemû zanistên din, li gel wêje û dîrokê dibe kelem ango astengiyek.[18] Diyare mijarên wêjeyî bi peyvendiyên dervey xwe ve hin rehendan li xwe bar dike, rehendê herî giring jî girêdayî ye bi mijare me ya rehendî dîrokî ye, Sedemekî din ê bêhtir wêje, bi dîrokê ve nêzîk dike, ewe ku wêje amûreke ji amûrên ku hatine nivîsandin ji komkirinên dîrokî, Wêje û dîrok li ser sê bingehan li

---

[16]*Teoriya Edeb,* Dr. Azad Ebdulwahîd Kerîm, Çapxaneya Erabxa, Kerkûk 2007, R. 13
[17]*Deriyek li Felsefeya dîrokê,* Deven Hesen, Dezgay çap û belavkirina Rojhilat, 2009, R. 314
[18]*El Edeb û Tarix*, Ge Hisên, Dar El Meruf 1981 R. 32-33

gel yek hevbeş in Ev jî (Mirov, Dem . Cîh ) in Bi vî awayî amûrê dîroknivîs û çavkaniyên wî, heman ew amûrin ku nivîskar di nav nivîsên xwe yên wêjeyî de, kar li ser dike û bi hemû awayên cuda ve, Ji bo mînak: Reng vedana ew serdema ku di nav nivîsên wêjeyî de dibe wêneyekî ronahî kirinê jibo mirov û kirina mijara pirsgirêk û serkeftin û şikest û bê taqetiyên mirovahiyê. Bi heman awayî wêje ew diyardeyên miroviye ku, di nav dîrokê de rengdaneya xwe heye. Ji aliyekî din ve buyerên dîrokî dikare bibin îlham ji bo nivîsên wêjey, Ew buyerên bi wî awayî dike nav berhemên wêjeyî de bi cîh dike, Diyare çavkaniya îlhamê yên wêjeyî gelek caran, bi buyerekî dîrokî ve girêdayî ye.[19] Tiştên li jor hin xalên hevbeş bun di navbera wêje û dîrokê de. Piştre jî em dema têr raman bun li ser romana dîrokî, bêhtir axaftin di derbarê wan peyvendiyan wê bê kirin. Lê pirs ewaye; eger ew hemû xalên hevbeş di navbera wan her du zanistan de hebe, dikare bê gotin ew hemû şibandina wekhev, di demek cuda de, di navbera wa her dû zanistan de cudayî bihêlê? Bi awayekî din gelo wêje û dîrok heman erk û wezîfeya wan heye? Ji bo bersiva wan pirsan Arîsto di pirtûka ‘’Hûnera helbestan’’ de dibêje: ((*Tiştekî aşkera ye, her wek berî naha jî me gotî, erkê rasteqîn yê helbestvan vegotina buyerekê nîne, ku wekî xwe ku çawa buyer pêkhatiye. Ji ber ku vegotineke ku pêwîstbu ew buyer bi wî awayî pêkbihata…ji ber vê jî dîroknivîs û helbestvan cudayî ya wan nabe; yek ji wan dîroknivîs vegotina buyerekê weşan dike, herwiha ji aliyê dinve helbestvan vegotina buyerê bi helbestê bi lêv dike. Cudayî ya wan ewe, yek ji wan buyerê çawa pêkhatiye vegotin dike, lê ewê din buyerê bi awayê ku pêwîstbu pêkbihata vegote dike. Helbest li gel dîrokê nirxê wê pir bilindtir e. ji ber ku bi temamî vegote dike. Li gel wê dîrok bi gûman vegote dike*)),[20] niha Dikare bê gotin dîroknivîs tenê wan buyeran vegotin dikin ku pêkhatine, Her çend helbestvan wan buyerane vegotin dikin ku di raborî de pêkhatine, yan di pêşerojê de wê pêkbên, Diyare axaftin li ser pêşeroj, bi xalên di navbera dîrok û wêjeyê de hatine cudakirin ve tê danîn. Herwaha Arîsto ji aliyê heqîqet û cevherê waqiî ango rastîve dibêje: (*Heqîqeta helbestê nîşaneyên wê zêdetirin ji heqîqetên dîrokî. Ji ber ku dîrok zêdetir giringî dide bi buyerên karesatên hurkarî. Ewên ku li dem û cîhên ku hatine diyar kirin de pêkhatine. Lê helbest li*

---

[19] *El-Rivayet El-tarîx fî El Edeb El Erebi El hidîs*, Dr Qasim Ebdî Qasim, Dr.Îbrahîm Ehmed El Îshwalî, Dar El Meruf Qahire 1979 R. 9
[20] *Arîston Mamostayê yekem*, Dr. Nerîman Ebdula Xoşnaw, çapxaneya rojhilat 2014 li 216

*heqîqetên giştî dinêre. Ewên ku qalibekî wan ê diyar heye*)[21]Ji dû xalan ve ku Arîsto baldikşîne ser wan rastiyan, aşkera dibe ku wêje li dîrokê zêdetir xwedî nirxekî bilind e, ji ber ku dirok amaje bi rastî û heqîqetan dike, Herwha ji ber ku dîroknivîs buyeran wekî ku hatî jiyan kirin, bi dîtina dîrokî ve vedibêje û pişta xwe girêdide birastiyan û belgeyên dîrokî.

Herçend wêje vegotina dîrokê ye, herwaha berhemekî hûneriye ku ji buyerên dîrokî ve hatiye dirûtinm, lê Dikare dirokî li rastiyê dûr jî bixe, ew jî bi sûd vergirtina li xeyal û cîhanbîniya nivîskar ve pêktê, Ji vêderê em aliyên wêje yên estetîk û civaniyê berî hemû rehendekî dibînin ku derdikeve pêş û herçend ji wan aliyên xwe ve dûr dikeve ji dîroknivîsê, lê hemû dahênan û babetên xeyalî yên dive derbarê de 'Voltair' wek dîroknivîsekî li sala 1694-1778 (*daxwaza bijartin û paqij kirina dîrokê dikir û dûr li efseneyan û hwd…Daxwaza li ser bingehê ronahiya eqil nivîsîna ji nû ve dîrokê dikir… ji ber vê (Montesko) di vê derbarê de rexne li wî dike û dibêje: ''Dîroknivîsekî dîl e…lê dîlê kilîsê nîne dîlê eqil e*)[22]Bi dîtina wan daxwazên Voltair pêwîste dîroknivîs girêdayî bin bi rasteqîniyê ve, ne ku karên civan û dahênana xeyal û efsaneyan vegotin bikin di nav karên xwe de, Bi giştî wan gotinên Voltair cudayiyek din a navbera dîrok û wêjeyê de ronahî dike, ku ew jî ''dahênan'' e, Ji ber ku wêje bi temamî rehendekî nû tê de reng dide, ku pêkhateyeke bi hêza takekes a li ser dahênan û xwe guncan kirine.[23]

Berevajî wê dîroknivîs ((*erkê nivîskare wêjeyi, ne tinê ewe ku qala buyeran bike û serpêhatiyên jiyanê vegotin bike, Ji ber rengdana serpêhatiyan û buyeran li ser awayê tevgerîn û reng û rûyê kesayetan divê binexşîne*)),[24] Bêguman ew hewldanên nivîskaran jî diçin nav xaneya wêjeyî ye, Di dirêjayiya wê behsa me de, em dikarin bibêjin ku gelek sedem hene ku, dibin pira peyvendiyên di navbeyna wêje û dîrokê de, Herwaha divê berçav girtin û parastina taybetmendiyên her du beşan jî bê kirin, Di vê wateyê de ne wêje dibe bermayê dîrokê û ne dîrok dibe beşek ji wêje yê, Ji ber ku her yek ji wan aliyên xwe yên taybet bi wan bixwe û karên xwe ve

---

[21]*Deriyek ji bo rexney wêjeyî ya nû Kurdî,* Dr. Hîmdad Hisênî, Dezgayê Mukriyan çapa yekem li 39
[22]*Deriyek li felsefeya dîrokê,* W. Deven Hesen, Dezgay çap û weşandinê yê rojhilat li 303.
[23]*Eyan wat, Serhildana romana Îngîlîz,* W. Rauf Bêgird, Dezgayê çap û weşana serdem 2009 li 21
[24]*wêje û Hûner,* Mûtesem Saleyî, çapxaneya Rûn Silêmanî 2007 R. 130

girêdayî hene, Bi vê dîtinê (Wêje bi dîrokê ve girêdayî destpê dike, lê di nawa dîrokê de daliqandî namîne).[25]

### 1.2.Têgîn û Pênase ya Romanê

We bizane li helwêstekî ne asayî de, dikevî nawa xelkên stêrkek ango cîhane ke din de. (*tu* Dixazî navê wan wek xelkê Mars ango Merîx pênase bike) ev xelke hindek pirsyarên di derbarê jiyana li ser rûyê erdê li te diken, ku bersiva wan pir girane, Ji ber wê xelkê li stêrka Merîxê jiyanê wek mirovên li cîhana me jiyan nakin, Di vê ceribandina dirêj û bilez de ew xelke ji te dipirsê: Xelkê li ser rûyê erdê çawa dema xwe ya bê kar derbas dikin? Tu xwe di westînî û qala topa pêyan ango futbolê û lîstokên wek satrançê û temaşa kirina televîzyonê jê re dikî, piştre jî dibêjî ‘*’Pirtûkan jî dixwînin*’’ ji ber ku pêwîste qala xwandinê jî bikî. Ev awayê serpêhatiyê çavê te dibre ku, tu wî têxî nawa vê piroseyê(xwandinê) yan jî jê re berfireh analîz bikî. Qala hin pirtûkan jê re dikey û piştre jî li ser roman diaxivî.Ew jî dipirsin roman çiye?Tu ji wan re dibêjî çîrokekî dirêje.Ew jî dibêjin (*Mînakekê ji bo me nîşan bide _ yan jî romanekî ji bo me vebêje*) di vê derê de hest pê dikî ku behs û vegotina romanê çend girane.Li vê derê radiwestî û dest bi asta pênasekirinê dikî.[26] Ji ber vê jî eger em hewl bidin pênaseyekî têr û tijî ya romanê bikin, emê rastî dijwariyekî giran û hewldanekî hêz dixwaze bên. Ev jî dibe ku ji be çavkaniya ji çend sedeman bigre.

Ji wan sedeman yek jî: Roman wek mijarekî wêjeyî ya giringe û berhemekî mirovahiyê ye ku, roj bi roj di gohertin û pêşveçûnê de ye. Herwaha ji ber wê jî evmijare berhemekî mirovahiyê ye, Ji ber vêyekî berdewam peyvendiya xwe bi hest, gotin û xeyala mirovan re heye, Diyare hest û gotin, ji mirovekî bo mirovekî din cudayiyan avadike. Ji ber wan cudayiyan jî roman gelek pênaseyên cuda di nav xwe de heldigre Li goşey nigaye kesên pênaseya darijandina vê mijara wêjeyî ve.

sedemê duyem jî, dibe peyvendî bi qebare ango hacîm û dema berfireh a romanê ve hebe, ku bikare hin diyardeyên civakî, dîrokî û derûnî û hwd. darijîne. Ji aliyekî din ve gelek babet û serdemên firehî û dirêjayiya nawa romanê wa dike ku, ev

[25] *Nivîsîn û Bêdengî,* W. Şivan Ehmed, Dezgayê Rewşenbîrî Cemal Irfan çapxaneya pîremêr 2015 R. 61
[26] *Roman û pîşeya nivîsandina roman ,* W. Ejî Goran, dezgayê rewşenbîrî û belavkirina Kurdî _Bexda 1982, R.5

mijar bi tu yasa û destûrekî ve girêdayî nebe û bi tu pênaseyekî temamî ya giştî gir serî na dayne.

Herwaha sedema sêyem jî ew e ku li gel serhildana her metod û dibistanekî wêjeyî di vê mijarê de gohertin biserde hatine, ew jî buye sedem ku roman di her qonaxek û serdemekî de pêwîstî bi nasandinekî cuda ji serdema pêş xwe hebê, bi vê nêrînê ve her pênase û lêkolînek ku di derbarê romanê hatibe pêkanîn gelek pirsgirêk û astengiyên din li gel xwe derdixe hole, ((*ew jîpirsgirêkên pênasekirina mijara wêjeyî ye, bi her cureyekî û berdewam hatiye gohertin ku tu yasayek nikare serî pê bide tevandin*))[27]Eger wahaye ew sedemên ku li serê hatine nivîsandin û gelek sedemên din dihêlin ku nivîskar û rexnegirên wêjeyî, li gor pênaseyekî bi bingeh û bê kêmasî, di asta vê mijara wêjeyê ya bilind de hin nirxandinan bikin, li gel wan hemuyan jî ji çend goşeyekî cuda ve hewla nasandina romanê hatiye dayîn û gelek car hin pênase di vê derbarê de hatine kirin.

Ji aliyê têgîn û zarawa ve roman bi Îngilîzî ‘’novel’’ û bi Fransî jî ‘’nouvelle’’ jê re tê gotin, Pêkhateya mijarekî bihêz ku wateya tiştên nû û taze dide, Bi zimanê latînê yê kevin jî, ku wek çavkaniya zimanê nû yêEwropayê tê zanîn peyva ‘’Romyan’’disedsalên 17-18 wek zarawayekî hatiye bikaranîn,[28] Ji aliyê serîrakirin ango serhildan de jî serîrakirina romanê bixwe ya di sedsala 18.mîn vegote diken Ji ber ku (( *Ji Hegel heta Jhon Halbirin, hemu jî di yek nêrînê de ku li ser romana hevçerx di dawiya sedsala 18.mîn û destpêka sedsala 19.mîn destpê kiriye*)),[29] Ew serîrakirina ji ber xwe û bê sedem pêşneketiye, Ji ber ku di encama gohertinên mezin ên hizrî, felsefî, aborî, siyasî û civakî ev mijar serhilda. Piştî ku çîna burjuvazî serdestiya xwe li ser civaka Ewropa selmand, li dû hewdu amadekariyên pêxistina şoreşa Fransayê ya li dijî çîna aristocrat bi xwere anî, ((*Bi wan şoreşan mafê azadiya takekesî û nêrîna xwe azad aşkera kirin a civatî hate bidest xistin û gelek bajarên mezin hatin avakirin*))[30] Piştî bidest xistina azadî û vegerandina mafên kes û avabuna hin bajarên mezin, pîşesazî û bazirganî pêşket ku bu sedema pêşketina amûrên çapemeniyê û pîşesaziya kaxezê, Bi vî awayî civaka Ewropa ji aliyê aborî ve rengdanekî bilez û erênî bidest xist, Di heman demê de vê şoreşa pîşesaziyê rê ve bu

[27]*Roman û waqî'* , Selah Omer, Dezgayê çap û weşana Serdem 2008 , R. 94
[28]*http://www.qaladze.info/la-mediakanawa/293-2011-05-05-00-38-18.htm*
[29] *Pirtûka Gîrfan(Berîk)* Selah omer, Dezgayê çap û weşana Serdem, hewlêr. 2010 R. 33
[30] *RexneyaWêjeya nu ya Kurdî,* Dr. Hîmdad Hisênî , dezgayê Mukriyanî çapa duyem 2010, R. 294

li hember geşbun û dubare giringî dana bi pîşeya keştîwaniyê, Di encamê de karîn gelek cîhên ku dur bêne awadan kirin û bibin malbenda bajar û şaristaniyetê û pêkve jiyanê, Diyare bajar û şaristaniyet sedemekî din ê serhildana mijara romanê ne, (( *ji ber ku roman, di civaka şaristaniyê de serîrakir û her di civaka şaristaniyê de bazar û xwandevanê wê jî pêşdikeve, Ew jî bi giştî li gel xwe pêşkeftinên heyî misoger dike*))[31]

Diyare roman wek mijara şaristaniyetê tê zanîn û her bajarek jî pêwîstî bi hin bingehên xwe yên taybet heye. ((*Wek belavbuna dibistan û pirtûkxaneyên giştî, zêdebûna binkeyên weşan û çapemeniyê*))[32] Bi awayekî roman deyndarê çap û çapemeniyê ye, Ji ber ku berî sedsala 18.mîn di derbarê xiyaba amûrên çap û çapemeniyê de mijarekî wekî destan '*destana helbestî*' bi rêya hestên bihîstinê û guhdarkirinê ve, bêhtir xwe digehande nav guh û dilê wêjeya dostan û xelk bi vê rêyê ve sûd û tam ji wêjeyê verdigirt û ji ber dikirin, Lê di gel peydakirin û danana çapemeniyê nivîskar û wêjevanan bêhtir giringî dan babetên pexş u çap kirinê, Di vê navberê de roman wek pêwîstiyekê hate nav qadê û hin nûnerên taybet ji bo xwe avakirin, Her di vê bereyê de (*(li gor baweriya gelek sernûserên sedsala 18.mîn, sedsala wan sedsalazêde nirx dayîna bi xwandinê ye)),*[33] Diyare piroseya xwandinê û avabuna xwandevanan, wek sedemekî din ê serhildana romanê tê pênase kirin, Bi dîtina berhemên wêjeyî bê xwandevan wekî ku ew tunene wiha dihate pênasekirin.

Ji vê derê dikare bê gotin hin buyer û faktor dibin bingehê serhildana mijarên nû yên bi navê mijarên romanî, Ew jî piştî ku destanan nekarî mil bi milê rewt û rewşa nû re xwe rêkbike, ji ber vê jî nûserên wê serdemê pêwîstiya wan bi mijarên din ên nû hebû, Ji bo ku bikarin pirsgirêkên milmilaneya nû û modêrına xwe tê de derbas bikin, Ji ber ku piştî wê pêşkevtina lez a nav civakê û avabuna gelek bajarê mezin pirsgirêk û milmilaneya navber mirovan de bêhtir hatibu astekî ku diyar dikir û wa pê di hesiyan, ku bi vî awayî nivîskarên wê demê karîn pêşkevtinên hizrî, aborî, siyasî û civakî bi romanê ve vegote bikin û romanê bikin amûrekî babetên serekî û bal kêşandin ser diyardeyên nû û bûyerên civakî yên pêşkevtina civaka xwe.

---

[31] *Karubarîvegoteyê ,* Zahîr Rojbeyanî, dezgayê çap û weşana Serdem, 2010, R 7

[32] *Serheldana Romanî Îngilîzî, Eyan Wat,* W. Rewuf Bîgerd, dezgayê çap û weşana Serdem, Çapa duyem, Silêmanî, 2009 R. 11

[33] *Edebiyat Maêr Ayran,* Ruz be , Mihemed Reça, Cab Dûm , Tehran , Neşir Rizgar , R 34

Dema ku em bên ser pênaseya romanê wisa base ku di destpêkê de lêvegerekî bihête "nasandin" têgehandin wek piroseyekî wê rastir be, Ji ber vê jî roman Bi giştî bixwe lêgerîna buyerekê, yan jî çend buyeran e, bi piştîwaniya her çar regezan ve dikare bê pênasekirin Yên herî giring pêkhatiye bi ''Dem, cîh, Bûyer û karakter'' Ji aliyê dîrokê ve, eger em ji aliyê ne wêjeyî û ne hûnerî ve temaşey vegotinê bikin, emê bibînin ku dîroka vegotinê vedigerê bo dema ku mirov dest bi axaftinê kiriye û hewla têgehandina kesên ku derdora xwe daye, Diyare ev kare jî pişta xwe bi piroseya vegotinê ve girêdaye û bi wî awayî pêkhatiye, ewa tê wateya ku bi hemu dirêjayîya dîrokê de vegotin hebuye. Piştre jî wek kereste û amûrekî wêjeyî di nav destan û roman de dibe bingehekî giring û her di vê derbarê de *Dr. Haşim Ehmed Zade;* dibêje: ((*Dîroka vegotinê, vergêr dike bo ew serdemên ku mirov bi gotinan serpêhatiyên xwe ji hevrevedibêjin, Lê li gor gohertinên dîrokê, vergerkirin jî gohertin bi ser de hatine*))[34] Piştî ku vegotin hat nav wêjeyî jî, ev hatin jî tenê zêdebuna bingeh û qahîmbun nîne di nav romanê de, ji ber ku her gohertinek di çunayetiya vergerê de di mijara romanê de ava dibe, dibe sedemê gohertinê di temamî mijarên romanê de, Di vî alîde roman dervey ku mijarekî nûye û dîroka serhildana wê diçe heta dûsed salan û di heman demê de ev mijar di milmilanê de ye li gel pêşdeçûna şaristaniyetê û pêşkevtinê de, Ev jî tê wateya ku dest û çokên wê ranawestin li hember buyerên tên jiyan kirin û ji nûbun û tazebuna xwe tu tiştek winda nekiriye, Ji ber ku dest firehiya nav romanê rê xweşker e û bingeh avadike ji bo vegotinê û hemû cure buyerên jiyana mirov dikare bike mijara vebêjîna xwe û bi vî awayî dibe cîh u çavkanî ya sûd vergirtina civakê li xeyal û balkêşandina ser hurkariyan ve, Ev sedemane hemû jî li gel xwe gohertin di piroseya vegotinê de anîn, ji ber wê jî roman (( *Pêkhateyeke ji cîhanekî xeyalî û vegotina ku, tê de fezayek peyda dibe, cîh û serdema jiyana hin karakterên ku hatine diyar kirin*))[35] Bi dîtina ev pênaseya li jor hatî kirin, dikare bê pirsîn gelo waqî ango rastî di romanê de tê piştguh kirin? Yan jî roman ew cîhana xeyalî çawa pêktîne? Yan jî roman nivîs çawa di heman demê de sûd ji herdû aliyan de verdigre? Dikare bersiva wan pirsyarane wiha em bidin ku (*Nivîsên wêjeyî tenê bi serê xwe fantaziyên, qutbuyî "rut" ji cîhana rastiyan nînin*) Eger ev gotin ji bo nivîsên wêjeyî rast be, ji bo romanê jî dibe

[34] *Fensan jûv, bûtîka roman,* W. d. Mihemed Rehîm Ehmedî, Dezgayê Aras, 2012, R. 15
[35] *Cîhana roman,* Haşim Ehmed Zade, Nawendî hunerî û roşenbîrî andêşeç 2015. R. 8

rastiyekî giştî gir û bi temamî peyvendîdare li gel wê, Ji ber ku her romanek ( *Berdewam têkelbunekî aloze ji waqî ango rastiyan û xeyalan*) Erkê aliyê xeyalî yê nivîsê pêkhateyeke ji tam dayînê, ji bo xwandevanan û giringî dana aliyên hûnerî û estetîk ango xweşikbuna nivîsa wêjeyî ye, Aliyê waqî ango rastiyê jî bêhtir peyvendiya xwe li gel rehendên aborî, civakî, siyasî û rehenda derûnî ya nivîsê ve peyvendîdar e, Heger wiha be di nav nivîsa wêjeyî de rastî girêdayiye bi form û aliyên naveroka nivîsa wêjeyî bi xwe ve ye, Waqî ango rastî dibe bingeh li dervey nivîsê û aliyê naverokê bixwe jî Ji ber vê jî di demekî ku mijarên wêjeyî de roman mijara herî serbixwe û mijara herî berçav a wêjeyî ye,*Roman dikare bingehekî berfirehtir ji bo dîtin u şirove kirin û têgeheştin li jiyana mirov û mercê navxwe û derve bidest bîne*, Ew hemû erkên roman ê belgeyên mirovdostî û giringî dana bi takekes, demekî ku hemû wan babetane bidest tên roman nivîs rewşên aloz ên derdora xwe têkelî xeyalên xwe biket, ji ber ew berhemê wêjeyî bi wî awayî pêktê li ((*vergerkirinek û vegotinekî dur u dirêj u têr û tijî û aloz ku pişta xwe bi rastiyan ve girê di da, Lê têkele di gel xeyal û hûnerê û tê de hin kesayetiyên ku hin buyerên rêxistinkirî de erk û rol ji wan re hatiye dayîn û dem û cîhên hatine diyar kirin de dibin hêvinê avakirina pirtûkekî serbixwe ya bi navê romanê*))[36] Bi vê dîtinê ve roman sûd li rastiyên di nav civakê de verger dike, wek kereste û amûrekê li xizmeta pêkanîna nivîsê de tê bikaranîn, Bi bêhnekî realizma dirêj dariştina buyeran dide bas kirinê, Lê nayê ev wate ku xeyalan jibîr bike û bibe goristina estetîkê, ji ber ku bi awayekî tejî pilan jê re hatiye dariştin ku hewla têkelkirin û gav avêtina herdû aliyan dide, Li gor pêwîstiyan di naw piroseyê de verger û vegotinê bikartîne.

Gelek caran ev têkelkirin û gav avêtine mercê dayîkbun û berhem bidestxistina romanekî nemir û gelek xwandevana taybet li gel xwe ava dike, Ji ber ku tenê giringî dana bi dervey nivîs û mijar kirina rastiyan û dariştina buyeran a bi awayekî realist xwandevanan ji xwendinê sar dike û bêzar dike, Xwandevan wisa dizanê ku nivîsekî dekomanterî dixwîne, Bi awayekî eger roman nivîs destê wî vekirî û azad nebe, di xulqandina buyer û kesayeta balkêş û her awayî nikarê avabikê. Ji ber ku ew xeyal dihêle ku roman nivîs cîhanekî cuda avabike, Bi armanca lêkolîna rastî li ser jiyan, herwaha bi armanca dîtina rastiyan û revandin a şubhe u gumanan, ji wan hemûyan sûd vergirtin li waqî ango rastiyan û xeyal û çand û ezmûnên nivîskar li gel xwe

[36]waqî' El-rîwaye El-Erebiye*, İhsan Tefîq simî', dar El-wefa, 2002, R. 76*

encamên berçav derdixin hole, Ji ber wê divê em jibîr nekin ku yek ji erk û taybetmendiyên din ên romanê jî karkirin û giringî dana ew çanda ku roman têde li dayîkbuye bixweye ye, Ji ber vê((*Her romanekî nirx bi taybetmendiyên waqî û çandî yên welatê xwe nede, nabe xebatekî wêjeyî yê cîhanî*)[37] Ji ber ku her çîn û civakek taybetmendiyên xwe yên çandî ku yên wê bixwe ne heye, her çandekî jî wêjeya xwe heye. Ji bo vê gelek car çanda her gelekî rengdaneyekî rastûrast li ser wî gelî bi cîh dihêle, Di beşên pêşde bêhtir emê qala çand û rengdaneya di nav romanê de bikin.

Ji vê derê dikare roman wek pêkhateyekî her mijarekî wêjeyî bê danîn, ku bi zehmetî dikare li hevdû bê cuda kirin û di tu pirtûkekî dîrokî yê wêjeyî de ew li hevdu cudakirin nayê dîtin ku wekî di romanê de hatiye bi dest xistin. Ji ber ku di hemû dem û dewran û zemanekî de, di her qewm û gel û her çîn û mijarên romanekî aliyên xwe yên taybet bixwe ve girêdayî heye, ku pêkhatine ji romana dîrokî û romanên civakî û romanê sozdarî û evîndarî, Herwaha romanên polîsî û romanên derûnî û romanên civakî û bi dehan awayên din ên romanê ew baskê wêjeyê dewlemendtir kiriye, Eva tê wateya ku roman bi wan berhemên xwe yên ku pexşîn û hûnerî ve gotareke ku berî rastiyekî dîrokî bê beyan kirin e, lêkurbun û dahînanekî ji xeyal û ezmûna nivîskarekiye, Dibe ku roman li ser bingehê dîrok û rastiyan hatibe dariştin, yan jî pişta xwe bi hêza xeyalî ve girêdabe bi wî awayî hatibe nivîsandin, Lê ya giring û di herdû rewşande jî xala li berçav û pênaseya wê ewe ku pişta xwe bi her pênc hestên xwandevanan êbi sûd û tam vergitinê ve girêdide, Ev awayê romanê xwandevanan teqez li ser romanê fikirandinê ve girêdide, ji ber ku armanca bingehîn a romanê ewe ku her tiştekî di cîhana çîrokê de hestyariye rê ji bo xwandevanê xwe xweşbike ku wan hestan agahdar bibhn û wan hestan bi kûranî jiyan bike.[38] Ji vê dîtinê ve Lionel “Trelenk” ku yek ji rexnegirên Amerîkaya bakûr e, li gor wî ((*Roman tê wateyahewldana berdewam ku ji bo geheştina rastiyan û hest pê kirinan e*))[39] Xwandevan gelek car bi armanca revîna gumanên xwe dest ji bo wê mijarê dibe, Ji ber ku ((*Roman berhemê serdema ku felsefeya takekesî û guman têde serdest bu serî rakiriye)*)[40] Felsefeya gumanî ya ‘Renie Decart’ me dibe ser gelek pirsyaran

---

[37]*Li heyivda bo rûy to û le peyivda bo xom degerêm*, Heme Seîd Hesen, dezgay aras, 2010, R. 77
[38] *Henir Reman,* Nasir Îranî , agae – Tehran , 1380, R. 48
[39]*Roman çîye? ,* Komelêk nuser , û.Cevad Mistefa , R. 89
[40] *Benadî gêranewe le dastanî ( Mem û Zîn ) î Ehmedî Xanê û romanî ( şarî musqare sipyekan)î Bextiyar Elî da ,* Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî , dezgay mukiryanî , 2009, R. 25

û wa dike ku em berdewam bi fikirin û amûra pirsê ya bi peyva 'çima' li ser zimanê me kêm nebe, ku heta em bigehin bersivekî.

Me li jor çend mijarên li hember pirsyarên felsefî û meseleya mirin û jiyanê û herwaha diyardeyên civakî dest avêtê, Lê ji aliyê bingehê ziman ve ji, ji ber ku roman awayeke ji awayên pexşanê de ku li zimanê rojane yê gel ve tê çêkirin, ne pêkane em bikarin zimanê roman bilez ji pirtûkên pexşanîyên amûrêndin cuda bikin.Di vê mijarê de dikare em bipirsin û bêjin, gelo em dikarin xwazaya wêjeyê li gor taybetmendiyên din ên zimanan pênase bikin? Yan jî mijar û nivîsên wêjeyî, heman taybetmendiyên wê hene li gel ziman? Ji bo mînak ew zimanê di nav romanê tê bikaranîn, heman ew zimane ku di nav helbestê de tê bikaranîn?

Diyare roman bi zimanekî ve girêdayî ye, Ne ku qet aloz nîne, lê ji ber bikaranînekî ziman yê sade û asayî nêzîktir e, herwaha ji ber ku bêhtir giringî bi peyamên mirovî dide, ji ber vê armancê jî roman nivîs pêwîste bi zimanekî sade û bê girêk zimane xwe bikarbîne, dixwaze peyamên xwe bilez bigehîne xwandevanên xwe, ew jî dihêle ku xwandevan tam ji xwandina romanê verbigrinm Herwaha ew jî dihêle ku xwandevan ne tenê tam ji xwandina romanê verbigrê, heta xwe jî dinava wê romanê de bibîne. Ji ber ku ev mijara wêjeyî peyvendiyeke li ezmûnê mirov ê di derbarê gel û dem û cîh û buyerên li hember jiyanê.[41]Ji ber wan sedeman roman pêkhateyeke awayê zimanê cuda yê nav wan karakterê ku di nav romanê de li gor pîşeya xwe rol digrin e. her ji ber vê jî(*Roman divê ji gelek diyalektîkên civakî cuda bê pêkanîn*)[42]Li gor piroseya vegotina asta temen û rêgez û pîşeya karakter gwehran bi ser de dê.

Di dawiyê de dikare kurteyek ango puxteyek têgeheştinan di derbarê wê mijarê de li hember me be, ku dikare wiha bê dariştin ku roman wekî mijarekî wêjeyî yê nû, ji cîhana xeyal û buyeran pêkhatiye û hatiye avakirin ku, di hiş û awazê roman nivîs bixwe de vejiya ye, bi rêya piroseya vegotinê ya amûrê çîrokê ve û pişta xwe bi çar rêgezên pêkanînê ve girêdaye û bi wî awayî wek berhemekî berdest dibe. Ji aliyê naverokê ve jî gelek awayên cuda têde peyda dibin, Romana dîrokî ji yek ji wan awayêne ku di mijarên pêşde hewla analîze kirina berfireh u ravwekirinê emê bidin.

---

[41] *Rexneya edebî û Qutabxanekanî – Pêşekîyek bo teorî Charles Bresler ,* W. Ebdulxaliq yaqûbî, çapa duyem, Hewlêr , 2007, R. 79

[42]*şîîri û Şîmşêr,* Heme Seîd Hesen, dezgayê aras,Hewlêr 2009. R. 42

## 1.3.TÊGÎN Û PÊNASE YA ROMANA DÎROKÎ

Bi armanca analîz û nasandina romana dîrokî, pêwîst dike em bi awayekî cuda balbikşînin ser romanê û dîrokê, bi cuda behs li ser bikin, Lê ji ber ku di beşên berî de me pir li ser roman gutubej kir, ji ber vê pêwîst nake ku carekedin bê dubare kirin.

tişta ku dimîne dîroke, berî ku bê pênase kirin jî wisa başe aliyek li zaraweyê wê em vekin ku çawa tê bikaranîn û em bikarin wateya naveroka wê jî têbigehin, Ji bo wê armancê jî pêwîste di destpêkê de em li ser zimanê Ewropiyan biponijin û zimanê Erebî û zimanê şirîn ê Kurdî jî bilez amajeyekî lê bikin.

**Zarawayê dîrokê**: Ew zarawe di zimanê Ewropiyan da wek peyva ‘’History’’, ku peyvekî Yewnanî ya kevin hatiye girtin û wek dayîka giştî zimanên Ewropiyan tê pênasekirin (wateya çîrok û mijar û buyerên ku hatine vegotin)[43]Di ferhenga zimanê Erebî de jî gelek car wek El-tarîx li ber çavê me û guhême dikeve, ku heman rastiyê digre navxwe, Ji aliyê wate yi ve: (bi wateya dariştin an jî vegotina babetekî kevin û raboriyekê ye)[44] Di zimanê Kurdî de jî peyva mêjû ango bi Kurmancî dîrok, heman rastiyan pênase dike, ku mêjû ango ‘mêj-dîr’ bi watayên kevin tê armanca vê peyvê jî vegotina raboriyên kevin e. Bi wî awayê karanîna peyvê di zimanên cuda cuda de ji aliyê wate de li yek diçin û ya giring îşaret bi buyer û raboriyên kevin dikin, serpêhatiyên kevin ên Benî Adem vedibêjin û vegote dikin ji bo rojame ya îro.

Diyare mirov serê sibê dema ku ji xev hişyar buye, her hewl daye ku bigehîte rastiyan, Bi taybetî rastiyên jînge û devrûberê xwe, Ji ber ku bê devrûber ango xweza jiyana mirov ne pêkan e û nikare pêngavên serkeftinê bavêje. Ji aliyekî din ve Benî Adem ango mirovahî ji demekî zûde di nav gerîn û hewlê bi dûketinê de buye û armanca bidestxistina diyardeyên aloz çareserkirinê û geheştina armancên xwe yên ronahîbunê de buye. Herwaha bi vê ronahiyê ve hemû tiştên tarî yên jiyanê çareserbike, ku di jiyana mirov de çavkaniya pirsgirêkan gelekin û bune sedemê pêşketin û paşketin an.  Bi vî awayî hemu rikaberî û hevkêşiyên di navbera mirov û derdorê, ango mirov-mirov, mirov-gerdun, mirov-tiştên veşartî, mirov-efsane û hwd. Herwaha buna çavkaniyekî mezin ji bo giştî mirovahiyê û duketina hemu sedem û pirsgirêkan, Li gor vê vegera bo paşerojê ango raboriyê û lêkolînên li ser diyardeyên

[43]*Rêbaza lêkolînan û Rêbazê lêkolînkirina dîrokê,* Dr. Keywan Azad Enver, çapxaneya çarçira, çapa sêyem, Silêmanî 2008 R. 17

[44]Heman çavkaniya berê R. 17

cuda cuda yên li ser ruyê erdê vê rê xweşker bin ku serhildanekî zanistî yê bi navê zanista dîrokê serî rake.[45]Bi dîtina vê vegotinên ku li serê hatine gotin ve, bêhtir behs li ser vê zanistê tê kirin û çend pênaseyek em vergirin û em balbikşînin ser yek li wan pênaseyê(Dr. Kemal Mezher Ehmed) ku dîrok bi (zanista zanistan pênase kiriye.)[46]Herwaha li gor(Maron) jî waye ku dîrok (tomara zanyariyên raborî ango kevin e)[47] Ji ber ronahiya wan du pênaseyan dikare bê gotin, dîrok herdem çav li paşxwe dike, Raboriyê dike madeyek ji bo karên xwe û herwaha wekû zanistekî tejî di nav hemu zanistan de ew jî goşeyekî vêzanistê de cîhekî giringe, ku her zanistekî xwediyê dîrokekî taybet ê xwe heye, wekî dîroka wêje yê, dîroka zanistî ya bijîşkî û dîroka zanistî ya Fîzîk û Kîmya û … hwd.

Ev darijandinên ku hatine kirin dihêle ku em bibêjin dîrok bi zanistên xwezayî û mirovî hemuyan re buye alîkar û derfetekî qenciyê li gel hemu zanistan kiriye, Dîrok wek tomarekî ji aliyê dîroknivîsan ve hewla tomarkirina buyeran dide û zanyariyan dixe berdest, ku di raboriyê de buyerên pêkhatine sûdê dide dema îro ya rojame û bi vê tomarê digehîne pêşerojê, Ji ber ku dîrok (tomarkirina dengdanekî ye bi rêyên herî bi sûd ji bo hejmarekî herî zêde tê nivîsandin)[48] Dema qala sûd a dîrokê em dikin, rastûrast em girêdayî dibin bi naha û pêşerojê ve, Di vê wateyê de nabe bê gotin ku hêza wê ya axaftinê heye li ser rojame û pêşerojê, Ji ber ku di encama xwandinekî kur ya li ser raboriyê, reng di de rojame û dibe bingehek ji bo pêşerojame. Ji ber (dîrok tu rê çareyekî ji bo pêşerojê pêşneyar neke. Lê dibe alîkarê me û ew hemû tiştên ku hatine jiyan kirin û tiştên pêkan in û dihêle em baştir bibînin)[49] Gel û millet bi rêya dîrokê ve dikarin pêşiya hin xeletiyên mezin bibin asteng, Eger nikaribin dîroka reş û xirap bigoherin jî, herî kêm dikarin hewlbidin ku wan buyerên xirap dubare li ser wan pêkneyê û sûd ji dîrokê verbigrin, Di derbarê dîroka reş û xirap a her neteweyekî de, pêwîste em amaje bi erk û rastgotinên dîroknivîs bikin. Ji ber ku dîrok ((ne Xwe şiştina ji raboriyê û xwe ne rizgarkirina li

---

[45]*Felsefeya dîrokê, ni :* Rehîm Sabir , çapxaneya genc , çapa duyem , 2005 R. 186
[46]Dr.Kemal Mezher Ehmed *(kurte vegotinekî zanistî ya dîroka Kurd û dîrok )* çapxaneya Dar El-Efaq El-Erebiye , Bexda 1983 R 7
[47]*Rêbaza lêkolînê Rêbaza lêkolîna dîrokê,* Dr.Keywan Azad Enwer , çapxaneya çarçira , çapa sêyem , Silêmanî 2008 R 18
[48]*Dîrok çîye?* W. Asos Mihemed Mela Qadir , Çapxaneya Wezareta Perwerdê , çapa yekem , 2005 , R. 11
[49]*Kevirên Ruh ,Dîroka TêgînênFelsefî ji kevin heta îro,* Ferşîd Serînî , Dezgayê çap û weşana Serdem , 2014 , R. 30

raboriyê ye, Ji ber erkê têgeheştinekî wek mifteyekî bo têgeheştina ji rojame û berçav girtina berjewendiyan e).[50]

Li dû hevdu zincirek ji pênaseyên cuda cuda û axaftina li ser du mijarên serbixwe li ser her yek li **‘’*roman û dîrok*’’** naha demê vê hatiye ku em bipirsin gelo romana dîrokî çiye? Erk û wezîfeya vê awayê romanê çiye? Ji aliyekî din ve romana dîrokî çi cudayiyekî xwe heye li gel dîrokê bixwe, gelo xalên hevbeş di navberê wan de heye?Ji bo em bikarin bersiva wan pirsan bidin, pêwîste ji çend aliyên cuda ve em berbi romana dîrokî biçin û bixin ber lêkolînê, Berî naha jî me qala peyvendiyên tund û tejî yên di navbera wêje û dîrokê kirin, Di vê navendê de roman jî wek mijareke ji wêjeyê, ne tenê peyvendiyên wê bi dîrokê ve beşa şêr a wan peyvendiyan li ber wê dikeve, Ew jî bi dîtina ku romana dîrokî wek li dîrokê de buyerên xwezayî yên mirovî pêkhatine û mijara wan a serekî ye û ji ber wê jî pênaseyên romana dîrokî derdora dîrokê tê û diçê, lê ji zemînê dîrokê cuda nabe, Di vê derbarê de li gor ***Graham Hof*** ((*Hemû romanek dîrokî ye. Eger bi wateya giştî em li hûnera roman lêbikolin, Ji ber ku her wekî ku diyare ji ber wê peyvendiya tund û waqiî û rastiyên jiyanî yên pêktên, rengdana vê jiyanê ye*))[51] Bi heman awayî ***Georg Lukas*** jî waha dibîne: ((*Romana dîrokî, romana ku rojame ango îro dike mijara behsê û sûd vergirtina kesayetên dîrokî û buyerên dîrokî, bi awayekî amadene ku wekî vegoteya îro û raboriyê li gel yek dike)*)[52] Li gor Îsmaîl Heme Emîn jî ((*Roman bixwe nivîsandina dîrokê ye*))[53] Diyare armanc li nivîsandinê ji aliyê navborî de, pêkhateyeke ji proseya vegotinê, Ji ber ku ((*Tiştekî belge naxwaze ku roman bi temamî birêya vegoteyên tê ziman u behis kirin)*)[54] Ew jî bi vê dîtinê ve ku ((*Roman ceribandina vegoteyê ye*))[55] Roman nivîs bi rêya kanala vegoteyê çend babetekan dixe ber behsê, Ji ber ku yek ji bingehên herî giring ê romanê vegotine, bê pêşgotinê ez diçim ser armanca xwe, ew jî vegotin bixwe di navxwe de me dipêçe berbi aliyê zanista dîrokê, ew jî bi dîtina dîrok pêkhateya dîroka raboriyê ye. Raborî jî bêhtir bi rêya vegotinê xwe pêktîne, bi vî awayî renge dîrok awayek bi be ji awayên di nav

---

[50]*neziriye tarix adabiyat,* çap û sala 1387 , Tehran Sixin , R. 39

[51]*Rengdaneveya kevneşopiya romana Kurdî 1985 – 1991* , *Nameya Maseterê* , Îbrahîm Hesen Hemed , Zankoya Selahedîn , 2011 , R. 44

[52]*Min El-rîwaye , El-tarîxiye* , Dr. Ebdule Xelîfe , Dar ElErebiye , El İlim , Cezar , 2007 , R. 43

[53]*Bingehê buyeran,* Arî Osman Xeyat , çapxaneya Narîn , 2011 , R. 67

[54]*Gotûbêja li Romana Kurdî Kurmanciya jêr, 1991 – 2003* , Dr. Celal Enver Seîd , 2013 , R. 20

[55]*Teknîkê vegotinê li romanên Ebdula Serac,* Rêzan Rihman Xidir.Çapxaney awêr. Hewlêr R. 16

romanê de, Di vê derbarê de li gor Şêrzad Hesen: (*(Roman nivîs berhem bidestxistina romanekê de dîrokê kopi ango dubare nake, roman nivîs ew valatiyên ku heyî tejî dike, ku dîrokê li paşxwe hiştiye û wan cîhan tomar dike ku dîrokê ew jibîrkirine, Roman nivîs bi wateya mirina karê dîrokê nîne, di wêjeyê de dîrok tê ser rûpelan. Lê berdewam dike ku mirov ecêb bimîne, ku ew hemû hurkarî û tiştên ku nedîtine li dîrokê de peyda dike. Roman nivîs perde li ser hemu fezayên ku heyî radike, ku dîroknivîsan çavê xwe lê girtine)).*[56]

Bi piştgiriya wan gotinan dikare bê gotin, eger zanistekî wekî dîrokê li gel zanistên din em bi pîvin û muqayese bikin, disa herçend gizî û sextekariyên li dijî wê têne kirin jî beşa şêr li ber dîrokê dikevê, Ew jî dema ku dîrok nivîs nikare bê alîbe û babetên dîrokî binivîsê, berdewam di bin bandora netewperestiyê û hestên xwe de dimîne, Destê wî naçe tomarkirina şikest û beyan kirina wan şikestan ku bi ser wan hatiye, Ji ber vê hewldide wan buyeran tomar bike ku, di berjewendiya cîhanbînî û nêrînên wî de be û bîr û buçûnên wî bi biselmînê ango ispat bike, Ji ber vê yeki ((*Dîrok nivîs nikarin bêjin em bê alî ne. Raborî wekî xwe gotûbêj û analîz kirine û em jî naçarbuni raboriyê li gor mercên dîrokê û têgeheştina xwe bigrin berdest, li pencereya xwe ve bixin ser yek û li gor me çawa başe wusa jî darîştin dikin*.))[57] Gelek car tiştên ku dîrok tomar dike kesên serkeftî ne, ji ber vê rol û azatiya xwe li ser hesaba ên kesên wunda kirî dixwazin derxin pêş. Dîroka hatî nivîsandin dertêxe pêş ku ew serkeftinên hatine bidest xistin, di encama take kesekî ku wek nîmetekiye pêkan buye, ew jî pêşenge, yan jî serok e. ji ber wê jî (( *Di vegotina dîrokê de axaftvanê serekî buyerên siyasî û generalên mezin in*))[58]Bi vî awayî dîrok tenê nirx bi buyerên giring û diyar dide, xulaseyekî encaman dixe ber rêjneya tomara xwe, cîhê buyer û kesên berçav dibê di encam de bi giştî buyerên jiyana kesan sade winda dike, ku nirx pêdan helwêst li ser wan diyar kirin û têr raman in.

Di vê valatiyê de roman nivîsa dîrokî ew aliyên ku hatine bîrkirin dixe ber behs û gotûbêjê, Dîrok bi çi sedemekî be hin aliyan jibîr dike û bi formekî din ve darijandina buyeran tomar dike. Ji ber ku ((*Piraniya romanên dîrokî nirxekî taybet bi jiyana netewî û karakterên asayî dide.*))[59] mînak: niviskarê romanên dîrokî behsa

---

[56]*Bingehê buyeran di romana Kurdî de,* Mîran Celal Mihmemed , Çapxaneya Rebî' Silêmanî , 2009 , R. 54
[57]*Nivrîye tarîx Edebiyat* , çapa sala 1387 , Tehran Sixin , R. 39
[58]*Wek Baskdara di nav Daristana tirsonekan,* Bextiyar Elî , Çapxaneya Endîşe , 2012 , R. 47
[59]*Tîşkêk bo ser roman ,* W. Şîrîn , ki , Dezgaya Serdem , 2006 , R. 8

wan sedeman nake ku, Napolyon wa kir li hember Rusyayê şikestin jiyan bike, Berdewam pêwîst nabîne ku behsa jiyana Napolyon bike, ji ber dibe ku dema wêneyê wî askar u şervanê bi awayekî sade bikşînê û di dema êrîş birina ser Rusyayê de ku ji ber sard u sermayan tengawî hene, ji ber wê yekê sernekevê, Behsa xem, tirs, eşq û êşên wan karakterên asayî dike, ne rêveber û generalan, yan jî çend buyerek li êrîşên Napolyon yên li ser Rusya dixwaze ku ji aliyê dîrok nivîsan ve ne giringin amaje pê bike, yan jî li gor armancên xwe romanên dîrokî wan buyerane dike kereste û amûrek, têkeliyekî ji xeyal û rastiyan avadike. ji ber vê ((*Roman dibê xeyalî,rastî û dîrokî bi be))*[60]

Eger Roman, di encama tekeli ye xeyal û rasti(waqiî) de be, dikare bê gotin ku, romana dîrokî wekî karekî hûnerî û wêjeya dîrokê dike kereste û amûrji bo xwe, lê dîrokê kopî nake, Ji ber bêhtir giringî bi cîhanbînî û dîtina nivîskar dide, Ji bo agahdar kirin li hurkarî û mezinkirina buyeran û her ji ber wê jî roman nivîs rewşên asayî wekî xwe beyan nake, ji ber bêhtir di nav hindir û naveroka buyeran dikole, ji ber vê jî cudayiyekî pir di navbera romanên dîrokî û berhemên dîrokî de derdikeve hole, Romanên dîrokî girêdayî ye bi awayê estetîk û xweşikbuna hûnerî û di warê dariştina xeyal û avakirina wêneyê cuda cuda de, xwendavanan dikşîne û tamekî dide wî, Ew awayê romanê di nav hindirê karakteran de diçe, xwe dike eynika hindir û deruniya karakteran, Romana dîrokî berewajî nivîsên dîrokî, dibe rêheval û yaverê karakterê xwe, di hemû cîhekê de jî hebûna xwe diyar dike, Rêhevaliyê dike ji bo çûna gel gulfiroşekî ku dema mijûlê gul jêkirinê ye ji bo heskiriya xwe, Bi giştî behsa xem û xoşiyên karakterê xwe dike, Lê berhemê dîrokî ji wan aliyan ve vegoteyekî di asta seranser de ye.

Eger romana ‘’Şer û Aştî’’ ya Tolstoy wek romanekî dîrokî tê naskirin jî, le tu xwandevanek bi armanca şarezabuna di derbarê dîroka şerê Rusya û Fransayê de biryara xwandina wê pirtûkê nade, Ji bo wê armancê bi sedan û bi hezaran berhemên dîrokî li berdest hene, ku alîkarê xwandevanan bin ku bigehjin armanca têgeheştina li şerê di navbera Rusya û Fransayê.[61]

Dibe ku xwandevan ji bo ku tam vergirin li dariştina xeyal û wêneyên estetîk, xweşikbun û hûnerî yê û di asta bilind de vegotina ziman, biryara xwendina wê

---

[60]*Kovara Raman* , hejmara 177 , R. 80
[61]*Ziman, Wêje û Nasname* ,Haşim Ehmed Zade , Dezgayê Aras , çapa yekem , 2011 , R. 309

romana dîrokî bide. Diyare aliyekî din ê di navbera berhemê dîrokî û romana dîrokî de ku wan ji hev cuda dike heye û dervey xeyal û estetîkaliyê ziman de wek aliyekî herî giring romana dîrokî derdêxe pêş, Nabe roman nivîs ji bo afrandina romanekî dîrokî zimanekî kevin bikarbîne. Ji ber ew zimanê kevin divê rastgotin û xwe guncawkirina li gel awayê vegotinê yekbe ku baweriya xwendavanan pê bê, Ji ber divê zimanê wê tejî be û li gor hestê wê serdemê be. Gorkî behsa ziman dike û dibêje: ((*Ew nivîskarê ku behsa zaroktiyê dike, bi zimanê zarokekê diaxive û ji ber ku rastûrast dibêje û ji ber bi hestên zarokî ve gotin dike û bi awayê zaroktî bîrdike, di fikire dikare bê gotin ku zaroktiyê û rast gotinê pêktînê*))[62]Diyare romana dîrokî giringî bi zimanê kevin nade, ku êdî dem li ser derbasbuye û ji ber bi hestê wê serdemê û zimanê wê ve diaxive û pişta xwe bi babetekî dîrokî ve girêda ye, lê bixwe dîrok nîne û ji wê pêknehatiye. Bêhtir giringiya xeyalan ve danûstandin li gel wan buyer, dem û karakterane dike ku hebun, Lê ji aliyekî cuda û nû ve.

Di dawiya vê behsê de dikare romana dîrokî di çend risteyekî de bê rêzkirin, ku romana dîrokî berevajî li berhemên dîrokî bêhtir azadî û dest valayiyê ji bo roman nivîs fireh dike, bi sûd vergirtina li cîhanbînî û dîtin û nêrînên taybet bi xwe ye.

Aliyek din ve jî taybetmendiya romana dîrokî ya din jî cîh, buyer û kesayetên dîrokî dike kereste û amûrê vegotina xwe ji bo xwandevanan û baldikşîne, Herwaha hewldanên nivîsandina ew aliyên veşartî yên dîrokê, ku dîrok nivîsan pir li ser vegote nekiriye, yan jî bi qesd jibîr kirine, wek me diyar kir bi xeyalan firehiya nawa romanê dagir dike, Lê gelek car pir baş lihevtê ku roman nivîs pir zêde dîrok dinivsînin û giringî pê didin û pir zêde xeyalan bikar naynin. Ji ber gelek car roman nivîsên, romana dîrokî, ji dîrok nivîsan rastgotintirin, ji aliyê nivîsandina goşeyên tarî yên di nav dîrokê de.

---

[62] *Tîşkêk li ser roman ,* W. Şîrîn , ki , Dezgayê Serdem , çapa yekem , 2006 , R. 8

# BEŞE DUYEM: RÊBAZÊN REXNE YA DÎROKÎ

## 2.1. TÊGÎNA RÊBAZA REXNEYADÎROKÎ

Rexnegir ji bo bikare bi awayekî zanistî nivîseki nirxandin bike mijara gotinê û hewla rawekirin û helsengandinê bide, pêwîstiya wî bi hin pêngav û zarawayên rêbazê heye. Rêbaza rexnegiriya dîrokî jî, rêbazekî bêhtir girêdayî ye bi naverok û derve ya nivîs û nirxandinê bixwe ve. Ev tê wateya ((*Rêbaza dîrokî radibe, bi lêkolînê ve ew sedemên ku bi bandor in li ser wêjeyê û têgeheştina dîroka ramyarî û civakî, giringin ji bo têgeheştina wêje yê*))[63]Ev jî di goşeya ku nivîsên wêjeyî tenê ji form û aliyên hûnerî û estetîkî ango ji xweşik bunê pêknayên, Li gel form de naverok jî hebûnekî bi bandor e, Ew jî bi dîtina ku her nivîsek dayîkbuyê civak û jîngeya serdema xwe ye, Ew jî tê wate ya ((*Yek ji rehendên nivîsên wêjeyî jî ku, pêkanîna peyvendiyên nivîsê yên dervey xwe û mahiyeta xwe ya di nav nivîsa wêjeyî ji aliyê dîrokî ve misoger dike. Li gor ku hemû nivîsên wêjeyî rengrêjiyekî diyardeyên bûyeran û morikên serdema xwe ne. tomarkirina ezmûnên dîrokî yên takekesî, nivîskarê li nav nivîsa wêjeyî de bi xwe ye*))[64] Wekî ku di behsên berî naha de jî me amaje pê kir, bûyerên dîrokî amadeyîka wan ê li berçav heye di nav nivîsên wêjeyî de, Ji ber wê nivîskar bêhtir ew bûyerên dîrokî dike armanc û bi dîtina cîhanbîniya xwe û xeyal û ezmûnên xwe ve, bi dema ku jiyan dikere dike yek û bi hevdura girêdide, Her ji ber wê jî nivîskar û rewşa xwe ya derûnî arasteyekî din ê rêbaza rexnegiriya dîrokî ye,

Bi vê dîtinê ve dikare bê gotin ku nivîsa wêjeyî ya nivîskar pir geşbîn nebe. Lê berdewam reşbîn jî nabe, Ji ber piranî ezmûn û afirandina nivîskar bixwe ye, ku di encama geran û lêhûrbuna nav cîhana jiyan û civakê de hatiye avakirin, Ji ber ku ((*Nûserê dur û ji peravan de digerê, berdewam hûnera nizim di afrîne*))[65] Tu nivîsek vala nayê nivîsandin, Ji ber ku girêdayiye bi civakê û jîngeyê ve ku reng tê de vedaye, Ji bo vê ((*Nivîsa wêjeyî rengdana rastûrast û durist a rastiyên serdeman xweye. Ev nêrîne, wêjeyê bi rengdana rastiyên dîrokê dizane*))[66] Diyare hin buyer hene ku dibine hêvinê nivîsan, Di vê çarçoveyê de dikare rehendên dîrokî li ser cîh û

---

[63] *Fî Elinqid El edebî El Edîp ,* Dr. Faq Mêgfî, Dr. Ebdalriça Elî ,wezareta İlîm Alî walbihp El İlmî, Camie El Miwêl,1989, R. 169

[64] *Arastekanî rexneya şîîrî kurdî ,* Karzan Kerîm Amîn , Namey master , zankoy selahedîn , 2009 , R. 19

[65] *Teorî Nwêyekanî Rexney Edeb,* Dr. Kemal meruf. R.19

[66] *Nivrîye Tarîx Edebiyat,*çap sal, 1387, Tehran Sixin , R. 41

buyeran de em bihêz li ser raweste bikin, ji vê derê jî em dibînin ku, her romanek û berhemekî wêjeyî li ser bingehê cîh û buyeran xwe bi bingeh dike, Ji ber vê nivîskar gelek car cîhên dîrokî û bûyerên dîrokî dike kereste û amûr ji bo bingehê nivîsa wêjeyî, Ji vê derêve vexta ku mirov lê binêre dîrok xwe dixuşikîne ber bi wêjeyê û di vê navendê de ketina navyêk û li nav hewdebûnekê em dibînin, Peyvendiyên dû alî yên wa her dû zanistên mirovî em çavlê bikin ((*Ji vêderê em dibînin nivîsa wêjeyî dikeve peyvendiyê li gel kereste û amûrên dîrokî, wêje jî di vê qadê de peyvendiyên dûalî yên di goherin li gel cîhanekî din ê zanistên mirovî ve xwe girêdide ku ew jî dîrok e*))[67]Ji bo têgeheştin û li dûkevtina hurkariyên di nav nivîsa wêjeyê, tenê mijara ku hatî nivîsandin têr nake, Ji ber ku divê em vegerin bo wê serdema ku ev berhemê wêjeyî tê de derbas buye, Sedemên civakî û ramyarî yên wê serdemê em xwe bigehînin û ew destkeft jî di encama vê de pêktê ku ((*Nivîsa wêjeyî di nav sîstema civakî bixwe çavkaniya xwe verdigre, ku peyvendiya xwebigotarên din yên mirovahiyê ve heye*))[68]Herwaha nivîskar jî sernivîsekî din ê vê rêbazê pêktîne, Jiyanameya nivîskar hêjayî nirx pêdanê ye ku bê rawe kirin û analîzkirina berhemê wêjeyî ye, Kesek nikare bandora dîrokê li ser jiyan û berhemê wêjeyî yê mirov ji nedîtî ve bê. Dîrok amûrekî giring û zindî yê jiyanê ye û wêjeya her gel û neteweyekî cudayiya wê û cudakirina wêjeya her gelekî di dîroka siyasî û civakî de, zerer û ziyanên ku nayên paşvegerandin û mayînde ne, bingehê derunînasiya netewî û rewşenbîriya wî gelî pênase dike. Lê ew peyvendiya dûalî ya di navbera wêje û dîrokê de, nayê wateya ku wêje bibe duhajoyê dîrokê, Ji ber ku pêwîste ((*Bi awayekî giştî, divê ev pirse wa bê lêkdan ku, dîrok di xizmeta nivîsa wêjeyî de be. Ne ku bi awayê nivîs wek xewnekî bişimite xeta dîrokê û ew ruhe tê de bê avakirin*))[69] Di vê navendê de berdewam nivîsên wêjeyî nabine sedemê têgeheştina li dîrokê, berevajî wê dîrok bixwe dibe amûrekî giring bo tegeheştin li dîrokê û kurbun û ponijandina zêdetir di nav nivîsa wêjeyî de, Ew jî di demekî ku piranî caran hin çandên kevin û demborî di nav nivîsê de berçav dikevin, vegotina û vegera dîrokê jî ew çand û diyardeyên demborî û kevin re rê xweş dike ku zêdetir têgeheştin avabibe. Bi vê armancê berî naha jî bi awayekî serbixwe sernivîsek ango serewanek me ji bo vê

[67]) *Karzan Kerîm Amîn,* Arastekanî Rexney şîîrî kurdî , namey master, zankoy selahedîn , kolêjî ziman, 2009 , R. 19
[68]*Nivrîye Tarîx Edebiyat ,* çap sal , 1387, Tehran Sixin , R. 40
[69]*Rexne û îdeolojya ,* Heyderî Hacî Xidir , Senterî lêkolînewey fîkrî û edebî nima , çapî yekem , 2005 , R. 25

mijarê destnîşan kiribu, ku me di wê derê de behsa cudayiyên di navbera wêje û dîrokê kiribu.

Bi giringî dana rêbaza rexneya dîrokî ve, emê bal bikşînin ser rastiya ku '*wate*' bi tenê di nav nivîsê de hebûna xwe tuneye, ji bîrkirin û bêhempa bidest girtina vê rêbaza nivîsa wêjeyî bi tenê û bi awayekî tezî ango rût wateya temam û giştîgir ji xwandevanan re bexş nake, Ji bo bidest xistina wateya nû kur û berbi wateyên veşarti yên di nawa nivîsê de heyî ve biçî ku pêwîstiya me bi hin bingeh û amûrên din heye, Ji bo vê jî bo bibine rê xweşker ku dubare rawekirina nivîsê û kelecana wateyê bi awayekî wek babet ji goşeyekî cuda ve divê bê analîz kirin û rawekirin, Diyare peyvendiyên dîrokî wek zanistekî serbixwe ji rexneyên wêjeyî ve çavkaniya xwe digrê, ku vegotin di dema dîrokî û bûyerên dîrokî de rolekî bilind dibînin ji alîkarî dana rexnegir li pêdaçûn û ponijandina di nav nivîsa edebî de, Herwaha ev peyvendiyên navbera dîrok û rexneyên wêjeyî de alîkarê rexnegire ku bi awayekî babetî û dûr li xeletiyan û kêmasiyan, rexnegir dikare berdewam be li rexneyên xwe û wek piroseyekî wate û nîşaneya nûjeniyê di nav nivîsê de bi destbixe,

Ji aliyekî din ve arastekirinekî din ê vê rêbaza rexneyî sûd vergirtina li dîroka jiyanameyî ango 'biyografîyê' ya, bi armanca rawekirina rexneyên giring bi jiyana nivîskar re dide. Bi vê nêrînê ve (( *Gelek car roman nivîs, bi taybetî li romana xwe ya yekem de xwe davêje ber wan zanyariyên ku li jiyana xwe de heye û ew bûyerên ku di jiyana xwe de jiyan kirine, ew jî peyvendiyek li gel hûnera jiyanameya xwede avadike, Ji ber ku jiyana mirov amûrekî hatiye amadekiriye û di bin destê wî de ye ku bi nivîse*))[70] Ev awayê mijarên romanê piranî caran rengdaneyekî rastûrast yê encama jiyan û ezmûna nivîskar bi xwe ye, Bi vî awayê rexneya jiyanameyî wek baskekî di nav rêbaza rexnegiriya dîrokî de serî rakir, ku carekî wa dibînî ku jiyanameya nivîskar cîhê têr raman û sedemekî herî giring ê analîzkirin û rawekirinekî zêdetir e ji berhemên wêjeyî.

Arasteya sêyemîn ya vê rêbazê rexneya ku pişt bi teoriya pêşkevtinê '***CharlesDarwin***' ve girê dide, hewldana nasandina nasname û nijadî ya nivîsa wêjeyî dide û cure û mijara nivîsa wêjeyî ya ji yek cuda û diyar dike, Herwaha

---

[70]*Hunerî jiyanamey xudî le edebî kurdîda,* NIme Qerenî Îsmaîl, namey master, zankoy selahedîn, hewlêr, 2004_2005 R. 48

lêkolîna li ser çunayetiya li dayîkbun û serhildan û pêşkevtina mijarên wêjeyî dike bi dirêjeyi ya dîrokê.

Bi wî awayî rêberên vê rêbazê pêdagîrbun li ser wê diyarde û buyerên dîrokê yên pêwîstin bo têgeheştin û diyar kirina nirx û bahayên nivîsa wêjeyî. Erk û wazîfeya vê rêbazê pêkhatiye ji peydakirina xalên li yek diçin di nav nivîs û nivîskar de. Erkekî din jî bi hevdu ve girêdan û kirina yek a nivîsê bi bûyerên civakî û dîrokî ve ye.[71]Ji ber ku nivîsa wêjeyî bixwe bi hin faktorên derve ve girêdayî xwe pêktîne û gelek caran jî dîrok dibe çavkaniyekî tenê ji bo  têgeheştina ji wê bixwe ye.

Di dawiya vê behsê de em dikarin kurteyekî bîr û nêrînên xwe yên di derbarê vê rêbazê de waha darijînin, ku rêbaza navborî bi piştîwaniya hin bîr û nêrînên hewldana avakirina hin bingehan dide li analîz û ravekirina nivîsên wêjeyî de, ku Giringî dide naverok û aliyên derve yên nivîsa wêjeyî û piştguh kirina aliyên hûnerî û form û ruxsar, ji ber ku wêje di vê rêbazê de xwedan cîhanekî serbixwe nîne, di heman demê de bi giştî taybetmendiyên hûnerî ji dest dide Ji ber ku bi tenê girêdayî ye bi lêkolînê ve, di naveroka berhemê wêjeyî de ber bi sedem û rastiyên dîrokê ve diçe ji ber vê jî ((*Estetîk ango xweşikbuna nivîsê di nav rêbaza rexneya dîrokî de winda dibe*))[72]  Bi vê belgeyê, ku nivîsa wêjeyî dikeve bin bandora her sê rêgezên, (nijad, jînge û serdem) herwaha kirina mijar a jiyanameya nivîskar bêhtir hişyarî ji lêkolînvan re dibexşe, ku bi armanca bidestxistina zanyariyên zêdetir û xwedî babet bunê de, Giringiyekî din ê vê rêbazê ew e ku dikare lêkolînê li ser nasnameya nijadî ya nivîsa wêjeyî bike, Herwaha hewldana ronahî kirina çunayetiya pêşxistin û li dayîkbun û serhildana mijarên wêjeyî dide bi dirêjahiya dîrokê re.

[71]*El inqid El tarîxî fî El edib*, İzedîn Xalid İbrahîm, El heqaq El İgbae wel nişr- Bêyrut, 1994  R. 33
[72]*El İnqid wel Edeb fî El êr El Hidîp*, Ebdalistar Ehmid Gahir, Migbe El Erşad, 1983  R. 89

## 2.2. Dîrokaserhildana Rêbaza Rexneya Dîrokî Ûrêberên Vê Rêbazê Yên Herîdiyar

Her rêbaz û dibistanek yan jî her zanistek jî li serdem û qonaxekî de serî rakiriye, ku ew serhildane li gor pêwîstiyên wê rêbazê be, Yan jî bi armanca bidest xistina gohertina cîhanê be, Ji vê derê ve rêbaza rexneya dîrokî di serdemekî de hatiye holê, ku rêberên vê rêbazê bi hin kêmasiyan hesiyane ku di nav rêbazê rexneyên wan de ye, ji bo analîzkirin û helsengandin û ravekirina nivîsên wêjeyî.

Sedsala 19.mîn, sedsala kurbunê bu ji bo lêkolîn kirina teorî û pratîkan, Di heman demê de pêşkevtina zanist sedemek bu ji bo ketin û nemana rêbazê romantîzmê Ji ber vê jî ((*rêbaza dîrokî di kurayiya dibistana romantîzmê pêkhat û jê cuda bu*))[73] Ew jî li du hevdû wêje berbi waqiî ango rastiyên jiyanê ve bir, heyama xewn û xeyalan nema ku bêhtir babetên heyî dihate araste kirin û bi yasayên civakî ve dihate nivîsandin, Di vê navbeynê de lêkolînên wêjeyî bêhtir giringî bi bingeh û rihên serhildana babetên wêjeyî dida, Ew jî çavkaniya xwe ji wê demê teoriya pêşketinê ya '*Charles Darwin*' digirt ku pir bi navûbang bu, Ev teoriya navborî kar li ser piraniya zanistan kiribu ((*Rexneya wêjeyê jî, ji bandora pêşketina zanistê de bê beş nebû. Berewajî wê hewldida rêbaza zanistî bi dest bixe û sûd jê verbigre û pêşxistina rêbaz û babetên rexneyî ava bike*))[74] Her di wê serdemê de li Ewropa hewldanekî pir zêde hat dayîn ku wêje bê zanistî kirin, Di vê navendê de jîrêbaza rexneya dîrokî bi piştîwaniya rêbazên zanistî û felsefeyên din bingehê xwe darişt, Li gor wê jî ((*Rêbaza dîrokî yekem rêbaza rexne kirinê ye di serdema nû de ji ber ku bi hewdu ve girêdayiye bi geşepêdana hizra mirovî, veguhezîna di qonaxa serdema naverast bo serdema nû ew pêşkevtine jî bi ruyekî hatî diyar kiriye, bo serkeftina hişyariya dîrokê ye. Ew hişyariya dîrokî jî rolekî serekî û cuda vergêr dike di nav serdema nû û serdema kevin de*))[75] Rêberên vê rêbazê bi sûd vergirtina li nivîsandin û berhemên çend fîlozofên bi navûbangm ku bibûn bingehê rê xweşkeriya serhildana vê rêbazê, hewldana pratîk kirinê li ser nivîsên wêjeyî didan û yek ji wan jî xanima fîlozof a bi navûbang '*Madam Dîstayl*' ku pirtûkek bi navê (Wêje di peyvendiyê de

---

[73] *Dr.Besam Qigwê ,* Derwazeyek bo mîtodekanî rexney hawçerx *,û. Dr.Mihemed Tatanî, çapxaney Şivan çapî yekem , sallî , 2011 , la 51*

[74] *Charles Brêslêr , Rexney Edebî û Qutabxanekanî ,*W.Ebdulxaliq Yequbî , Dezgay Aras çapî duwem , 2007 , la35

[75] *Fî El İnqid El Edebî ,* Dr. Êlah Fiçil , Dîmeşq , 2007 , ê16

bi civaka hatî damezrandî ve) Bi nîşana yekem ya vê tevgera rexneyî tê zanîn ku dibêje ((*Wêje civakê agahdar dike…ji ber ku berhemê pêşkevtina dîroka siyasî, civakî û dîrokî ye*))[76] Ew pirtûka navborî rê xweşdikir ku lêkolînên dîrokî bên kirin û bibe amûrek bo kurbun û ponijandin û têgeheştin li nivîsên wêjeyî, Di heman demê det teoriya (*Charles Darwin1809-1882*) rolekî bi bandor a berçav di şoreşa zanistî ya wê serdemê girt serxwe, ji vê derê em dikarin bêjin bingehekî giring ê vê rêbazê jî pirtûka navborî ye, ku di sala 1859 ê de hatiye weşandin e. Ew pirtûk faktorekî giring bu li balkêşandina ser rehendên dîrokî û bikaranîna di nav cîhana rexneya wêjeyî de, ((*Di derbarê gohertin û pêşkevtina hebûna zindî ya pişta xwe bi çend rastiyên biyolojiyê ve girêdabu, bibû zanista sedsala 19.mîn, di qada zanista dest bi kar û bi bandor bu*))[77] Nabe em jibîrbikin ku ((*Felsefeya estetîk ango xweşikêyê ya Hegel (1770-1831) bandorekî xwe ya giring hebû liser vê mijarê, bi taybetî jî aliyên vê felsefeyê ji bo hûnerê bi giştî ku xwe mijûlî danana pêywerekî dîrokî dikir û li gor wî, awayên hûnermend tenê agahdar kirinekî jêhatî nîne bo xwe gehandina gotarekî temam, ji ber ku awayên ku heyî agahdar kirin in, ên demek ji demekî dîrokê ne Ev jî tê wateya ku hûner deryaye ke ji gewher bo mirov di serdemên cuda cuda de*))[78] Her wekû berî naha me behs kir, hewldan û karên wan fîlozofan bun bingehê sedema avabuna rêbazekî vê herikandinê, pişt re jî ji aliyê hin rexnegiran ve bi karê hevbeş ve pêşde hat birin û rexnegirên herî binavbang ve (*Hîpolît Tayn, Sant Beef, Lanson, Bronter, Fîllman, Hanîkan, Buzcye..hwd.*) Sant Beef bi giringî dana jiyanameya nivîskar ve hewl dide nivîsên wêjeyî rawe bike, ku heta naha bîr û nêrînên wî cîhê helwêst diyar kirinê ye ji aliyê rexnegirên ve, Bi vê rêbazê ve rexnegirên vê rêbazê xwe dur digirtin ji girîngî dana jiyanameya nivîskar ji ber parastina rexneya babetê, Di rastiyê de Sant Beef berdewam negeheşte rexneya babetî, ji ber vê jî zanîn û aşîna buna bîr û raman û îdolojiya nivîskar tenê bi rêya bîr û nêrîn û zanyarî û ezmûnên rexnegir ve bi dest nayê, yan jî karekî ne pêkanê, (*Felman, Tayn, Hanîgan û Borcya*) rêberên vê rêbaza rexneyî bun û tevgera wan wekî ku geheştine bi rexneya babetî ne pêkane, li gor wan rexnegiran tenê giringîdana têgeheştina îdeolojîk û jiyanameya nivîskar dive vegerana dîrokê ku dibe sedemê ronahîkirin û rawekirina nivîsê. Berî biryardana armancê dîtin û nîşandana vê peyvendiya ku di navber nivîskar û ew

[76] *Teori nûyekanî rexney edebî ,* Dr. Kemal Meruf , çapxaney Lerya , Silêmanî , 2012 , R. 28
[77] *Bineretekanî felsefey komelayetî ,* Dr. Hemîd Ezîz, çapxaney Rojhelat , Hewlêr ,2009, R.179
[78] *Arastekanî Rexney şiîrî kurdî ,* Karzan Kerîm Amîn , Mastername , Zankoy Selahedîn , 2009 , R. 2

rewşa ku heyî û tê de jiyan dike, wekî ku me diyar kirî; ew pêşkeftina mezin ku di nîvê sedsala 19.mîn a di derbarê zanistê de pêşket, gelek bi bandor bu di bikaranîna ronahîkirina rastiyên jiyan û ew yasayên ku li cîhanê kar pê dihate kirin.

Bi wî awayî rêya ronahîkirina dîrokê li ser berhemên wêjeyî tê cîhbicih kirin, ew jî vê digehîne ku nivîskar girêdayî ye bi dîroka mirov û rewşa civakî ve, Biryareke rexneyî tuneye ku tenê biryarekî babetî nebe, ku bingehê vê di ronahîkirina kesekî ve derdikevê, Ev bîr û ramane vedigere bo *Madam De Stayl û Barant*; ev awayê ji nûbunêkî mezin re rê hatiye vekirin, ji aliyê rexne û rexneyên zanistî bi hemu sedemên ku heyî helsengandin dike, ji ber vê jî tu awayekî rexneyî tuneye ku bê rawekirin be û bê lêkolîn kirina sedeman be, Li gel wan hemu ronkirinan jî gelek caran li çarçoveya wêjeyî derdikeve, ew jî bi lêkolîn kirina aliyên dîrokî, civakî, derûnî û girêdana wan a bi rexneya nû ve ye.[79] Rêberên wê yê herî diyar jî ewên ku li xwarê ne:

**1-SANT BEEF (1804-1869):** Yek ji rêberên rexneyî jiyaname ango (biyografî) tê hejmartin, ku hewla mijar û  bi armanc kirina jiyana nivîskar dide, heta ku bi vê rêyê ve hurkariyên nav nivîsa wêjeyî ve dibe û dike mijara lêkolîn û analîz kirina xwe, Di wan aliyan de karên rexneyî giringiyekî mezin pê dida û kar li ser dikir Ev destxistina zanyariyan bu di derbarê jiyanameya nivîskar bixwe, ku pêkdihat ji pêdeçûn ji bo arastekirina çunayetiya kesayetî û rewşa xêzanî, civakî, hûnerî û bi taybet aborî hewla şarezabuna bihust bi bihust jiyana nivîskar helsengandin dikir û herwaha ji aliyê beden û tenduristî jî lêkolîn dikir…hwd.[80] Eger waye nabe berhemên wêjeyî li sîstema mirovahiyê û civakê bêne cudakirin, Di vê derbarê de Sant Beef dibêje: ((*Ez dikarim tam ji karekî vergirim, lê nikarim hikûm li ser wî karî bidim ku bi temamî ew kes an ji xudanê wê kari nenasim*))[81]  Bi vî awayî li cem navborî nivîskar dibe bingehê navenda karên rexneyî, Li gor Beef heger nivîsa wêjeyî girêdayî ye bi xwedanê nivîsê ve wê demê piroseya rexne rawekirinê bi armanca zanîna jiyana wî nivîskarî ve tê kirin, Di heman demê de amaje bi  hebûna gelek sedemên din ên derve dike, ku bi awayekî avakirinekî taybet e û ew jî sedema dîroka

[79] *Neqd El-Erebî El hidîp,* Dr. Ebdulezîz Hisên Fetuhî, dar El-inhge El-Erebiye, 1993 , R. 62
[80] *Menahc El-Enqid El-Edebî El hidîp* , Dr.Welîd Qesab , dar El-fikir _Dumeşq 2007, R. 25
[81] *Rexne û Îdeolojiya ,* Heyderî Hacî Xidir , senterî edebî û fikrî nima R. 23

bi cebr ango bi zor ê ye.[82] Bi wî rengî Sant Beef bê ku berêxwe bide naverokê, berê xwe da pênasekirin û nêzîkbuna li nav dil û deruniya nivîskar bixwe, Ev kare jî vedigere ku heyamekî dûr û dirêj xewna wî bixwe bu, ku bi be helbestvanekî mezin û bihêz, Ceribandina wî ya despêkê pir zêde serkeftî nebu, Navborî hemû deman hewldana ku bi rêya helbestên xwe ve milmilaneya helbestvanên dibistana romantik bike, Ev hewldane jî bi çend helbestên xirap û ast nizim de derkevt hole, ku bi wan navnîşana bun (*Jiyana Joseph, De lorem, Pirse û xoşî*) Ew şikest li dû yek bun sedem ku di sala 1830 hêdî hêdî xwe li dibistana romantik durbixe û berê xwe bide cîhana rexneyê û wek rexnegirekî herî bihêz derkeve hole, Sant Beef di destpêkê karê rexnegiriyê bi çend biryarên xelet û nerast dest bi karê rexnegiriyê kiriye. Bi armanca dijayetî kirina hin nêrînên kes û biryarên ne babetî dike mijar û li dijî çend helbestvanekî serdema xwe karê rexnegiriyê dike, Bo mînak wî bi tu awayekî li *Balzac;* tênegeheştibu herwaha li hember *Şatubiryan*; jî li ser heman mijarê daxwaza lêborînê kiribu. Ji ber vê jî di dawiyê de digot: Tu hestekî min nemaye li dervey hestên rasteqîn, Ew jî hestê jê heskirina wêjeyî yem Navborî hemû ew xeletiyên xwe sant beef dibêje: ji ber nebuna rêbazekî zanistî ya bihêz li hember jiyana taybet a nivîskar, bi awayekî kêm rêbaz û babetê desteng bi lêkolîn kirina dîrokî ya li ser rewşa derûnî, civakî, aborî û rewşa nivîskar berî ku rawe bike û biryar li ser naveroka nivîsên wêjeyî dayîn e.[83]

**2-HÎPOLÎT TAYN (1828-1893)**: Ew jî yek ji rêberên rêbaza rexneya dîrokî yê din e û bi dîtina *Tayn*; gelek sedemên din ên derveyî rol wan heye di afirandina berhemê wêjeyî dem Eger waha be jiyanameya nivîskar têr nake ji bo têgeheştina li sedemên dîrokê, Ji ber ku têgeheştin li giştî cîhanên cuda cuda yên jiyanê de kirokiya karên wî yên rexneyî bu, Ji bo vê jî hewldana kurt kirina karên rexneyî nedaye wek Sant Beef Bi tenê lêkolîn li ser jiyana nivîskar nake, ji ber ku hewldaye lêkolînên xwe bi bandor û mercên (nijad, jînge û serdem) bigehîne encame kî.[84]

*Nijad: Pêkhateya cavakekê ye, Herwaha dayîkbuna li gel mirov heta naha û xwe gehandiye rojame û berdewam xwe bi awayê li dû hevdû de ji neviyan heta

---

[82] *Menahc El-Enqid El-Edebî El hidîp* , Dr.Welîd Qesab , dar El-fikir _Dumeşq 2007, R. 25
[83] *El-tigur El inqid El-Edebî fî alêr El hidîp,* W. Corc Seîd Yusif, Minşurat Dar El miktebe El heyat , Beyrut-Libnan, R. 44-45
[84] *Menahc El inqid ElEdebî El hidîp* , Dr.Welîd Qesab , Dar El fikir _Dîmeşq 2007, R/ 27

neviyên din, bi yek rêgez, çand û awayên jiyanê civaka ku pêkhatiye ye, Eger bi vê nêrînê em lê binêrin her netewek xwedî kesayetî û taybetmendiyên xwe yê taybet e, wê demê nijad pênaseyekî serdemiye, ku ji nivîskar re wek mîrasekê ji neteweya wî jêre mayî ye, Rêgez li cem Teen ((*xwenîşandana ruhê neteweyî ye*))[85] Di vê mijarê de li gor wî nijad bandorekî bi temamî li ser berhemê gelan de pêk aniye, rola wan hemuyan jî heye di awayê pêdana berhemê wêjeyî de, ku armanc rengê çerm, çav, por û…hwd aliyên bedenî ve ye. Armanceke din jî pêkhateya di vêderê de ((*xasiyet angomorikê tem û mija di wêjeya Îngilîzî de diyare*)).[86]

*Jînge: Ev sînorên erdnîgariyê digre navxwe, ku hin sîmayên taybet bi berhemê wêjeyî re dibexşe, Bo mînak ji aliyê sîmayê erdnîgarî ve wêjeya Kurdî cudaye li wêjeya Erebî, Ew jî devrûbera erdnîgarî li yek cuda dike ku pêktê ji çiya, deşt û nevalên xwezaya Kurdistanê li gel xwezaye Erebî.

*Serdem: Di vê mijarê de jî armanc awayê fikirandina mirove, ku di civakekî hatî diyarkirin de û di serdemek têde derbas dibe, bi awayekî pir balkêş reng dide berhemên wêjeyî, Ji ber ku wêje morikên diyar ên serdema xwe rengîn dike, Yan jî di serdemekî ku hatî diyar kirin de, rengdar kirina ew mercên dîrokiye ku berhemên wêjeyî têde tê nivîsandin, Tayn di derbarê rexneya zanistî û bingehên pir hurtir û babetên din li rexnegirên berî xwe kar li ser dikir, di vê mijarê de dibêje: Pêwîste li ser me biryar neyê dayîn ku tenê di çarçoveya bingehê zanistî û taybetiyan de be, Li cem vê jî ku navborî rexnegirek bu giringiyekî pir dida aliyên mînakî (Al-mîsalî), her tiştek vedigere bo ruhiyeta xûdê, ew jî tê wateya cîhana jorîn ango semayî, ev jî wek belgeyekî bi bandora xwe heye bi teoriya teqlîdkirinê ya (Eflatûn) ve, Navborî peyvendiyekî xwe ya pir tund û tejî hebû li gel felsefê, nêrîn û bangawaziyên wî di derbarê felsefê de, li salen 1859-1852 şikest xwar. Ji ber rewşa xirap a siyasî û civakî ve nekarî nameya ango teza dîktora ye xwe temam bike, ku di wê derê de kar li ser aliyên felsefeyê dikir, Hemû nêrîn û ramanên wî agahdarkirin bu li ser ramanên eqilane, Li gor hemû diyardeyekî hizir û hestekî bidestxistî yê waqiî ango rastiyên xwezayî heye. Li gor baweriya Tayn; hemû îdeolojî agahdarî û rastiyên wê serdemê bixwe ne û bune berhem, Ji ber vê jî zincireyek ji peyvendiyan di nava rastiyan û îdeolojiyan de nebe nepêkane ku mirov bikare tiştekî nû avabike ku berî wê tunebem

[85] *Edebî Berawirdkarî* ,Mihemed Ebdul Selam Kefaî , û . Hejar Rehîmî , Dezgay Mukiryanî , çapî yekem , 2011,R/ 48
[86] *Arastekanî Rexney şiîrî Kurdî* , Karzan Kerîm Amîn , Mastername , Zankoy selahedîn , 2009 , R. 23

Ji bo vê jî hemû şirove, ravekirin û helsengandinek vegerandina rastiyên serdemên cuda cuda ne, ku xwe di ((*jînge, nijad û serdemê de dibîne*))[87]

**3-FÊRDÎNAND BRONTÊR (1849-1906)** : Ew jî rexnegirekî Fransî ye, dîrok nivîs û teorisyenê wêjeyî ye, Di karên xwe yên rexnegiriyê de hewl dida teoriya (Darwin) di pirsgirêkên geşepêdana babet û nivîskar bikar bîne, Bi dîtina Bronter; ve nivîskarên wêjeyî ku geşedan û pêşkevtin di xwede avakir, berbi nemanê xwe ve diçe û dimre Bi heman awayî Darwin, bi dîtina zîndewer zaniyê ve kar li ser wêjeyê dikir, Heta ku cure û dîroka nivîskarên wêjeyî diyar bike, ji aliyê serhildan, peresandin, bişkivîn û têkçûnê ve,[88]Bi wî awayî Bronter ji dû aliyan ve danûstandin li gel mijarên wêjeyê dike, Ji aliyekî ve peyvendî bi derxistina nasnameya mijarê ve heye, ku têde aliyên nivîskar û mijarê diyar dike Di hewldana çunayetiya ji yek cudakirina nivîskarê wekhev û hemrêgez de ye, Ji aliyekî din ve jî taybet ji bo têgeheştina li çûnayetiya peresandina wan nivîskarên wêjeyî yên di dirêjahiya dîrokê de dixwest fêmbike.

Her wekî ku me diyar kir di bin bandora pirtûka Darwîn; a ku giringî dida bi aliyên dîrokî û mijarên biyoloji yê û baldikşa ser pirsên jiyanê û mane, Bronter; hewl dida nivîs û nivîskarên wêjeyî rave û analîz bike, Li gel wan hemû bangawaziyên rexnegiriyên xwe dikir û di piraniya nêrînên xwe de wêje piştguh kiriye, bi taybet di ronahîkirina ew karûbarên ku peyvendiya xwe bi (nijad, jînge û Serdemê) ve heye, Bronter; di derbarê rexneyê de bi vî awayî nêrîn û ramanên xwe diyar dike û dibêje: Berî her tiştekî rexne biryar dane li ser nivîskar, ev biryare jî pişta xwe bi hêza têgeheştin li naveroka nivîsa wêjeyî ve girêdide, bi piştîwaniya wan pêngavan nikare rexne rexneyekî babetî be, Li gor navborî hemû demekî pêwîste rexne kesî be û wek zanistî be, giringiya şirovekirinê li cem Bronter; pêwîstî bi diyar kirina peyvendiyên nivîskar ve heye li gel dîroka wêjeyî ya giştî, Li gel wan yasa û reseyên ku heyî, ku taybetin bi diyar kirina nivîsên wêjeyî ve, armanca teoriya peresendin (evrîm) ya Darwîn; e, Bronter di derbarê piroseya peresendin û gohertina nivîsarên wêjeyî û rola nivîskar û wêjevanan de dibêje: nivîsarên wêjeyî li gor pêşketina yasa û rêsayan

[87]*El-Tigur El inqid El Edebî fî al êr El hidîp,* W. Curc Seîd Yusif, minşurat Dar El imkitbe El hiyae , Beyrut-Libnan, R.44-45
[88]*Pirensîpekanî edebnasî berawrid ,* Aleksander Dîma , û. Enwer Qadir Mihemed , çapxaney kemal 2001 , R. 182

gohertin di wan de ava dibe, Nivîskar jî bi hemû bername û planên xwe ve, tenê amûrekin ji nîşandan û vergêr kirina wan pêşkevtinan in. diyare em dikarin bêjin piroseya gohertinê ya navborî, girêdayî ye bi dîroka pêşkevtina mirovahiyê ve.[89]

**4-GOSTAV LANSON (1857_ 1934)**: Ew jî yek e dine ji rêberên vê rêbazê ye, ((*Bi bandora rexnegirên berî xwe yên wek bi taybetî Tayn û Bronter; hewldaye pişta xwe bi dîrokê ve girêdayî kar li ser rêbaza rexneyî bik,. Cudayî ya di navbera dîrok û wêjeyê de wek dû mijarên serbixwe digirte dest, Di derbarê vê mijarê de jî dibêje: mijara dîrokê paşeroj ango dema borî ye, babetên wê jî dema borî û paşeroje, Lê paşeroj ango raboriyekî ku mayînde buye, wê demê wêje di paşerojê de ango raboriyê de û îro de bi yek ve ye*))[90] Armanca karên rexneyî yên Lanson, xîzik û xetan dikşîne û cudakirinekî wêjeyê bu di dîrokê de. Piştî ku beşek li teorîsyen û nivîskarên wê serdemê rexneyên tund arastey rêberên vê rêbaza rexneyî kirin, ku ev rêbaze li hewldana ku wêjeyê bike piştek bo zanista dîrokê, bi heman awayî nivîsara dîrokî şirovekirin û helsengandin ji bo nivîsara wêjeyî bike piştek.

**5-FELLMAN**:Yek rêberên din ên vê rêbaza xwedan nêrînekî geş û aşkera yê derbarê rexneya nû ye, Bi awayekî zihmet jî be banga babetî bunê dikir, ku bi dîtina wî ve rexnegir divê biryar bide, ji ber vê rexnegir li ser berpirsyariya wî ye, bi awayekî serbixwe û azad ji berjewendiyên siyasî û partiyan, herwaha hemû padaşt û xwastekekî de biryar bide, Biryar jî pêwîste bi berçavgirtina hêza pêkanînê ya nivîskar be, ne weku giringî bide bîr û raman û îdeolojiya nivîskar, Ji ber ku nivîskar nabe wek pêkhateyekî aloz û çend rû bikeve ber neştera şirovekirina babetbunê, Tenê bi şirovekirina xwezayê û rewşenbiriya wî û ew civaka ku têda jiyan dike dikare bê şirove kirin, Bi vê nêrînê ve berdewam pêwîste em bizanin ku wêje tenê agahdariyê li rewş û rabûn runiştina civakê nake mijar, di heman demê de girêdayî ye bi hindek buyerên ku ji nişkive di civakê de pêktên jî dike mijar.[91]

---

[89] *Neqd El tarîxî fî El Edeb,* Mihemed Selah Haşim, Minşurat Dar El miktebe El heyat 1989, R. 53
[90] *Arastekanî Rexney Şiîrî Kurdî,* Karzan Kerîm Amîn, mastername, zankoy selahedîn , 2009 , R. 23
[91] *Neqd El tarîxî fî El Edeb,* Mihemed Selah Haşim, Minşurat Dar El miktebe El heyat 1989, R.53

**6-HANÎKAN**: Ew jî wek rêberekî din ê vê rêbazê, di goşeyeke din ve hewldana dariştina rexneyên xwe ferz bike ango bi selmîne, Lê nekarî bi vê ferzkirinê ve pir tiştbidest bixe. Ji ber ku di çemê Sîn de xeniqî û jiyana xwe ji dest da, Dema ku hên sîh saliya xwe derbas nekiribu, her di vê salê de pirtûka bi navê (rexneya zanistî) geheşte ber

Çapkirinê, Di vê pirtûka xwe de, dû rehendan dike mijara karên xwe yên rexneyî û ew jî wek erkê rexne û babetê rexneyê bun, Bi piştîwaniya bîr û ramanên Sant Beef ve, kurteyek bîr û ramanên wî ser vê pirsê ku çavkaniya xwe jê digirt ku dipirsî: Gelo em pêwîste bi rêya nivîsê ve biçin bo nivîskar, yan bi rêya nivîskar ve em biçin bo ser nivîsê.[92] Tiştên ku li serê ango li jor hatine nivîsandin, kurteyekî bîr û ramanên rêber û rexnegirên rêbaza rexnegiriya dîrokî bun, ku bi piştîwaniya çend bingehên cuda ve hewldana şirovekirinê û helsengandina nivîsên wêjeyî dide, Bi vegerandina dîrok û balkêşana jiyana taybet a nivîskar û destnîşan kirin û nav anîna nivîskaran û tiştên ku li yek diçin lêkolînkirin di çûnayetiya serhildan û destnîşankirina bingehê serhildana nivîsên wêjeyî ye.

### 2.3. BINGEHÊN RÊBAZAREXNEYA DÎROKÎ

Her rêbazekî rexneyî bi piştîwaniya bîr û raman û nêrînên rêberên hewla avakirin û damezrandina hin bingehan dide, ku bikare rexneyên xwe bi encam bike. Rêbaza rexneya dîrokê jî wek her yek li rêbazên din, hin sedeman dike bingeh û piştîwanî ji bo xwe ku bikare karên xwe yên rexnegiriyê pêkbîne, Her bi vê rêyê ve hewldana şirove û helsengandina nivîsên wêjeyî dide û ji wan ê herî giring jî:

1- Rêbaza rexneya dîrokî bêhtir girêdayî ye bi dervey nivîsa wêjeyî ve dide û sedemên derve yê wêjeyê red nake, herwaha wêje di vê rêbazê de xwedî cîhanekî serbixwe nîne û bi giştî taybetmendiyên hûnerî ji dest dide, Bi awayekî ji rêgezên xwe tê maliştin, ji ber ku zêdetir baldikşîne ser naveroka nivîsa wêjeyî, Herwaha di nav naverokê de jî bêhtir ji aliyê rehendê dîrokî de bist dibe, Ev rêbaze girêdayî ye bi lêkolîna babetên karê wêjeyî ve û bi piştîwaniya sedem û rastiyên dîrokî ve. Ji ber vê

---

[92] *El Tigur El inqid El Edebî fî El êr El Edîp,* W. Curc Seîd Yusif, minşurat dar El imkitbe El hyae , Beyrut-Libnan, R. 22

jî nirxê estetîk ango xweşikiyê nivîsê di nav zanista dîrokî de tê tejîkirin û wek belgenameyekî dîrokî li nivîsa wêjeyî tê nêrandin.

2- Li gor rêberên vê rêbazê bi giştî jî û bi taybetî jî Tayn; nivîsa wêjeyî dikeve bin şert û mercên hin bûyeran û bandora dîrokî, ji ber vê armancê jî li gor wan nivîsa wêjeyî dikeve bin bandora ‘’Nijad, jînge û sedemê’’ û bi vegerandina wan sê bandoran ve karên xwe yên rexnegiriyê berdewam dikirin.

3- Jiyanameya nivîskar û kirina mijar, aliyekî din ê vê rêbazê pêktîne, ku ji bo berfireh kirina asta têgeheştinê  bêhtir hişyarî bi rexnegir dibexşe ji bu şirove kirina berhemê wêjeyî, her wekî ji aliye ‘’Sant Beef’’ kar li ser wan aliyan tê kirin.

4- Rêbaza navborî li ser wan bingehan avabuye, ku amûrên dîrokî yên wek buyer, karesat, rewşên cûda, cîh û kesayetên dîrokî bi nivisara wêjeyî ve pênase dike û dertêxe pêş, bi vî awayî jî peyvendiyekî di nav wêje û dîrokê ava dike, Ew peyvendiye jî belgeyekî ku nayê haşa kirin ango derewandin e ji bo bandora dû aliyên di navber berhemên wêjeyî û berhemê dîrokî de.

5-Rêbaza rexneya dîrokî hewla derxistina nasname û diyar kirina nivîskar û nijada nivîsara wêjeyî dide. Ji aliyê peresandin û çûnayetiya li dayîkbun û serhildana nivîskarên wêjeyî ya di direjayî ya dîrokê de ye.

# BEŞE SÊYÊM: PIRAKTÎZE KIRINA RÊBAZA REXNEY A DÎROKÎ LI SER ROMAN A "XEVN A ZELAMÊN IRANÎ" YA MARDÎN ÎBRAHÎM

### 3.1. KURTE YA ROMANÊ

Romana ku nivîskarê vê Mardîn Îbrahîm e, ji 186 rûpelan pêkhatiye. Hin buyer, dem û cîhên cuda û çend kesayetên serekî û ne serekî girtiye navxwe û buyerên serekî yên di vê romanê de li ser bingehê xizmet kirina destnivîsa Ehmedê Xanê ya ku bi navê Mem û Zînê de ye. Piştî sala (1692) grubekî bi navê Xenceriyên nîvêşevê û wek şêrpence tênbinav kirin, li her derekî împaratoriya Osmaniyan belav bune û li tu cîhekê destnivîseke giran baha bi destê wan biketa di şewitandin. Dema ku Şêx İlyasê bavê Ehmedê Xanê qala vê gruba metirsîdar ji kurên xwe re dike, Ehmedê Xanê bi temamî tirsek tê de ava dibe, ji ber vê jî biryar dide, bi awayekî veşartî li gel feqeyekî xetên wî xweş yek dibînin û berbi hûcreyê dibe û ji vî feqeyî re dibêje ku pirtûkek nivîsiye û dixwaze du destnivîsên din li ber vê derbêxe, ku eger yek ji wan hate pûçkirin jî ya din bimîne. Êdî bê xem Xanî du destnivîsan li gel hevalê xwe yê baweriyê radike û yekê li Rihayê yekê li Bedlîsê û ya din jî li cem xwe datîne. Girubên Xenceriyên Nîveşevê di nîvê sedsala hevdemîn tenê li welatê Farsan heşt destnivîs pûç kirine, piştî hevt salan dema du destnivîs têne girtin, yek ji wan tê dizîn. Piştî pênc salan jî destnivîsa din jî tê dizîn. Piştre baskek ji gruba Xenceriyên Nîvêşevê, bi serpereştiya wan dikeve dest zilamekî bi xwe xelkê Maletî ye, ku navê wî Şevket' e. Şevket' direngiya sala 1705ê de li gel du birayên xwe diçine mala Ehmedê Xanê. Wê demê Xanî tenê salên xwe yên dawiyê jiyan dike. Bi tu awayekî be pirtûkê bidest dixin û didizin. Piştî ku Şevket Mem û Zînê dixwîne her di rûpelên destpêkê de bi destnivîsa Ehmedê Xanê ve tê girêdan û evîndariya wî ya bê encam mayî tê bîra wî û wa lê tê ku hest bê aramî û peşîmaniyê dike ku ev destnivîs ango ev pirtûk diziye. Ji ber vê jî her wê şevê biryara revînê û parastina vê destnivîsê dide û berê xwe dide navçeyên bin desthilatiya împaratoriya Safeviyan. Piştî demekê li Îsfahanê dimînin, piştre bi yekcarî li Meşedê bi cîh dibe. Dema berî mirina xwe xewnekê dibîne û di xewnê de jê re dibêjin wê destnivîsê biparêze û pêwîste vasiyet bike ku neviyên wî li du yek vê destnivîsê biparêzin. Piştre Şevket vesiyet bo bira û kurên xwe dike, ku vê destnivîsê bidin wan kesên ku rojek bê û hûn jî pirsên hin nîşaneyan li wan bikin û piştî ku hûn jê bawer bun bidin wan. Bira û kurên Şevket jî dizevicin û jin tînin û tenê li Meşedê, hemû Îranê û Turanê belav dibin û vesiyeta bapîrê xwe yê mezin bi pêktînin.

Di dema şerê di navbera Îran û Iraqê de zilamekî Îranî yê bi navê (Tehmasp) xewnekê dibîne. Di xewnê de jinek ji wî dixwaze, pêwîste di heyama du mehên pêşde biçe bajarekî li welatê Mezopotamya û dema geheştin bajarê bi navê Erbaîlo û di nav bajêr de biçine bo kelheyê û li wê derê malek heye û ji vê male re bibêje zarokê wan rojek li rojan, li zeman û serdemekê destnivîsekê rizgar dike. Eger tu peyama min ji vê malê re negehîni, wê demê rojek ji rojan wê neviyên Heredos serê wî zarokî jê bikin. Tehmasp serê sibê zu diçe bo mala Xusrew, xusrew jî bi tefsîr kirina xewnan bi navûbang e. dema digehe mala Xusrew du zilamên din jî li wê derê ne, ku heman xewna Tehmasp wan jî dîtiye. Her çawa be biryar didin, ku biçin bo kelheya Erbaîlo û mala Xanî. Bi armanca rizgarkirina Lasê kurê Xanî û çava digehin wê derê li gel yek xewna xwe bo Xanî dibêjin û ji wî re jî radigehînin, ku di demekî herî zû de bê du dilî vê kelhê bihêlin û derkevin. Li gel hin çekdarên ku cilê Kurdî di ber wan de diçin gel Xanî û sê zilamên Îranî diçin, piştî ku hawar dikin û Xanî agahdar dikin, sê zilamên Îranî tên girtin û serê wan tê birîn. Sere wan tê jêkirin, lê Xanî rizgar dibe û biryara revîna çiya dide.Piştre çekdar hevsera wî dikujin û Xanî jî Las ê kurê xwe dispêre jinebiyekê cîranê xwe.Piştî ku heyamek ser re derbas bu, Xanî li çiya berê xwe dide Brîtanya. Li gel İngilîzekê zevac pêktîne û kurê wan çêdibin, ku navê yekê Mîlyas e navê yê din jî Ofîlya ye. Ê ku vê romanê jî vegote û vedigêre keç xal û destgirtiya Mîlyas e. piştî wan hemu salan Xanî peyvendiya xwe li gel Lasê kurê xwe çêdike. Las pirsa bavê xwe Xanî li dayîka xwe ya jinebî dike. Lê ev jinebiye sûnd dixwe ku di vê derbarê de tu tiştekî nizane û jê re dibêje pêwîste di vê derbarê de Xanî bibîne û Xanî di vê derbarê de her tiştî dizane dikare wî agahdar bike. Las piştî kuştina destgirtiya wî ya Denkehinarê dibe helbestvan. Piraniya demê xwe li çayxaneya li kelha Erbaîloyê derbas dike. Piştre biryar dide berê xwe bide bajarê Meşedê, rojekê li Meşedê hevalên Las her çava dibe Las razîdikin ku biçin gel stêrk nasekê. Ev stêrk nase jî heman ew stêrknas bu ku navê wî Xusrew e, ku bîst sal berê xewna sê zilamên Îranî tefsîr kiribu. Piştî ku çubun gel Xusrew ji Las re gotûbû, ez wa hest dikim min tu berê li cîhekî dîtiyi, ji ber vê ji Las daxwaz dike dubare serdana wî bike û piştre jî jê re dibêje, min tu di xewna sê zilamên Îranî de dîtiye, ku bîst sal berî naha hatibûn bo kelha Erbaîlo, ku te rizgar bikin. Las kit û mit çîroka wî û zilamên Meşedî tê bîra wî. Berê wê Las biryara çûna derve dabu, ku biçe Londonê û Xanî û Mîlyas bibine. Las nizane ku Xanî û Mîlyas bav û birayên wî ne. piştî

heyamekê Las biryara vegerandina Erbaîlo yê dide. Xanî jî di serdemê temenê xwe yê dawiyê de ye û vesiyetekê bi awayê destnivîs bi rêya Keşeyekê ve ji bo Mîlyasê kurê xwe bicîh dihêle û qala hemu raborî û serpêhatiya xwe dike. Qala sê zilamên Îranî û baldikşîne ser aliyên veşartî yên ku Las birayê mezin ê Mîlyas e.Her çava dibe Mîlyas mijûlê çûyînê ye û dixwaze Las peyda bike. Ji ber ku êdî Las ji bo wî ne kesekî xerîbe, ji ber ku birayê wî yê navdare. Piştî ku Mîlyas digehe Londonê ve digehe kelhê û pirsa birayê xwe yê nazdar dike.Zilamekî pîr ê cîranê wan dibîne.Ew zilamê pîr jê re dibêje ez demekî dirêje hêviya teme. Zilamê pîr waha bi Mîlyas re gotibû. Kurêmin emanetekî giring li gel mine û ji bo te Las li gel min hêlaye, ku tenê ez bidim te. Diyare berî wê Las dubare serdana Îranê kiribu û Xusrew dîtibû. Her çava dibe li gel wî stêrknasi li Meşedê destnivîsê peyda dikin û vedigerîne Erbaîlo yê. Hefteyek piştî vegerandina Las, şevekê çend çekdarekî ser bi heman gruba Xenceriyên nîveşevê davêjin ser mala Las û wî birîndar dikin. Las bi awayekî birîndarî xwe digehîne mala zilamê pîr ê cîranê wan û vesiyet dike, ku pirtûkek di bin awahiya dîwarê mala wan de hatiye veşartin û wê pirtûkê bixwe bidete destê Mîlyas. Piştî destxistina Mem û Zîn a Ehmedê Xanê Mîlyas, vedigere bo Londonê û li gel rêveberekî belavkirina berhemên rojhilatî hevdîtinekê pêktîne. Di vê hevdîtinê de ew rêveber soz dide Mîlyas, ku eger di destnivîsê de mercên tejî û bas tê de bin wê çap bike. Piştre destnivîs tê çapkirin. Her li gel belavkirinê hejmarekî zêde de tê firotin. Ji aliyê rojnameyên herî baş ve li ser nivîs têne nivîsandin. Lê hemu rojnamejî bê agahin ji pirtûk ka çi serdem û wextekê de derbasbuye û çend kes bune qurbanê parastin û mana vê destnivîsê.

Her di destpêka romanê de û di çîrokê de, heta pîvanekê cuda û serbixwe çîrokeke din li ber çav dikeve û çîrok jî bi vî awayî ye:

Piştî ku ciwanek li welatê Brîtanya li gel hin hevalên xwe, li gel gazînoyekê de derbas dibin, li ser xwasteka hevalên xwe biryar didin, her yek ji wan bilêtekî ya nesîb ango vekişîna şans û bextî bikrin. Her çend vî ciwanî bawer pê nedikir ku, miroveke hin de bi şans û bextê wî heye û xelatê yekem ê vekişîna şans û bextî de wê jê re du milyon paund derbikeve jî, lê ew xelat ji wî re derketi bu. Ew ciwane beşa derûnînasiyê li zankoya Londonê xwendibû û temam kiribu. Piştî bidestxistina du milyon paund pare, ev xwandevanê beşa derûnînasiyê nexşe û planek danî, ku ev

pareyê zêde yê ketî destê wî, bikarê navendekî taybet bo wan kesên ku rastî nexwaşiya xembariyê û derûnî bune ji wan re veke û wan derman bike. ‘’Piştî hewldanekî zêde yê min û hevalên min û herwaha alîkariya darayî ya hikûmetê pêşkêş kir, me karî navendê vebikin. Li gel hin ciwanan me şev û roj bê westandin me kar dikir û pirtûkxaneyekî mezin ji bo vê navendê me ava kir, ku nexwaşên me bikarin bi xwandina pirtûkan ve xwe mijûl bikin. Ji rojek wan ji rojan dayîk û keçek li gel yek hatin vê navenda me, wek karekî û beşek rotin a karê me, pêwîst bu ez cuda li gel dayîka nexwaş di derbarê derûniya keça wê de bi axivim. Piştî axaftin û gotûbêjan ez têgeheştim, ku dayîkê keça xwe aniye navenda me, ku wek her yek ji nexwaşên me yên din em perwerde û eleqe nîşan bidin ku ji aliyê derûnî ve nexwaşiya wê ber bi başbunê ve here. Herwaha dayîka keçê ji min re got, ev keça ji ber ku bavê xwe ji dest daye zimanê wê şikesti bu û hêza axaftinê li gel wê nema ye. Min dema serdana pirtûkxaneyê dikir, ev keça min didît û bi şewq û coşekî mezin ve diketa nava pirtûkê. Ew pirtûkên ku di destê wê de jî bun, piraniya wan pirtûkan ên roman nivîsên mezin ên cîhanî bun. Ev keça navê wê Ofîlya bu. Ji ber nexwaşiyekî giran dinalî û roj bi roj jî nexwaşiya wê zêde û girantir dibû. Ofîlya yê gelek caran daxwaza hin pirtûkan dikir ku li pirtûkxaneya me de bidest nedikevtin. Lê bi çi awayek ba min jê re peyda dikir. Her di dawiya wê salê de, bi armanca mijûlkirina nexwaşan me pêşbirkek di navbera nexwaşan de rêxistin kir, ku nivîsa herî xweşik a ji aliyê nexwaşan de kîjan be me xelatek ji wî kesî re destnîşan kiribu, ku pirtûka herî baş binivsîne û bibe xwediyê payeya yekem a pêşbirkê. Roja piştî wê Ofîlya hate cîhê min û bi awayekê ez têgehandim ku, ew jî dixwaze pirtûkekê binivsîne û beşdariyê li pêşbirkê bike. Ji ber vê jî ez bê ku du dilî jiyan bikim li vê daxwaza Ofîlya razî bum. Ji ber ku armanca me ew bu nexwaşên me bi arasteyekê ve bibin, ku wan li nîgeraniyê, reşbînî û bê hêvîtiya jiyan dikin dur bixin. Ji ber vê Ofîlya hate gel min û daxwaza xwe pêşkeşî min kir. Ez gelek keyfxweş bum û min ji karmendên xwe re ragehand; dem, bername û cîhekî ango odekî taybet ji bo Ofîlya cuda bikin, ku di rewşekî asayî de çi dixwazê bikaribê binivsînê û ev pirtûka ku naha di destê we de ye ew pirtûk bixwe ye.(armanca wî di vê derê de pirtûka romana Xewna zilamên Îranî ye) pirtûka ku Ofîlya di wê heyamê de mijûlî nivîsandinê bixwe bu. piştî şeş mehan pêşbirkê û şûnde Ofîlya hate gel min û ez agahdar kirim ku heta naha mijûlê

nivîsandina pirtûkê buye. Belê ew pirtûka ku naha hûn dixwînin keçekî bîst û şeş salî, ku hêza xwe ya axaftinê tunebu nivîsî.’’

Wê demê em dikarin bibêjin bi giştî buyerên nav vê romanê, çavkaniya xwe ji vê çîrokê digre, ku ew jî pêkhatiye ji teknîkekî nû hûnerekî bilind ê vegote kirina nav romana Kurdî. Hin buyerên din ên cuda cuda li hin bajar û welatên cuda cuda pêktên dibin pêkhate û bingehê vê romanê û emê piştre hewl bidin bi piştîwaniya rêbaza rexneya dîrokî ve, bi giştî buyeran bixin ber nirxandin û rawekirinê.

## 3.2. BINGEHÊ REXNEYA DÎROKÎ DI ROMANA ‘XEWNA ZELAMÊN ÎRANÎ’YAMARDÎN ÎBRAHÎM

### 3.2.1. SERDEM

Aşkeraye xala herî serekî ya destxistina zanyariyên zanistî di her aliyekî wêjeyî û babeta romanê de, pêwîste serdema nivîsandina romanê û herwaha li gel serdem û jiyana karakterê serekî yê romanê em li berçav bigrin, Bi taybet eger em dixwazin li ser romana dîrokî, yan jî her babetekî li roman û peyvendiya xwe bi dîrokê ve hebe, Ji ber ku mijarên heyî bi awayekî bi hevdû ve girêdayî ne û berdewam karekî zanistî nabe, Eger yek ji wan her dû mijaran bê jibîrkirin, ne kû ew tenê lêkolîner û xwandevan jî dikşîne nav xwe de û bi xwe ve girêdide, serdem ango dem berdewam rolên wan her di destpêka xwendina romanê de derdikeve, Ji ber ku *((Dem rêgeza serekiye li gel rêgezên karê hûnerî bo tevgerîn û geşekirin û temam buna bingehê hûnerî yê romanê.))*[93] dema roman nivîs dest bi bingeh danîna buyerekî dike, tişta herî serekî ku pêwîstiya xwe pê heye dem e, Ji ber ku pêwîstî bi demekî ye ku bikarê buyeran dest nîşan bike û ji vê derê bikare helbijêre û kesayetan dest nîşan bike û ji bo wan hemiyan pêwîstî bi demê ango serdemê heye, Ji vê derê ve em balbikşînin ser romanê emê bibînin li romana ‘’Xevna zilamên Îranê’’ de dû serdemên wek mijarên baldikşînin mirov pê agahdar dibe, ku yek ji wan serdema ‘’Ehmedê Xanê’’ helbestvanê sedsala 17.mîn û qala serdema împaratoriya Osmaniyan dike, ya dûyem jî qala serdema şerê di navber Iraq û Îranê û buyerên raperîn û piştî raperînê dike, Diyare em dikarin bibêjin ew romane qala çend serdemên dîrokî yên temam cuda ye, Çend serdemên ku rewş û buyerên bi temamî bi pêşkêşiyên cuda, ku dijî yek vegote

[93] *tekniki geranewe le romanekani (Abdulla sara) da, Rêzan Rehman Xidir, wesanxaneya rojhelat, hewler, 2012,R193*

dike. Di hin serdeman de bîr û nêrînên nasyonalîzmê û meseleya Kurdînî yê de ber bi asta herî jorîn pêngavan davêje, ew jî bi taybet ji serdemên dewleta Osmaniyan heta serdema raperînê ye û li gor dîroka serdema siyasî di wan 4 sedsalên derbasbuyî de, bi dehan qonaxên siyasî tên û diçin û di nav vê romanê de serdema herî giring amadebuna ji pêkhateya li serdema Ehmedê Xanê ku di sedsala 17.mîn de, Ew jî bi dîtina ku Ehmedê Xanê yekemîn rêberê helbesta nasyonalîzma Kurd tê pênase kirin, Di destpêka sedsala 16.mîn ve Kurd û welatê Kurdan tê dabeşkirin di navbera dû Împaratoriyetên rojhilat ên Osmanî û Safevî de, Piştî şerê Çaldiran (1514) û peymanameya Zehav ”Qesra Şirîn” (1639) derbekî giran li yekitî û yekparetiya Kurd û Kurdistanê ket,[94]Piştî wan hemû buyerane di encamê de Kurd ji aliyê siyasî, aborî, civakî û çandî ve li ser her dû dewletên Osmanî û Safevî de hate dabeş kirin, Têgeheştin li dîroka wê serdeman têgeheştine li buyerên nava vê romanê de.

Herwaha di dawiya salên 60 an heta serdema şerê Iraq û Îranê serdemekî din ê di nava romanê de ye, ku ew jî dabeş dibin wek du qonaxan, Qonaxa salen (1970-1975) qonaxa (1975-1991) helbestvanên herî şoreşger ên vê serdemê jî ((*Hisên Arif, Şêrko Bêkes, Letîf Helmet, Refîq Sabîr û Hemeferîq Hesen*)) pêkhatiye.[95] Qonaxa dawiyê ya wê serdemê jî, ji qonaxên salên (1991-2003) pêk tê, Herwaha salên piştî piroseya azadiya Iraqê, ku bi serdema geheştîbuna hestên welatparêzî û paşde kêşana nêrîna nasyonalîzmê û bicîh hiştina welat tê pênase kirin û bi taybet jî ji aliyê ciwanan ve. Ev a rastûrast rengdaneye ke di nav wêjeya Kurdî ya wê qonaxê de, ev roman jî yek ji wan berhemên wêjeyî ye, ku wan buyerên dîrokî di nav xwe de dike mijar, Bi vî awayî serdem di vê rêbazê de cur û awayê bîr û hizirandina benî Adem e, ku ji serdemekî bo serdemekî din gohertin tê de tê jiyan kirin, Di nav romani de u ji sedsala 17.mînde nêrîn û hizra nasyonalîzma Tirkî bi vê arasteyê kar dikir, ku her çend berhemên fikrî yên miletê Kurdî heye, bi rêya bêdengkirin û ji kar xistina fikir û hizir de hewldana lawaz kirina miletê Kurd hatiye dayîn, Ew şerê hizrî û nasyonalîzmê di vê romanê de bi piştîwaniya xeyal û fantaziyên nivîskar ve buyera serekiye, ku Şerê sar ê dewleta Osmaniyan a li dijî Kurdan, bi rêya grubekî bi navê gruba “*xencerên nîvêşevê*” ve, ku hewldana têkbirin û şevitandina berhemên hizrî

---

[94]*Nasyonalîzm û Nasyonalîzmî Kurdî,* Dr. Cefer Elî, Nawendî Roşinbîrî û Hûnerî Endêşe, çi duwem, 2013, R. 129
[95]*Karîgerî Bizûtnewe Roşinbîrî û edebîye Kurdîyekan le ser Komelgay Başurî Kurdistan,* Ehmed Mîre, Çapxaney Renc –Silêmanî, 2012, R. 126

yên miletên din dida li herêmê. ((*Kurê min Ehmed hişyar be! Desteya ''xencerên nîveşevê'' xwandevan û fêlbaz in. heta destnivîsekê ne xwînin û bi temamî helsengandinê li ser nekin û tênegehin na şevitînin*.))[96]Diyare wê serdemê awayê fikirandina miletê Tirk bi vî awayî buye. Ew jî nayê wateya ku li serdema naha de Tirk dijî Kurd nebin, Ji ber ku naha rewş heta astekî hatiye gohertin Li gor nêrîna beşek ji çavdêrên siyasî yên Kurd, heta astekê dikare qala niyeta baş a Tirk an bê kêrin, ji ber ku çareser kirina doza Kurd li bakûrê Kurdistanê de hin gavên tên avêtin vê nîşandidin, Lê li gor hindek siyasetmedarên din jî rewş her wek berê birêve diçe û netewa Tirk berdewam wek dijmin û neyarê netewa Kurd dikare bê pênase kirin. Wê demê vegoteya me ya serdema çîrokên fermanê yên Osmaniyan û serhildanên şoreşgerî yên li du yek, rastiyekê aşkera dikin ku, Tirk berdewam di hewldana tepisandin û têkbirina Kurdan da bune, Her di wê demê de her dû dewletên desthilatdar ên Osmanî û Safevî di milmilaneyekî bihêz de bune, Bi vegoteya jîngeya serdemê Osmaniyan û Safeviyan balkêşana ser milmilaneya bi xwîn a di navbera wan de tê kirin û ji ber vê jî eger kesek di bin desthilatiya Osmaniyan de tewanbar be, ji bo xwe ji destê yasayên Osmaniyan xilas bike, berê xwe dida dewleta Safeviyan û berevajî wê yekê li dewleta Safeviyan berê xwe dida Osmaniyan, Sedemê serekî yê wan milmilaneyane çavkaniya xwe li şerê Çaldiranê ve digre, ku çend sedsala ev yek berdewam kiribu, li sala 1514 ê bi şikesta şah Îsmaîlê Safevî û serkeftina Sultan Selîmê Osmaniyan ve temam bu, di encama vî şerî de beşa herî zêde ya Kurdistanê û Iraqa Erebî kete bin desthilatiya Osmaniyan ve, lê ev serkeftina Osmaniyan nekarî desthilatiya Safeviyan bi dawî bike, Ji ber ku bu destpêka milmilaneya bixwîn di navbera wan her dû hêzan de û çend sedsalan berdewam kir.[97]

roman nivîs bi sûd vergirtina li dîroka vê jîngeyê, buyera reva Şevket a bo dewleta Safeviyan dikin bingeh, Buyerê jî bi vî awayî rave dike, ku piştî baskek ji grubên xenceriyên nîvêşevê li herêma Cizîr û Botanê serpereştî kirin dikeve dest zilamekî ku xelkê Meletiyê ye û navê wî jî Şevket e, piştre destnivîsa Mem û Zîn a Ehmedê Xanê ji aliyê Şevket ve dest li serda tê girtin, lê di bingeh de Şevket zilamekî pir tûnd nebû, Ji ber şikestekî evîndarî ya bê encam, şerekî bê hempa di dilê

---

[96] *Xewna zilamên Îranî û kewtinî bore qela le hîkayetêkî konda,* mardîn Îbrahîm, Nawendî roşinbîrî û hunerî Endêşe, çapî duwem, 2013, R. 22
[97] *Bedem rêgawe gulçinîn,* Newşîrwan Mistefa Emîn, kitêbî yekem, Aldar El Erebiye ll İlum Naşrun – Beyrut Libnan, 2012, R. 47

wî de avabibû. Dema ku şevket Mem û Zîn xwand rastûrast evîndariya wî ya bê encam ket bîra wî û ji ber ev destine diziye, hest bê aramî û poşmaniyekî mezin dike, Lê ew poşmanî tu sûdekî xwe tuneye ji ber ku desthilatdarên Stenbolê agahiya destxistina wê destnivîsê geheştibu ber destê wan, ji ber vê jî Şevket ji birayên xwe re radigehîne, ew ne amadeye vê destnivîsê radestî desthilatdarên Stenbolê re bike. ((*Êvarekiyekê Şevket bi awayekî berçav û aşkera nexşe û nêrînên xwe ji bo birayên xwe aşkera dike û ji wan re radigehîne ku, ew naxwaze destnivîsê bide Qara Mistefa, ji ber vê jî birayên xwe dikare razî bike ku, destnivîsê bibin û hemû li gel yek ber bi navçeyên bin desthilatiya Împaratoriya Safevî ve birevin*.)).[98]

serdema şerê di navbera Iraq û Îranê de jî beşek din ê romanê pêk tine. Mardîn qala awayê hizir û fikirandina rejîma Baas a wê serdemê dike, Dîtina zilamên Îranî di vê demê de li ser erdê Iraqê rê ji wan re nayê dayîn, ji ber ku Baasiyan bi sedem an bê sedem zilamên Îranî dikuşt, Sedemên kuştina sê zilamên Îranê tenê ji ber ku ew sê zilame ne wekî Fars li dayîk bune, Piştî ku hatin girtin li qelaya Hewlêrê serê wan tê jêkirin, Ew sê zilame xewn li ser **Las** û destnivîsa Mem û Zînê dibînin. Ji ber vê di serdema şerê Iraq û Îranê de, bi armanca rizgarkirina **Las** berê xwe didin qela Hewlêrê, ((*Wê demê tu Îraniyek me nedikarî bigrin, serê yek ji nişteciyê Iraqiyekê me jê dikir. Ji ber vê dema agahiya hebûna sê zilamên Îranî ket destê me, li wan bixwe jî me bawer ne dikir. Bi awayekî lezgîn desteya me bilind em civiyan û bi suwarî em serkevtin û çûne qela Hewlêrê...Her wê şevê biraderên me zilamên Îranî serjêkiribun û serê wan jî xistibun nav telîsekî de*.))[99]

wek berî naha jî me amaje pê kiribu şerê heşt salan ê di navbera her dû welatan de wek mijarekî serekî û bi awayekî berfireh romanê dagir dike, Di vî alîde roman nivîs bi awayekî berfireh sûd ji wan buyerên dîrokî verdigre ((*Axir ey hawar! tu rojane termê wan leşkerên me bixwe nabînî, di şerê dijî welatê dû rûbaran ve tênê anîn bo nav Meşedê? Wek kêrûşka diçiye berdestên wan.Tehmasip***,** *çima ma tu nizanî em di şer de ne li dijî wan?...Ew roja Tehmasip xatira xwe ji bavê xwe dixwaze, hêsirê di çavên bavê xwe de dibîne, ku li ser rihên wî yên spî de tên xarê.*

---

[98] *Xewnî Piyawe Êraniyekan..... R 34*
[99] *Çavkanıye berî R163_165*

*Bavê wî pir bi germî û ji dil kurê xwe himbêz dike, ku wekî gumanekî wî hebe carekedin ji dîtina wî*)).[100]

dîroka şerê Iraqê û Îranê ku “36” sal berî naha pêkhatiye vedigêre û yek ji şerên herî bixwîn ê di herêmê de hatiye jiyankirin tê zanînê, Di vî şerî de nêzîkî dû milyon mirov hatin kuştin û birîndar û zerer dîtin, Ev şer di 22yê îlona 1980 ê yê de destpê kir, Piştî ku Iraqê “637” caran sînorê Îranê bezand û di demekî kurt de çend kilometer pêşde çu û kete nav axa Îranê û gelek cîhên cografîk ango erdnîgarî û çend bajêr dagir kir, Ev şer di demekî de bu ku hikûmeta Riza Şah nû li Îranê hilweşiya bu, hikûmeta nû ya Îslamî jî taze hatibû ser kar, Erdnîgariya Kurdistanê û gelê wê bun xelkê herî ku zerer ji vî şerî dîtin, ji ber ku beşek piraniya şer li herêma Kurdistanê û li başûr û rojhilatê wê pêkhat, Di vî şerî de xelkekî zêde bun qurbaniyên bikaranîna çekên kîmyayî û gelek buyerên mezin ên tevkujiyê li ser Kurdan hate pêkanîn, Ji aliyekî kîmyabarana bajarê Helepçe bu, ku bi hezaran mirovên bê tewan bun qurban, herwaha bi giştî gelek ciwan û lavên Kurd di vê navendê de bun qurbanî û ev şerê bêxêr 8 salan berdewam kir, Herî dawiyê bi biryara hejmara “598” a Encûmena Asayîşa Netewên Yekbûyî ve 20.08.1988 ev şere bi dawî bu,[101]bo zêde têgahishtindi vê romanê Roman nivîs bi lêzanî û bi awayekî jêhatî, daxwaz li xwandevanên romana xwe dike vegerine salen heştêyan, piştî ku Xanî yê bavê Las û Milyas li Londonê çû ser dilovaniya xwe, bi rêya vasiyetnameya xwe ve çend tiştên weşartî bo kurên xwe bi cîh dihêle ((*Tikaye Milyas ez daxwaz li te dikim, te jî eger Las dît û bi nave min daxwazê lê bike, ku eger armanca we ev e hûn dixwazin fêmbikin ka ez çima razîbum Las bibexşime jinekî cîrana me? Herwaha çima rastiya windabuna hevseramin û gelek rastiyên din min ji Las veşartiye?Çima buyer di arasteyekî waha aloz de bi rê ket?Çima ez reviyam û min xwe windakir? Ji bo wan hemû pirsane, tîkaye hewlbidin li salên heştê yên “80” Iraqê têbigehin. Ji ber ku eger hun wan salane tênegehin, hûn tu demekî li min fêmbikin û min bibûrînin*)).[102]

Di hin serdemê de li Kurdistanê rewş wa dibe ku herkesekî pirsgirêkên xwe hebe û berê xwe bide çiya, Êdî pirsgirêkên wan çi civakîbin yan bîr û ramanî bin, gelek car takekesê Kurd, ji ber pirsgirêkên xwe yên civakî reviyane bo çiyayan Ne ji

[100] *Çavkanıye berî , R. 137*
[101] *Karîgerî Bizûtnewe Roşinbîrî û edebîye Kurdîyekan leser komelgay başurî Kurdistan,* Ehmed Mîre, Çapxaney Renc –Silêmanî,2012, R161
[102] *Xewnî Piyawe Êraniyekan..... R141*

ber dijî zordariyê ye û ji bo serxwebûne xebat bike, Lê revîna Xanî ji ber pirsgirêkên bîr û ramanî ye û ji ber vê dibe, roman nivîs û waha behsa reva Xanî dike ((*Ji ber ku tu rêyek li pêş wî namîne, dervî bajêr bihêle û berê xwe bide çiya*)).[103]

Piştî şerê Iraqê û Îranê raperîn dû de hat û serdemekî cuda li Kurdistanê ava dibe, rewendê Kurdî bi awayekî diyar ji televîzyonan li vê rewşê temaşe dikirin û bi awayekî behsa wê rewşê dikin, Xanî li bajarê Londonê bi wî awayî bîr û pêşbînî li avabuna raperînê û serdemekî nû dike ((‘*Hîrbertê Ezîz’ tu tiştek nemaye vêran nebe, li wê derê her tiştek vêrane ye, herkesek berî ku dayîk bibe mirî ye, ew der goristanekî mezin e. Lê dibe di nav dûkel û mija vî şer û cengê de derfetek ji bo miriyan ava bibe û mirî zindî bibin)*).[104]

Piştî raperînê diyardeyek ava dibe ew jî hiştina welate ji aliyê ciwanan ve, Bê hêvîbun bu li ax û niştiman, nemana baweriyê û ev bêbaweriya li Herêma Kurdistanê rewşekî li gor xwe ava kiribu, ku Rê û karek bu bi armane hebune jiyanekî şayêstetir. Herwekî ku me diyar kir, **serdem** di vê rêbazê de awayê hizir û fikirandina mirov bixwe ye, ku ji serdemekê bo serdemekî din gohertin tê de ava dibe, Yan jî armanc bi dest xistina zanyariyên wê serdemê ye ku roman tê de dayîk buye, Diyare serdema nivîsîn û belavkirina vê romanê vedigere bo sala 2012, yan jî bo piştî piroseya azadiya Iraqê, Ji vî alî ve dikare bê gotin ev romane li jîngeya piştî serdema raperînê li dayîk buye, Raperîna mezin a sala 1991 ê li Kurdistana başûr wek şoreşa herî giring di dîroka siyasî ya hevçerxa Kurdî de tê hisab kirin li dijî desthilat û dagirkeran, ku di pîvanekê kêm û bi awayekî ne rastûrast di nav vê romanê de amaje pê tê kirin, Piştî bi dawîkirina rejîma Baas, desthilatekî Kurdî ya navmalî erkê birêvebirina welat dikeve ser milê wî, Piştî raperîna civaka Kurd ji ber berjewendiyên partiyan karesatên herî mezin li gel xwe anî û ew jî karesata şerê navxweyî bu, Di encama vê rewşa siyasî ya ne seqamgîr de, civak ket nav rewşekî xirap a siyasî, civakî û heta erdnîgarî jî. ((*Sedema serî rakirina şerê navxweyî, piştî raperînê (01.05.1995) vedigere bo hizir û eqlê desthilatdariya partiyan û qebûlnekirina cudayiyan di nav partiyên siyasî yên Kurdistanê ye*))[105]Di vî alî de, li dû yek ev şerê ku ne dihate xwestin, diyardeyekî metirsîder di nav civaka Kurdî de

---

[103] *Çavkanıye berî , R. 75*

[104] *Çavkanıye berî , R. 112*

[105] *Karîgerî Bizûtnewe Roşinbîrî û edebîye Kurdîyekan leser komelgay başurî Kurdistan,* Ehmed Mîre, Çapxaney Renc –Silêmanî, 2012- R204

serî rakir. Ew diyardeye jî welat hiştin û koç kirina ciwanan a dervey welat û bê hêvîbuna li niştiman e. rengdaneya vê diyardeyê di nav vê romanê de, piştî koç kirina Las a dervey welat derdikevê. ((*Wî digot axir Ofîlya û Milyas in azîzên min. Hun bînin ber çavê xwe, em li ser erdê xwe reviyan, dinyayek xwîn ji ber rizgarbunê de hatibu rêjandin. Me deryayek xwîn ji bo wê ne rijand ku tifkene niştiman û di nav park û rawestgehên qîtarên welatên dur de, wek civakekî nefret lê tê kirin bêne rakêşandin.*))[106]Tişta ku cîhê amajeye roman nivîs, bi tu awayekî amaje bi salên wê serdemê nake ku Las' tê de koç kiriye.Ev tişta divê li bîrame neçe Xaniyê ku bavê Las e, her di serdema şer û cenga Iraq û Îranê de berê xwe dide Brîtanya. Heger waye diyardeya koç kirinê ya dervey welat li Kurdistana başûr vedigere bo gelek serdem û qonaxên cuda, lê bi sûd vergirtina li buyerên nav romanê û yek nasîna '*Las û Îlya*' li bajarê Vanesayê, em piştrast dibin ku bibêjin roman nivîs behsa serdema şerê navxwe ya başûrê Kurdistanê dike, Wekî dîroka Bosna û Hersek bi heman awayî şerê navxweyî yê di navbera Sirbî û Bosnayîyan ve girê dide ((*Baş tê digehim çima Las û Îlya berbi hew ve çun, ew tenê rêkevtekinek nebu, ji ber ku li dû cîhên cuda û tiştên dîrokê yên wekhev û ezmûnên ku jiyan kiribun ew anîbun gel yek.*))[107] Diyare armanc ji dîroka hevbeş a di navbera wan dû welatan de jî dîroka şerê navxweyî ye. Ji bo em zêdetir têbigehin ji buyerên nav vê romanê, di rûpelên pêş de bêhtir emê qala dîroka serhildan sedem û encamên şerê navxweyî yê Bosna û Hersekê bikin.

Serdemekî din ku bêhtir piştrastbunê li cem ma avadike, armanca roman nivîs di wê serdemê de qonaxa navbera salên raperîn û piroseya azadiya Iraq û bi awayekî diyar serdema şerê navxweyî ye û ew jî têr û tejî ramane li buyera kuştina Denkehenar a dîlbera Las e. "Denkehenar" ((*Dema ji bo hefteya pêş Denkehenar û Las biryar didin ku yek bibînin. Denkehenar amade nabe, lê Las tu agahiyekî xwe jê tuneye.Tenê yek şev piştî li gelDenkehenar yek dîtin, pismanên Denkehenarê wê di xewê de dikujin.*))[108] Bê agahdariya Las ji kuştina destgirtiya xwe, amaje bi tunebuna teknolojî ya wê serdemê ye, berevajî vê yekê piştî salên (2003) amûrên peyvendîkirinê, guhastin û torên civakî heta astekî pêşketinek avakiriye, ku eger li dawiya cîhanê jî buyerekî heman awayî pêk bê, li her cîhekî herkesek bi asanî dikare jê agahdar bibe.

---

[106]Xewnî Piyawe Êranyekan..... R 149
[107] Çavkanıye berî , R150
[108]*Çavkanıye berî , R. 107*

Serdema kuştinên Bosna û Hersekê, beşek din ê cîh û buyerên di nav romanê de ye.Roman nivîs li ser bingehê vê buyerê dikeve xeletiyekî mezin, bi vî alî ve xwendekarên romanê hestên ne ronî buyî ji aliyê nasname û erdnîgarî ve agahdar dibin. Îşmaîlov li cîhekî dibêje(( *Ew Bosnayiyekî resen bu*))[109] Li cîhekî din heman buyer wê demê (gruba xwediyê tifengên reş) Îlya û Îşmaîlov digrin û waha qala xwe dikin ((*Birêz em tenê dû mamostayên bê gunehin. Ne karême bi Sirbiyan heye ne jî bi Albaniyan ango Arnavut an*))[110] vegotekirina me ya dîrokê û jîngeya wê serdemê ve, em têdigehin ku ew şerê bixwîn di navbera Sirbî û Bosnayiyan de pêkhatiye, lê ne di navbera Sirbî û Arnavût an de pêkhatiye, Ji bo têgeheştina zêdetir em vedigerin bo dîroka wê serdemê. Di vê mijarê de Wikipedia ya Farisî bi vî awayî wan buyerên dîrokî vedigêre:

welatê Bosna û Hersek, li sê netewên Bosnayî, Sirbî û Xirvatî pêkhatiye, Di 6ê Nîsana 1992 yê serxwebûna xwe ji Yogoslavyayê ragehand, Lê xweşî û şadiyên vê serxwebûnê ji saetekî zêdetir nebu û Sirbiyan ev yeka kire derfeta desthilatdariyê, ji ber vê jî bi piştîwaniya darayî û leşkerî ya Sirbîstanê şerekî bixwîn derxistin û mislimanên li wê deverê reşkuj kirin, Ew şerê bixwîn bi peymana aştiyê ya Dîtonê li 2ê mijdara 1995ê de bi dawî bu û li Nîsana 1992 yê heta 1995 ê nêzîk 77000 heta 104000 kes hate kuştin, ku ji wan 1600 kes zarok bun.[111]ji aliyekî din ve ol berdewam bandorekî baş û xirap li ser awayê bîr û fikirandina takekesên civakê vê serdemê hebu ye. Ol û çandên cuda bi xwere xulqandina jîngeyekî cuda jî ava dikin. Wekî ku suneta zilaman di çanda Îslamê de buye çanda civaka Îslamî. Rehendê mirovê mislimane (sunet) li jîngeya welatên cîhanê de, Herwaha buye bingehek di romanê de û çend carek qala şerê navbera ol an hatiye kirin. Bo mînak şer û cenga di navbera welatê Sirbistanê yê dijî Bosnayiyan de ku, gelek kuştî û birîndar çêbune, li gor dîrokê di destpêkê de ew şer, şerekî siyasî ye, piştre jî berbi şerekî tayfeyî û olî ve vedigohere. Jê sûd vergirtina vê buyerê û vegerîna bo dîroka roman nivîs di nav romanê de çend buyerekan dike wêne, Ya herî giring di vê serpêhatiyê de dilgiraniyê ava dike, tişta ku Sirbî li serê Îşmaîlov de tînin bixwe ye ((*Bi awayekî avêtin ser me û me bixwe jî nezanî çawa û bi çi demildestiyekî şelvarên me li piyême daxistin. Li nav rahnên Ofîlya kirin û dîtin hatiye sunet kirin. Hemû wek dîn û haran lê hatin û hawar*

[109] *Çavkanıye berî , R. 87*
[110] *Çavkanıye berî , R. 92*
[111] *http://www.mwfpress.com/vidciqwa5.t1arr2bicct.hotmail*

*dikir in, ''Mihemedîn e, Mihemedî''. Ez têgeheştim ku ewa ne yên li ser ''xwediyê tifengên reş in'' û eger piştrast nebin li kesekê, ku mislimane yan na, wî kesî tezî dikin ku bizanin mislimane yan na…leşkerekî ku didanên wî hemû zer û pîs bibûn, yekser geheşte nava her dû lingên Îşmaîlov ên vekirî û organên wî yên cinsî ji binî ve jê kirin*))[112] Leşkerên Sirbî ji bo ku piştrastbin ku bizanin ew kesên dikujin mislimanin an na, bi vê armancê li nav rahnên Îlya dinêrin piştî ku dibînin hatiye sunet kirin, wê demê biryar didin ku nekujin.((*Malxirap eger ew parçe çermê di nav rahnên te de neba, wê demê emê naha bo bedena te yê mirî bigiryaban.*))[113]

Sala 1951 ê serdemeke dine, ku rewta buyerên di nav romanê de ber bi pêşve diçin û ew jî serdema şahjinbuna Elîzabet' e ku dibe şahjina dûyem ya Brîtanyayê ye((*Bavê min û dayîka Mîlyas derguşa dawiyê bun. Sala ku ew li dayîk dibin heman sale li gel Elîzabeta duyem dibe şahjina Brîtanyayê û…şahjin, ji bo nîşandana heybet û şikomendiya xwe xelatê dide wan dayîkên ku di vê serdem û rojê de zarokên wan çêbune. Ji ber vê sedemê dapîramin dervey zarokekî şahane, qederek pare ji bo next jî verdigre.*))[114]Ofîlya û Mîlyas kurxal û keçxalê yek in, dayîka Mîlyar û bavê Ofîlya hevtemen in. sala dayîkbuna wan bi awayekî rastûrast nehatiye destnîşankirin, Ji vê derê roman nivîs ji bo têgeheştina li sala dayîkbuna wan her dû karakteran, dubare xwandevanên romana xwe naçar dike ku vegerine wê dîrokê û serdema ku Elîzabet a duyem têde buye şahjin, Ew jî sala 1951 e, ji ber ku navborî di sala 1926 ê li dayîk buye û di temenê xwe yê 25 salî de buye şahjina duyem a Brîtanyayê.[115]

Xusrewî' karakterekî din ê di nav romanê deye, Li Îranê bi tefsîr kirina xewnan ve binavbang dibe û hêza xwendina pêşeroj û raborîyê jî heye, Heman ew keseye ku xewna sê zilamên Îranî lêkdide û piştre jî dibe rêber û rê nîşandarê Las' ku bikarê destnivîsa Mem û Zînê peydabikê, Di dema wesifkirin û pênasekirina Xusrewî navekî din û kesayetiyekî din ê dîrokî berçav dikeve û ew jî Îbin Sîrîn' e. Roman nivîs peyvendiyekê di navbera Îbin Sîrîn' û Xusrewî' de avadike. Xala hevbeş a di navberê wan de Xusrewî' wekû Îbin sîrîn' xewinzanekî bihêz buye, ((*Herçend Xusrewî bi temamî belgande radigehîne ku ew ji bo lêkdana xewnan pişt bi ayet û hedîsan ve girêdide jî, lê melayên demê helmetekî mezin ê banga navê wî dikin û*

*112 Xewnî Piyawe Îranyekan...... R. 93*
*113 Çavkanıye berî , R. 98*
*114 Çavkanıye berî , R. 103*
*115 Jiyanî şajıne elîzabêst. W. siware ahmed hessen. Çapxaney narîn.Hewlêr. 2009 R.11*

*wekî ku şagirdekî nû yê Îbin Sîrîn ji bo çavlê bê kirin, di demekî kêm de wek pîrhewokekî ku ji wan pirhewokên şeytan jî dirazînin, pênaseya navê wî dikin.*))[116]Dubare ev romane wek her romanekî din ê dîrokî, xwandevanên xwe naçar dike ku lêgerînê li dîrokê bikin, bi armanca aşnabûna li gel wê serdemê û buyerên di wê serdemê de hatine jiyan kirin û bi armanca bêhtir têgeheştina li çunayetiya bingehên buyeran, herwaha têgeheştina li peyvendiyên ku di navbera karakterên asayî û karakterên dîrokî yên di nava romanê de heyî, wan aliyan ve pêwîste em amajeyekî demildest bi jiyana Îbin Sîrîn bikin, Di pirtûka Kamil Altebîr Mihemed Îbin Sîrîn a di derbarê jiyana Sîrîn de dibêje: (*Ebubekir Mihemed Îbin Sîrîn Besrî*) Ji zana û berhevkarên herî bi navûbang ê xewn buye, li bajarê Besrayê niştiсih buye û li sala 110ê malavayî li jiyanê kiriye.[117] Ev hemû serdem, buyer û kesayetên dîrokî yên di nav romanê de cîh digrin bandorekî mezin li ser xwandevanên xwe ava dike, ku xwandevan bi destekî romanê bixwîne, bi destê dî jî rûpelên dîrokê bi qulbîne, Lê divê neyê jibîrkirin ku roman nivîs bi awayekî hûnerî û estetîkî ango xweşikî wan buyer û kesayetên dîrokî di nav romanê de bi cîh dike, ku xwandevan bê vegerandina wê serdemên dîrokî jî dikare xwandina romanê berdewam bike û tam û sûd ji vê xwandinê verbigre.

### 3.2.2. JÎNGE

Sînorê erdnîgarî av û hewa, deşt û bilindahiyên her welatekî xwedî role di şekildan û araste kirina wêjeya wî welatî de, Bi dîtina ku gelek car jînge dibe cîh nas û nasname ji bo her welatekî rengdaneyek di pêşkêş kirina berhemên wêjeyî de ((*Di vêderê de armanc, jînge, bi giştî bandorekî bihêz li ser wan faktorên afirandin û xulqandina nivîsekî wêjeyî heye. Yan jî bi awayekî din eger em pênase bikin, bi giştî ew faktora ne bandor li ser wêjevan dikin ku bikarê berhemê xwe yê wêjeyî bi xulqînê. Ew faktorane jî xweza, şert û mercên civakî, aborî û hwd*))[118]Ji ber vê armancê jî romana ‘’Xewna zilamên Îranî’’ bi awayek tejî behsa çend jîngeyan dike Yek ji wan jîngeyan jî, ku jîngeya bakûrê Kurdistanê ye, Di vê derê de rewta bûyeran

---

[116]*Xewnî Piyawe Îraniyekan...... R134*

[117]*Xewnamey Îbin Sîrîn û Kurdî,* W. Sebrî Çawşîn Xano, Nawendî çap û belawkirdnewey Soran, 2015, R.6

[118]*Edebî Berawirdkarî,* Mihemed Ebdulselam Kefaî, û. Hejar Rehîmî, Dezgay Tiwêjînewe û bilawkirdnewey Mukiryanî,2011, R 43

bêhtir di xizmeta mijara nasyonalîzm ango netewperestiya Kurdî ye û roman nivîs destnivîsa “Mem û Zîn” a Ehmedê Xanê dike nîşan û sembola parastina nasnameya gelê Kurd.

Jîngeya piştre jî tê jîngeya Îranê ye û bi nimûneya bajêrê Meşedê, bi sûd vergirtina wê jîngeyê ve peyvendiyekî bihêz bi navnîşana romanê ve tê avakirin, Ji ber ku bajarê Meşedê cîhê ku ew sê zilamên Îraniye ku xewn li ser rizgarkirina destnivîsa ‘Mem û Zîn’ ê dibînin li ser destê kesê bi navê Las ve.

Jîngeya sêyem jî jîngeya başûrê Kurdistanê ye û bi taybetî cîh dide kelha Hewlêrê, Di wê derê de qala şerê heşt salî yê di navbera Îran û Iraqê û serdema raperînê dike mijara gotinê romanê.

Welatê Brîtanya û bi taybetî jî bajarê Londonê beşekî din ê nav vê romanê pêktîne, Ji ber ku roman nivîs deh sal li vî welatî jiyan kiriye û hin buyeran bi jîngeya vî welatî ve girêdide.

Jîngeya ku pişt re jî tê, jîngeya welatê Bosna û Hersek e, Di vê jîngeyê de jî şerê navbera Sirbiyan û Bosnayiyan dibin buyerên nav romanê, ji wî alî ve dikare bê gotin di vê romanê de gelek jînge li berçav tên girtin, Diyare jîngeya her welatekî hin sîmayên taybet bi çanda wî welatî ve dibexşe. Ji ber vê yekî jî di nav wêjeya Kurdî da (çiya) nîşaneya xebat û berxwedana gelê Kurd e, Kurdistan ji aliyê jîngeyî ve xwezayekî çiyayî ye û xwedî bilindayiyekî asê ye, Di wêjeya Kurdî da wek çandekî li piştî peyva çiya peyvekî din jî di nav xwe de vedişêre, ew jî peyva Pêşmerge ye ((*Dema ku em li çiyayekî asê de digeriyan, çend pêşmergeyek gotûbêj dikirin…piştî ku em geheştin ser bilindayî û lûtkeya çiya jî gotûbêj û danûstandinên pêşmergeyan her berdewam bu*.))[119] Heger waye jîngeya çiyayî bingehîn e ji bo Kurdistanê, Ji ber ku roman nivîs berdewam xwe bi navê Kurdistanê diparêze û tenê wek bingeh amaje pê dike, Ji bo vê jî em dikarin bi vegotekirina wê jîngeyê ve balbikşînin ser cîhê buyeran ku ew der Kurdistan e.

Gulebaran kirin li Iraqê buye çandek Ji ber nebuna eqil û fikara bi awayî yeka tenduristî, demokrasî û dadperwerî, çanda rejîma Baas û hikûmetên li du hev ên Iraqê ev diyarîde buye çandek, Di vî alîde jîngeyekî tejî û dagirtî li şer û pevçûnan ku di romanê de bi awayekî diyar mirov hest pê dike li berçave û ev yek di encama vê

---

[119] *Xewnî Piyawe Îranîyekan, Mardîn Îbrahîm, R144*

çanda Iraqê de pêkhatiye, Herwaha Herêma Kurdistanê jî beşeke li axa Iraqê, Bi vegotekirina bi zimanê Xanî' yê ku bavê Las' e waha li ser vê jîngeya tejî li şer a Iraqê û diyardeya gulebarankirinê dike: ((*Di vê agirbarana wan rojaneda hin leşkeran, bavêmin û çend kesekî din, dema nimêja nîvro berçavê sedan kesî ve gulebaran dikin. Leşkeran dest û çavên bavê min girêdidin û di navenda bajêr de li ber peykerê helbestvanekî rêzdikin û didin ber şeqaman. Kesên ku wê rojê li derdora bavê min û zilamên ku hatibun komkirin, bi zorê naçar hatibun hiştin ku çepikan lê bidin*))[120] Naçar kirina gel ji aliyê çend kesan ve û lêdana çepikan, çandekî heta rojame ya îro jî heye, bingehê xwe jî li jîngeya Iraq û Kurdistanê verdigre û hebuna vê çandê bi awayekî aşkera û li berçav, mirov pê agahdar dibe.

Jîngeyekî din ê di nav romanê de tê vegote kirin, nêzîk çar sedsal berî naha dema ku ola Îslamê bandorekî rastûrast li ser jîngeyê bi giştî ava kiriye, Civaka rojhilatî, li jîngeya serdema berî Ehmedê Xanê de awayê xwendinê, ku pêkdihat ji akademiyên wek zanko, peymange û dibistanan, cîhê xwe ji şane, mizgevt û xaneqayan re hiştibû û ev cîha ne bibûn cîhên xwendin û fikirandina feqeyan. Ji ber ku ((*Ol rêgezekî bingehîne di hebûna civakî ya rojhilatiyan de. Em nikarin qala bingehê civakî, yê tu civakekê bê ku em qala pergala wê ya olî bikin pênase bikin. Ji ber ku ol berdewam hêzekî mezin li ser gohertinên civakî ava dike*.))[121] Diyare bi sûd vergirtina vê dîrokê ve roman nivîs çanda vê jîngeyê tîne berçav ((*Ew yek rê ye xwe kire şaneya feqeyan û li gel feqeyekî ket gotûbêjan. Ew feqe bi xet xweşiya xwe ve hatibu naskirin û Ehmedê Xanê pir jê bawer dikir.*))[122] ev jîngeya Îslamî bandora çandî li ser gelek diyardeyên cuda cuda ava dikir di nav civaka Îslamî de, Herwaha herwisa mirov dikarî bi sanayi ev jînge cuda bikî li jîngeyekî ne Îslamî, Eger waha ye çand û ol faktorên gelek bihêzin li avakirina cudayiyên di navbera welatan û şekil girtina wan de, Bi vê dîtinê ve jîngeya Ewropî jîngeyekî bi awayê ola Mesîhiyê bi hin diyarde û sedemên cudayiya heyî ve dikarî cuda bikî li jîngeya Îslamî, ((*Pênç roj bu termê bavê min li binkeya rêveberiya karûbarê matemî û taziya taxê de bu…Dîsa her bavê Mîlyas pijiyabu ser diyar kirin û amadekirina ew cîhê ku biryar bu bavê min lê defin bikin û serdana Dêra Sant Maria kiribu û li gel Keşeyekî axifti bu, ku di*

[120] *Çavkanıye berî , R131*

[121] *Karîgerî Bizûtnewe Roşinbîrî û edebîye Kurdîyekan leser Komellgay Başurî Kurdistan,* Ehmed Mîre, Çapxaney Renc –Silêmanî,2012, R. l63

[122] Xewnî piyawe Êraniyekan, R. 22

*dema merasîma definkirina bavê min de amade be.*))[123]Di vê derê de baldikşîne ser awayê definkirin û piroseya taziyê ya li Ewropayê, Awayê definkirinê yê cuda û piroseya definkirinê ya di navbera ola mesîhiyet û ola Îslamê diyar dibe, Herwaha rojên bêhwedanê li hemû Ewropayê cudaye li gel rojên bêhwedan ango betlaneya me, Di jîngeya Îslamî de bêhtir ji ber nimêja înê rojên înê dibe betlane, lê li Ewropayê ev rewşa cuda ye. ((*Lê belê piştre tê bîra wî ku Mîlyasrojên şemî û yekşem an, ji serê sibê heta dereng jî, di nav cîhên xwe dernakeve*))[124]Jîngeya Ewropî di hemû aliyan ve jîngeyekî kamil û geheştî nîne. Ji ber ku gelek kêm û kurtasî û diyardeyên ku nayên xwestin têde hene,

Nivîskar bi kuştina bavê Ofîlya ji aliyê dû ciwanên serxweş ve, wek diyardeyekî dixe ber çavên xwandevanên xwe û agahiyan li ser vê jîngeya ku ne li ser hev dide. Ji ber ku her di wê demê de civaka Ewropî bi dest diyardeyên qirêj ên ciwanan ên wekû vexwarina alkol û madeyên hişberiyê dinale, Ev diyardeye ku berdewam buyerên cuda cuda û nayên xwestin li gel xwe tîne, jîrbun û şarezabuna roman nivîs û berdewam kirina salen temenê xwe yê di vê jîngeyê de û dîtina keç û kurên serxweş li kûçe û kolanên Londonê sedemê bingeh danîn û veguhestina buyerekî wî awayiye bo nav romana xwe ((*Lê belê vê êvariyê du serxweşên li hev ketî piştî ku li qumarê çi qas parên wan heye ji dest dan û wîskî û şerab û votkayekî zêde vexwaribûn, bi awayekî mest buyî, xwe berdabune dukana bavê min de*))[125] Li cîhekî din ê romanê de vegoteya buyerên di nav romanê de tê kirin ((*Yek ji tewankaran, wek piştre di berdewamiya dadveriyê de, di lêpirsînê behs kir, şîşeyekî tejî vodkayê bi maseya hesin a dûkanê ve dişkîne û parçeyê şîşeya cam a ku di dest wî de dimîne, bi hemû hêza xwe ya xortekî hevde salî ve, ku serxweşe, li qirka bavê min dide…zilamekî Hîndî li ber xwe de gotibu, ''dîsa ewên serxweş'', lê dilê wî de tu tiştekî xirap tunebu. Ji ber ku di wan rojan de dîtina xort û keçên serxweş li kolanan wekî ku perçemokên şevê di êvarekî havînê derbas dibin, bibu tiştekî pir asayî û kes jî ji ber vê ecêb ne dima*))[126]

Di romanê de li ser buyerekî ku ne bi tenduristiye ya jîngeya bajarê Sareyevo yê tê kirin. Ew buyere li welatên rojavayî de buye diyardeyek, Herçend ew buyerene

---

[123]Çavkanıye berî, R.43
[124] Çavkanıye berî , R.47
[125]Xewnî piyawe Êraniyekan*, R.63*
*[126] Çavkanıye berî  R.57*

li gel me pir kêm û kit û mit pêkbên jî û car car zêde jî bibin, Lê wek li wê deverê buyerekî diyarde nine ((*Min tu demekî nezanî ez kurê kîme, Şevekî direngê şevê, zilamekî ku şepirze diyar dikir, otomobîlekî kevin a Romanî dajot, piştre jî ew zilame li ber Dêra Joseph a piroz ku dikeve aliyê bakûrê bajarê Sareyevo yê otomobîla xwe radiwestîne û zarokekî di nav pêçekê de pêçayî li nav selikekî ku, selikên pîrejinên li gundan hêkê mirîşkan dixin nav fire dide…roja piştre serê sibê zû yek ji jinên rahîbeyên ku, li dêrekî tenişt dêra Joseph bi awayekî komî li gel rahîbeyên din lê dimînin, wek yekem kes dibe wî zarokê di nav pêçekê de dibîne. Zarokê di nav pêçekê de ez im, wê demê temenê min tenê yek şev e û piştre jî dema ez mezin bum, min gelek car bîhîstiye, xwedê girawî piştî wê şeva gotegot belav bune, ez dibe ku zarokê yek ji wan jinên rahîbe bume. Lê ji bo ku dêr îtîbara wê sî nekeve ser û ne hetike vê meselê vedişêrin.*))[127]diyare jîngeya rojavayî de buyer û pirsgirêkên waha pir çêbune û zarok bune qurbanê wê çanda çewt û bi taybet jî pirsgirêkên dêr, keşe û rahîbeyan herî zêde zarok mexdûr kirine, Ew jî beşek in ji avabuna wan diyardeyên ku nayên xwestin û xirap bikaranîna navbangê dêr cîh û pîşeya wan.

jîngeya Kurdistanê, jîngeyekî berdewam zilam têde desthilatin û hemû deman jî mafê jin hatiye xwarin, Bi taybet jî jin mafê xwe tuneye xwedan milk û mîratê ji bavê wê jê re mayî xwedan lê derbikeve ((*Denkehenar pismanê xwe agahdar dike, eger beşê wê yê milk jê re neyê dayîn, li dijî wan doz vedike û pirsgirêkê wê bibe dadgehê*))[128] Diyardeya jin kuştinê, diyardeyekî wek nexwaşiya taunê ye di nav jîngeya Kurdî de belav buye. Dibe ku ev çande bi awayekî din ji çanda Ereban hatibe vergirtin. Bila ji bîra me neçê ku di destpêkê de di nav Ereban de jin bi zindî dixistin bin axê. Diyare di jîngeya wan de jin kuştin wek çandekî hebuye. Her ji ber vê du pismanên Denkehenarê çawa bi bê rehmî wê kiça bê ziman dikûjin.((*Ew berî ku bigehin mala Denkehenarê ji zû ve gule dabûn ber tifengê…Her yek ji wan guleyekê berdidin Denkehenarê*)).[129]

Mardîn ji çand û jîngeya Hewlêrê baş dizane û behs dike ku Li Hewlêr û bi taybet jî li bazara qeyserî yê gelek Tirkmen hebûn ku mijûlî firotina qumaş bun, Bi

---

[127]Xewnî piyawe Êraniyekan*, R.77*
[128]*Çavkanıye berî , R.107*
[129] *Çavkanıye berî , R.109*

sûd vergirtina li dîroka Tirkmenên bajarê Hewlêrê ve dibêje: ((*Mala Denkehenarê nêzîk ew kesê Tirkmen ê dukana wî yaqumaş firotinê li serê kolana taxê bu.)*)[130]

Jîngeya Iraqê bi dirêjî ya dîrokê de jîngeyeke tejî ye li şer û pevçûnan, Di vê jîngeyê de av vexwarin û mirov kuştin tu cudayiyek di navbera wan de tuneye û heta naha jî wa ye, Dema ku Tehmasp' tê Iraqê, Mardîn' bi zimanê bavê wî waha behsa Iraqê dike: ((*Axir ey hawar tu rojane termê wan leşkerên me nabînî, di şerê li dijî du çem û rûbaran têne Meşedê?..wek kêruşk diçe berdestê wan? Tehmasp çima ma tu nizanî em di şer de ne li dijî wan)*)[131]

Di encama wa hemû şerên li dûyekê gelê Kurd li dijî rejîma Baas, kuştin û şehîdbuna zilam û xortên nav kelha Hewlêrê, kelha Erbaîlo tejî dibe li zarokên bê bav û jinên bê zilam ango jinebî yan, Behsa rewşa ne rêkûpêk ya kelhê dike ku, çawa pîsî û hejarî tengaviyê çêdike û piştî geşta Mîlyas bo Erbaîlo Mîlyas waha behs li jîngeya wê kelhê dike bo Ofîlya ((*Behsa sîmayên meynet jê dibêrê yê wan hemû jînebî yên nav kelhê ji bo min kir…Mîlyas hejarê dîtibû. Bi awayê marmolekekî bi dîvarê hewşê yê kelhê ku hatî xwarê ve derkevti bu. Di nav cîhê tejî ji pîsayiya mirovan ê kelhê de serketî bu…Bi sîmayê birsî û mehrûm ê zarokan de, bi ruyekî westyayî û cilê kevin ê jinan de, ew pêkenîna zilaman bi zorê anîbun ser lêvê wî*))[132] çanda ser jê kirinê ew çande ku li welatên Erebî de bi awayekî ronî û aşkera mirov pê dihesê ye, Dikare bê gotin ku bi temamî buye awayê diyardeyekî, Ev çande bi awayekî ne şskira û ji bin ve ketiye nav axa Herêma Kurdistana Iraqê jî, Berevajî vê yekê li rojhilat û bakûrê Kurdistanê diyardeya serjêkirinê hebûna xwe tuneye, Piştî ku sê zilamên Îranî ji aliyê çend cehşekî ve têne girtin, ew zilamê çekdar ê ku cilê Kurdî di berde ye dibêje: ((*Ji bo min diyare pir asantir bu ku ez wana bi zindî radestî saziyên hikûmetê bikem. Lê zilamên rayedarên hikûmetê zêdetir dixwastin serê wan biryayî ji wan re bê birin. Ne ku mirovên zindî*))[133]

Piştî raperînê diyardeyekî din ava dibe, ew jî ji aliyê ciwanan ve hiştina welate, ku Bê hêvîtî ji axê û niştiman, nemana baweriyê û ew rewşa ne li serhev ya herêma Kurdistanê dihate jiyan kirin sedemekî herî giring bu aw jî koc kirin bu ji bo jiyanekî şayestetir. Piştî ku ew jîngeya xirap li saya serê desthilatiya Kurdî ve hate hole,

---

[130] *Çavkanıye berî , R.118*
[131] *Çavkanıye berî , R.137*
[132] Xewnî piyawe Êraniyekan, R.155
[133] Çavkanıye berî , R.75

ciwanan û beşekî din ê hemwelatiyan, ji ber ku dadperwerî tunebû û gendelî û karên ne li rê û herwaha sîtema ji destê vê desthilatdariya navmalî, ku çemek ango rûbarekî xwînê ji bo vê hatibu dayîn, li gor wan kesên ku welat dihiştin û diçûn, biryar dabun ku ew xwîn hemu vala hatibu rêjandin, Ew jîngeya ne li ser hev ya wê serdemê, sedemê herî serekiye ji bo koçkirina hemwelatiyan, roman nivîs jî yek ji wan bu ku di sala 1993 ê welat bi cîh dihêle û koç dike. Ji ber vê hîn baştir dikare behsa bê hêvîbuna ciwanan dikare bike, Behsa hemû wan êş û xerîbiyên di rê de koçberan jiyan kirî û herwaha behsa jîngeya welatên rojava dike, ku koçber rastî çi astengiyekî hatine ((*Ew dema û êvara ku Las digehe Venesiya, destpêkê payîze, ku dibe şev, ew jî wek piraniya kesên din ên penaber û bêmal, li ser çend parçe muqavayekê nêzîk li yek û li gel rawestgeha qîtaran radizê. Las berî ku vegere welatê xwe gelek car behsa wê şevê kiribu ji bo min û Mîlyas. Gelek car dubare ji bo me behs kiribu ka wê şevê çi hestek kur û bê pîvan xerîbî û bê nirxî li xwe de jiyan kiriye. Herwaha gelek dijûn ango xeber ji xwere kirine.Digot axir Ofîlya û Mîlyas ezîzên min, hun bînin berçavê xwe, em ji axa xwe revîn. Xwîn ji bo rizgarbûnê hatibu rijandin. Ma me deryayekî xwîn ji bo wê ne bexşî! ku em tifkene niştimanê xwe û li nav park û rawestgehên qîtarên welatên dur, wek komekî kesên nefret lê tê kirin bêne rakêşandin*.))[134]Diyare takekesên civaka (çîn)î pîşeyekî kevin, ku ji bo demekî cuda û dirêj vedigere di beşekî piraniya civaka mirovahiyê de, Ev rewiş jî peyvendiya xwe bi wê jîngeya bi avê ya çînê ve heye. Wekî ku diyare erdnîgariya vî welatî dikeve ser "*Zeryaya Hadî*" ji wan jî gelek derya û deryayên biçûk ango deryaçe û rûbarên mezin û tê de diherikin, Ji wan jî Deryaya Çîn, deryaçeya Kînxay, rûbarê şîn û rûbarê zer..Hwd.[135]Ew hemû sedemin ji bo avabun û sererastbuna jîngeyekî, bi vî awayî Ji vî alî ve çanda xwarin û pîşeya firotina **robyan** û kêvjalan buye taybetmendiyekî berçav ê gelê Çînê. Roman nivîs bi vî awayî behsa zilamên Çînê dike û dibêje: ((*wî zilamî dikana xwe ava kiribu û beşekî piraniya dîvarên wê bi cam û şûşeyan çêkiribu, ku tê de **robyan**, prawn û kêvjal tê de difirot)*)[136]

Roman nivîs li Londonê ve behsa dilterî û geşbîniya jinekî pîr a Brîtanyayî dike. Bi piştîwaniya jînge û çanda vî welatî ve bi awayekî wêneyekî dikşîne û wekî ku wêneyê piraniya jinên Brîtanyayî bikşîne ((*Ev jine mûyên serê wê tenik ango zirav*

[134]Xewnî piyawe Êraniyekan, l149
[135] xrîte al'alm alşamil syasî
[136] xewnî pyawe êranîyekan, R 63

*bibû ku geheştibu astekî ku çermê serê wî di bin wan tayên serê wê de xuyadikir û dibiriqî. Lêvên wê yên qurmiçî bi sorekî tarî derdiket pêş, di rê de dimeşiya û dixwest wusa nîşan bide ku temenê derbasbuyî nekariye serdemê wê yê ciwaniyê lê bistîne…Mîlyas carekê ji min re behs kir, çawa wê pîrejinê gelek car bi pare û diyariyên giranbaha xortên ciwan razî dikir li gel wê biçin mal û di nav cîhên wê yên razanê de şevê li gel bikin roj*.))[137] Dilterî û bikaranîna amûrên xwe xweşik kirin û ciwan kirinê li gel jinekî pîr û salên wê borî ya Brîtanyayî, yan jî her şevek razan û derbas kirin li gel xortên beredayî diyardeyeke din ê welatên rojavaye, Berevajî bi welatên rojhilat ev diyardeye sedema wan derman û ne tenduristiya peyvendiyên civakiye di welatên rojava de, Di civaka rojhilat de jin herçend zemanê ciwaniya wan bi karên cîhanî û guneh û tewanan jî derbas kiribin, lê her ku temenê wan mezin dibe jiyana xwe ji bo xwedê û îbadeta xwe cuda dikin, Ji hemu guneh û tewanekî xwe durdixin Bi taybet xwe ji dermanên xweşikbunê yên wek sorav û amûrên din durdixin, Herwaha berevajî li Brîtanya yê li Kurdistanê diyare, diyardeya lêçek ango serê xwe girêdidin, Ev girêdayî ye ango pabende bi jîngeya Îslamî ve ku ev diyardeye kiriye çandek ji xwe re.

### 3.2.3. NIJAD

Her netewek xwedan taybetmendî û kesayetiya rasteqîn a girêdayî wî bi xwe heye. Ji wî alî ve nijad ew taybetmendî û pênaseyên wê demê ne ku, nivîskar di encama hin şert û mercên siyasî û civakî yên dîrokî ve wek mîras ji aliyên neteweyekê ve jê re mayî ne, Herwaha cuda ji wan taybetmendiyên li jor hatine destnîşan kirin, nijad pêkhatiye ji hin kesên xwedan hêz û taybetmendiyên bedenî yên wek (rengê çerm, çav û por) ku li gel mirov bixwe li dayîk dibe û vediguhêze bo nivşekî din, ya rast ji nivşekê bo nivşê din ango li derbaskirina du xwe ye, Ev taybetmendiyane rastûrast yan jî ne rastûrast di berhemên wêjeyî de li berçav dikeve, Ji ber ku di dawiyê de roman nivîs ne li dervey wan taybetmendiyên ku netewa wî pê tê naskirinê ye.

---

[137] Çavkanıye berî , l4

Di romana (Xewna zilamên Îranî) de, em dibînin morikên xeman ê di wêjeya Kurdî de diyar e, wek çawa Morikên bi mij û duman di wêjeya Brîtanyayî de diyare, di wêjeya Kurdî de Çare nivîsa karakteran tejiye li trajediyan, Ev taybetmendiya rasterast peyvendiya xwe bi dîroka Kurdan re heye, ku rewşekî bi xem û êş û tejî li karesat buye berhemê civaka Kurdî, her ji ber vê jî karakterê Kurdî berdewam xemgîne, Gelek car bi reşbînî çav li diyardeyên rewşên cuda cuda yên derdora xwe dike, Diyare xwe dana koşeyan a derunî ango psîkolojiya karakterên di nav romana Kurdî bi aşkera mirov pê agahdar dibe, Di vê romanê de Ehmedê Xanê wek karakterekî ji ber tirs û xofa li zilam û grubên metirsîdar ên dewleta Osmanî û ji ber tirsa têkbirin û şewtandina destnivîsa Mem û Zînê bi hesretekî mezin giyana xwe disperse, ((*Ehmedê Xanê piştî ku Şevket û birayên wî mala xwe bi cîh dihêlin û bi dest û lingên hatine girêdayî ve, li tenişt tifikekî agir ê cemidî ve bi cîh dihêlin. Lerizîn û tayekî tund li wan digre û piştî çend mehekî kêm, bi hesret ve giyan disperse*))[138] Berhem anîna kesayeta têkşikestî û tejî xem li xwe girêdayî ya vê rewşa dîrokî, xofeke di dirêjeya çend sedsalan a gelê Kurdî de bi destê welatên xwedan hêzên mezin ên dijminê gelê Kurd, Ev jî rengdaneyekî aşkera û diyare û bandorekî berçav li ser berhemên wêjeyî hiştiye, Las wek karakterekî din ê romanê ye ku rûniştvanê kelha Erbaîloyê ye, bê hêvî bun û reşbînî di nav dilê wî de peyda dibe, Karakterekî berdewam xemên wî berbi lutkeya ango asta herî jor de bê hêvîbunê ve bilind dibe, di encamê de hin pirsgirêk û milmilaneyên ramanî û ramyarî de bavê xwe winda dike, Ev bê hêvîbuna Las û reşbînî, takekesê Kurd aşkera dike, herwaha ev jî ji neçê sedemê xemgînî û reşbîniya Las zêdetir ji ber windakirin û ji dest dana bavê wî ya, ji ber desthiladariya nasyonalîzma Tirkî û revîna wî ya ji dest gruba (Xencerên nîvêşevê) ye. Mînaka xemgînî û reşbînî ya Las bi vî awayî derdikeve pêş çav: (*Rojên zarokatiya min nayên bîra min, lê dizanim zarokekî bextewer nebûm. Ji ber salên giran û zihmet û xirap û rojên tarî yên ciwaniya min, li gel xwe ew wêneyên di zarokatiya min de heyî hemu ji bîramin birin…Lê roj bi roj ez zêdetir pê dihesiyam ku, tu tiştekî min tuneye ku ez pê serbilind bibim. Min ne dikarî bi welatê xwe serbilind bibim, ku di ber welatê xwe de hîn ez 4 mehî bum, min bavê xwe winda kir. Welatekî ku piştî wan hemû tiştan ez ji her tiştî mehrûm kirim. Wek sêviyekî ku hatî avêtin bo ser şeqaman û nefret lê tê kirin. Min çi serbilindiyek bi kelhê kiriba, ku*

---

[138] *xewnî piyawe êraniyekan, R32*

*her bi rastî wek cehenemekî ango dojehekî biçûk bu ji bo min. Ez çîroka xwe bi temamî nizanim. Tenê ew nebê ku dayîka min ji bo min behs kiribu ku, bavê min dema di nav cengaverên dijî hikûmetê de şer û ceng dikir, winda buye û ew jî di derbarê wî de tu tiştekî nizanin.*)[139] Bi vî awayî serkutkirina ango tepeser kirina gelê Kurd ji aliyê welatên cîran ve û di encama xirabiyên şoreşan, ev çend sedsale taybetmendî û xasiyetên nerênî di takekesê Kurd de ava kiriye û bi asanî di nav wêjeya gelê Kurd bi giştî de ev yeka cîh digre.

Ji aliyekî din ve Ofîlya, ku karakterekî serekî û vegerana vê romanê ye, di encama leş xwarî û dagirkeriyên Brîtanya yên li ser piraniya welatên cîhanê, hestê xwe mezin dîtinê di dilê wî de ava dibe, bêguman ev hesta xwe mezin dîtinê jî çavkaniya xwe ji ber ku welatê wan welatekî dagirker û welatê herî bi hêz ê cîhanê ye, ji ber vê yekê dibêje. (*Ez û Mîlyas di salekê de li dayîk bun. Heman ew sala ku Brîtanya û Arjantîn li ser girawekî naverasta zeryaya (okyanus) Atlasê şer dikirin. Çima şer dikirin? Eger li min di pirsî, ez dibêjim netewa me, di serdemekî de wek dagirker û mîrê împaratoriyetan dihate pênase kirin. Împaratoriyekî ku wek dîrokvanên me û pirtûkên dîrokî di dibistanan de dibêjin, bi tu awayekî roj lê ava nedibu. Xwarin di geriyamede nediçû ji ber ka wê gelekî din serî rake yan na! dibe ku gelekî din bibêje na*!))[140] Ofîlya ji ber wan taybetmendî û xasiyetên gelê Brîtanyayê yên demekê, dibe sedemê şer û nakokiyên di navber Brîtanya û Arjantînê vedibêje. Ji ber vê jî Brîtanya nedikarî bawer bi vê bike welatek hebe di vê astê de serî rabike û guh bi xwastekên wan nede û bêje na.

Rengê çermê mirov xasiyetekî din be ku jê re maye û her gel û miletek helgirê awayekî li taybetmendiyen xwe ye, ku gelek car bi asanî ji gel û miletên din dikare bê cudakirin. Ew dema ku Mîlyas diçe kelha Erbaîlo, hin pîremêr, ji ber ser, rû, rengê çav û rengê çermê Mîlyas ve dikarin hest bi vê rastiyê bikin ku Mîlyas xortekî Brîtanyayî ye û biyaniye, Ji ber leşkerkêşiya Brîtanyayiyan axa Kurdistanê parçe parçe kirin û pêkanîna şerê dijî Şêx Mehmûd û birîndarkirina wî, ew pîremêrane sivikayî yê bi Mîlyas dikin û bi awayekî rêgezperestin ango nijad perestî xeberan pê didin. ((*Ev qun sor çi dike li vir. Ewan gotibû çima em vî negên û tola Şêx Mehmûd li*

[139]*Çavkanıye berî , R. 73-74*
[140]Xewnî piyawe Êraniyekan*, R. 53*

*vî Brîtanyayî nekin*))[141] Diyare diyardeya rêgez perestî û kîna gelê Kurd buye çandek, li hember gelên Tirk, Ereb, Fars û hemû ew welatên destê wan hebuye di dabeşkirina axa Kurdistanê de, Wek mînak Kurdên başûr berdewam mijûlî biçûkirin û rêgezperestiyêne li hember netewiyeta Ereb, Ev diyarde ji bo parçeyên din ên Kurdistanê jî dikare bê gotin.

Piştî ku wek me diyar kir, her netewek helgirê kesayetî û taybetmendiyên rasteqîn ên girêdayî bi xwe ve ye, hin xasiyet û çanda ku ji netewiyeta wî wek mîrat jê re maye, roman nivîs mînaka zilamê Hîndî yê Suhratay derdêxe pêş û bi kurtî behsa vê çanda ku ji bo wî maye şirove dike. (( *Cara yekem xortekî ciwan ê Hîndî dibînin û cilekî spî û fire diberde ye û kulavekî mezin ê porteqalî li serê wî ye…jê re dibêjin Gaperest*))[142]Bi heman awayî roman nivîs, bi zanayî wêneyê zilamekî Îranî dikşîne, ew jî piştî ku, pişta xwe girêdan ango pabendbun bi nijad û çanda welata Îranê ve, ku hin xasiyet û çanda zilamên Îranê yen diyar e, Morikekî resen ê Îraniyan pê ve diyare û dibêje: ((*Berê caketê wî reş bu û bi nexşên kevin ên Îranî ve hatibu hunandin û rihên wî jî pir tenik bun*)).[143]

## 3.3. Rehendê Dîrokî Û Bingehê Hunerî Di Romana ''Xewne Zelamên Îranî'' De

### 3.3.1. Rehendê dîrokî û navnîşana romanê

Navnîşan rêgezekî pir giring û bingehe bo her nivîsekî wêjeyî, Bi wateyekî din dikare bê gotin yek ji rêgezê giring û pêkanînerê nivîsa wêjeyî navnîşan e, Giringiya vê jî ew e ku gelek caran xwandevan bi rêya navnîşanê ve biryara hilbijartin û xwandina nivîsekê dide, Ji ber vê jî navnîşan deriyeke beşek ji piraniya wan armancan tê de tê tejîkirin, ku nivîskar di nav nivîsê de li hewldana behskirinê de ye.

Dr. Nasir Yaqub' di derbarê pênasekirina navnişanê de dibêje: Deriyê nivîsan bi mifteya navnîşanê ve tê vekirin û tişta ku di demjimêra yekem de pêşwaziyê li xwandevan dike navnîşan e, Amberto Eko' jî dibêje: Nîvê nivîsê di navnîşanê de ye û mifteya rawekirinê jî nivîse.[144] bi dîtina wan her dû pênaseyên li jor ve navnîşan

[141]*Çavkanıye berî* , *R. 158*
[142]Xewnî piyawe Êraniyekan, *R 65*
[143]*Çavkanıye berî* , *R 133*
[144]*Nawnîşan le çîrokî Kurdîda,* Aram Sedîq, Berêweberayetî Çap û belawkirdnewey Silêmanî, Çapxaney Karo, 2009, R.22

mifetaya vekirina gelek deriyên ku hatine daxistî ye û aliyên veşartî yên di nava nivîsa wêjeyî de ye, Bi vê rêyê ve xwandevan armancê serekî û peyama bingehîn ya di nav nivîsê de pêdigehe, Eger rêgezekî wek navnîşanê erk û giringiyekî xwe yê hinde hebe, gelo di nav nivîsên wêjeyî de bi giştî, di nav romanê de bi taybet erk û giringî û rola navnîşanê çiye? Di demekî ku berevajî bi nivîsa wêjeyî yên din, roman nivîs gelek buyerên hemû awayan dike berhem û gelek babet û mijar dibin sernivîsên serekî û di nav romanê de ji ber hilbijartina navnîşanekî guncaw bo nivîsekî wek romanê karekî hin zêde asan nine, Armanca serekî ya me ew e ku em bibêjin nirxdayîna Mardîn Îbrahîm' ya vê rêgezê, dervey nirxdayîna bi rêgezeke giring ê estetîk ku pêwîste di nav her romanê de hebe, di heman demê de deriyeke bo ku xwandevan ber bi romanê ve bikşîne û di yekem çavlêkirina pirtûkê de girêyekî ango pirsekî li gel xwandevan ava bike, ku naçar bike nivîsê bixwîne û herwaha ji vê derê jî ji bo bêhtir têgeheştin li sedemên hilbijartina destanekî wek Mem û Zînê, ku hemû giranî û kevirên buyerên romanê dixe ser yek û pêwîste bi çend hevokan behs li naveroka vê destanê bê kirin û peyvendiyên vê yên bi navnîşana romanê ve girêbidin.

***şerha xemê dil bkem fesane***
***zînê û memê bikem behane***[145]

Bi balkêşandina wan her du nîve hevokên li jor hatine nivîsandin ve em tê digehin ku Mem û Zîn a Ehmedê Xanê tenê ne destaneke naveroka vê pêkhatiye ji evîndariyê, di heman demê de bi awayekî zanayî Mem û Zînê dike bahane ku li ser çand û arîşe û meseleya dewletbun û pirsa nasyonalîzm û keşmekeşiyên gelê Kurd ên di dirêjahiya dîrokê de ye, li gel welatên mezin û bi taybet jî dewleta Osmanî û Safevî û hikûmetên li du yek yên Iraqê, wê demê ev tê wateya ku ev destnivîse dibe bingehek bo rewşa Kurdan a vê serdemê, ku çava bi dirêjeya dîrokê de karesat jiyan kirine, Lê ew resenî li ber lehiya dîroka desthilatiya Osmanî û Safeviyan nakeve, berdewam bi xwe parastinê ve mijûle, Ji wan aliyan ve Mem û Zîn bi tu awayekî ji '***Romeo û Julyet***' kêmtir nîne, ku bi hezaran lêkolîn li ser hatine kirin û heta naha bi vî awayî kar li ser Mem û Zînê nehatine kirin û giringî jê re nehatiye dayîn, bi mijar

[145]*Emînê Osman, Mem û Zînî Ehmedî Xanî,* Çapa Yekê, Migbe El Cahiv, Bexdad, 1990, R.65

kirina Mem û Zîn bi awayekî diyar di nav vê romanê de mezin tir nîşandana destine ye, hema bi kurtasî vegerandin ango devirkirina îtîbarê ye ji vê destanê re ye, Beşeke din jî rexne girtine li nasyonalîzma Tirk û Împaratoriya Osmaniyan a di herêmê de ye, Sedemê wan rexneyan jî di serdemekî de bi rêya şewitandina destnivîs û berhemên helbestvaniyê re şerekî fikrî li dijî gelê Kurd ragehandiye û hewla têkbirina çanda Kurdan daye, ji ber vê jî roman nivîs vê destnivîsê dike sembol û bi rêya xewna sê zilamên Îranî ve hewla parastina vê destnivîsê dide, ku desthilatdariya Osmaniyan nikaribe destnivîsê bi şewitînê û serkeftinê li hember Osmaniyan bi dest bixe, Ji vê derê em bi awayekî lezgîn baldikşînin ser giştî piroseya karê xwe didin destpê kirin, ew jî pêkhatiye û guncawe bi awayê karkirin û destxistina wan zanyariyên naveroka mijara me re, Di vê wateyê de sedem û faktorên Çîn pêwîste lêkolînvan peyrewiyê lê bike, ku behs bibe zanistî û bêguman hewl û westandinekî zêdetir dixwaze, Ji ber vê jî eger em bixwazin lêkolînekî têr û tejî û baş pêkbînin di derbarê karkirina li ser romanekê, wê demê pêwîste destpêkê ji naveroka romanê ve em destpê bikin, Piştre navnîşan û naverokê li gel yek şirove û xwandinekî bi hurî û helsengandinekî dîrokî di vê derbarê de pêkbînin û bi hevdû ve girêbidin, Em vê bibêjin temamê romanê û ji aliyê naverokê ve sûd ji dîrokê hatiye vergirtin, Ne tenê ew jî heman demê de dariştina navnîşana romanê de jî dîrok bi temamî amadeye.

Wekî ku diyare ‘’Xewna zilamên Îranî’’ navnîşana vê romanê ye ku em kar li ser dikin, Tenê giringî dana navnîşanê û bê ku li ser naveroka romanê bê ponijandin, em dikarin bibêjin ev navnîşane, navnîşanekî dîrokî ye û ji vê jî zêdetir morikekî dîrokî ji romanê re hatiye bexşîn û bi yek fikrê buyerên nav romanê li ser hatine avakirin, Derbarê dariştina navnîşanê romanê û armanca parastina destnivîsê de jî, rasterast sûd ji çîrokekî dîrokî yê nav pirtûka “***Incîlê*”** de hatiye vergirtin, Dema ku qala sê zilamên li Îranê dike ev sê zilame yek xewnê dibînin û di xewna xwe de jinekî bi navê ***Meryem Mecdelî***’ daxwaz li wan dike, ku pêwîste di heyama du mehên pêş de biçin bajarekî yê bi navê Erbaîlo (Hewlêr) ya li welatê Mezopotamya (Iraq) yê, Ev jine di xewnê de ji wan re dibêje, dema ku geheştin nav bajar biçin nava kelhê û bi jin û zilamekî re bêjin zarokê wan rojekê ji rojan dê destnivîsek rizgar bike, (*Armanc di vê derê de destnivîsa Mem û Zînê ya EhmedêXanê ye*) Eger hun neçin wî bajarî û vê gotinê ji dayîk û bavê wî zarokî re nekin, wê demê kurên ango neveyên Herodîsê’ ew zarokê tenê ye wê serê wî bibrin,

Di pirtûka "***Incîlê"*** de jî ev buyer waha hatiye gotin: Berî li dayîkbuna Hezretî Îsa, sê zilam li Îranê xewn dibînin, ku Mesîh li dayîk dibe Di xewna xwe de dibînin sitêrkek li ser Orşelîm bilind dibe û xewinzan jî wê buyerê waha tefsîr ango rawe dikin ku Kurek li dayîk dibe û bi taybet paşa Herodîs' jî li dû dikeve ku secde bo vê zarokê bibe, Sê zilamên Îranî jî bi armanca secde kirin bo vê kurê birê dikevin bo navçeya Yahuda yê, ku Îsraîl û Filîstîna naha ye, Dema ku paşa vê nûçeyê dibîhîse, biryar dide ku her zarokekî di wan du salan de li dayîk buyî bê kuştin, Ev çîroka li serê di beşa duyem a pirtûka Incîla pîroz de, ku pêkhatiye ji (23) ayetan û li gor nîvîsîna ''***Metta***'' wek rasterast bi vî awayê li xwarê hatî nivîsandinê ye:

((Piştî li dayîkbuna Îsa li Beytulehîma Yahûdayê di serdema Şah Herodosk[K] de, hindek Moxil[I] ji rojhilat ve hatine Orşelîmê û [2]dipirsîn: ''Ka ew kesê ku nû ji dayîk buye û paşayê cihûyan e? Me ji li rojhilat ve stêrka wî dît, em hatin secde bo wî bibin.) [3]Dema Şah Herodis ev tişta bihîst û rabu serxwe û hemû xelkê Orşelîmê li gel wî rabu [4]hemû kahîna bilind[M] û malmakanî[N] gelê xwe komkirin û ji wan pirskir:(Mesîh li kuderê dayîk dibe) [5]bersiva wî dan: (Li Beytulahîma Yahûd, ji ber ku ev Pêxember[O] wiha nivîsiye:

[6]Lê tû, ey axa Beytulahîmê axa Yahûda
Ne kêmtirî ji fermanên Yahûda
Ji ber ku ji te fermaname derdikeve
Şivantiya gelê Îsraîlê bi min dide kirin. [P])

[7]Herodis jî bi awayekî veşartî mox ango magên xwe bankirin û di derbarî dema derketina stêrkê de lêkolîn li gel kirin. [8]vê care ji bo Beytulehîmê birêkirin û jê re gotin : (Biçin bi hurî li dû wî zarokî de bigerin, dema ku we dît min agahdar bikin, ku ez jî bêm jê re secde bibim. ) [9]Piştî vê fermana paşa ketin rê û çun, stêrk ji rojhilat dîtibun û ketibu pêş wan, heta ser cîhê zarok lê bu, li wê derê rawesta bu. [10]Bi dîtina stêrkê gelekî şad bibûn. [11]Çûn malê, ew zarokê pîroz li gel dayîka wî Meryemê dîtin, xwe xwar kirin û secde bo birin û tûrê xwe vekirin zêr, paxir û muryan[Q] kirin diyarî

---

**K*:***Herodis : Hêrodisê mezin li (37 - 4) pi . Zi paşayê Yahuda bû.
**I*:***Yewnanî : Mexos. Mox ango zilamên olî yên ayîna Zerdeştî bun herwaha stêrknas jî bun.
**M**: kahîn: Zilamekî olî yê Cihûyan bu, ku radibe erkê qurban dayînê di perestgehan de fêrî xelkê dikir.
**N**: Malm : Mamostayê Tevrata Cihuyan ango Yahudiyan bu.
**O*:*** Pêxemberê Mîxa.
**P*:***Mîxa 2:5
**Q*:***Mur : Ji bo term berî bêne defin kirin term amade dikirin. Li Yuhana binêre 39:19

û belav kirin. [12]Vê carê di xewnê de hatin agahdar kirin, ku ne vegerine gel Herodis. Ew jî bi rêyekî din vegeriyan welatê xwe. [13]Dema ku çûn ferîşteyekî xudawend hate xewna Yusif û gotê: (Rabe zarok û dayîka wî rake û bibe Misirê.

Li wê derê be heta ez ji te re dibêjim. Ji ber ku Herodis mijûle û li dû wî zarokî de digere, ku wî bikûje. ) [14]Ew jî radibe bi şev zarok û dayîka wî birin û ber bi Misirê ve çu…. [16]Dema Herodis zanî Moxan ew xapandiye, pir aciz bu. Kes rêkirin û ji du salî biçûktir, ku ji aliyê Moxan ve hatibû lêkolîn kirin, hemû xortên li Beytulehîmê û derdora wê kuştin… [19]Dema Herodis mir, ferîşteyekê xudawend li Misirê hate xewna Yusif û [20]Got: (Rabe, zarok û dayîka wî bibe û here bo erdê Îsraîlê. Ji ber ku ew kesên

ku li dû wî zarokî digeriyan mir in.) [21]Ew jî rabu zarok û dayîka wî bir û vegeriya erdê Îsraîlê.[22]Lê dema ku bihîst Erxîlaus li welatê Yahudayê li cîhê Herodîsê bavê xwe buye fermandar, tirsiya biçe wê derê. Piştre di xewnê de hate agahdar kirin û çû bo navçeya Celîlê. [23]Wê demê çu li bajarekê niştecîh bu ku navê xwe Nasîre bu û heta dema ku pêxemberan jê re gotibu, xwe nîşan bide: (Ji Nasiriye yî re tê gotin).

Bi hûrbuna li her du çîrokan, çîroka nav romanê de û çîroka nav pirtûka Incîlê ya pîroz de, tiştê ku ji bo ron dibe, roman nivîs rasterast buyerekî dîrokî dike amûrê bingehê romana xwe, bi piştîwaniya xeyal û quncikê dîtina xwe yê taybet ve buyerê bi awayekî bi bingeh dike, ku bêhtir li xizmeta piroseya xwe ya vegotekirinê de be, herwaha bi awayekî hûnerî û estetîkî ango xweşikbunê de bilind be û armancên serekî yên nav romana xwe de bi hev du ve girê dide. Ji ber vê jî em dikarin bêjin navnîşanê romanê peyvendiyekî bihêz bi çîrokekî dîrokî yê di nav pirtûka Incîlê de heye, herwaha peyvendiyekî bihêz bi naveroka wan buyer û serpêhatiyan li gel yek tê avakirin, ku di nav romanê de wek buyer derketine pêş.

### 3.3.2. Rehendê dîrokî û cih

Cîh wek rêgezekî giringe di romanê de Rol û giringiya wê ji rêgezên din ên romanê kêmtir nîne Ji ber ku cîh ((*Ew bingehe ku awahî li ser tê bilindkirin e*))[146] Her ji ber giringiya cîh lêkolînvan bi gelek awayên cuda di vê derbarê de du dikevin, Ji ber vê jî ((*cîh awahî û malbenda buyerê ye û nasname bi karakter dide bidestxistin û hest kirine bi armanca jiyanê* )[147] ji ber vê giringiya cîh peyvendiyên navbera buyer û karakter zêdetir li yek nêzîk dike, Ev tê wateya dema ku roman nivîs sûd li cîhekî dîrokî verdigre, naçare buyerekî dîrokî jî bidestbîne û kesayetekî dîrokî jî bike karakterê romanê, Diyare di vê romanê de jî ku bêhtir wek romanekî dîrokî xwe nîşan dide, çend cîh û warên dîrokî jê sûd hatiye girtin, Bi awayekî giştî cîh di vê romanê de ji çend welatekan pêk tê, Di nav wan de çend bajêr ameje pê tê kirin, Li Herêma Kurdistana Iraqê de bêhtir behs behsa kelha Erbaîloyê ye ku armanc di wê derê de bajarê Hewlêrê ye, Sedemê hilbijartin û wekî cîh destnîşankirina bajarê Hewlêrê jî di nav romanê de awe ku bajarê Hewlêrê berevajî bajarêndin ên Kurdistanê û herwaha gelek bajarên din ên cîhanê xwedan dîrokekî kevnare, dîroka kelha Hewlêrê jî vedigere nêzîk (*2000 sal berî zayînê*) Di vê mijarê de Dr. Îdrîs Ebdula' dibêje: ((*Bajarê Hewlêrê wek bajarekî tenêye di cîhanê de ku zêdetirî şeş hezar sale berdewam bi avakirî maye. Her di kevinde wek malbendekî mezin ê cîhê jiyan, şaristaniyet û zanistê navê xwe derxistiye û navdar buye))*[148]

Li welatê Brîtanya de bi heman awayî bi giştî buyer li bajarê Londonê pêktên. Li Îranê jî buyer dikevine bajarê Meşedê, Li Kurdistana bakûr da jî cîh Bazîde, ew cîhên di nav hev de cîhên serekî ne, lê eger em geştekî bo nav romanê bikin wê gelek bajêr û cîhên cuda cuda derdikevin pêş û wek zincîreyekî hatine danîn ku xizmet bu temambuna romanê dikin.

-Mînaka cîh di romanê de:

Cîh di romanê de mizgevtekî kevin ê dîrokî ye, ku ji aliyê Sultan Muradê duyem ê Sultanê Osmaniyan ve hatiye ava kirin *((Ehmedê Xanê wê rojê, bi taybet di*

[146] *geranewe le cirokekani ahmed mihemed ismaeil de,* D. peri salih mifti, wesanxaney haci hasim, hewler, 2012, R. 128

[147] Xewnî piyawe Êraniyekan, *R129*

[148] *le barey rojnamegeri Kurdi yewe,*Îdrîs Ebdula Dezgay twêjînewe û bilawkirdnewey Mukiryanî, 2008, R. 23

*mizgevta Muradiyê de ku hertişt li tenişt mala wan a li bajarê Bazîdê bu.*))[149]Li gor romanê be ew mizgevt li bajarê Bazîdê ye. Lê çavkaniyên dîrokî bi awayekî din behsa cîh û erdnîgariya mizgevta Mûradiyê dikin. Bi vê armancê jî Dr. Elî Mihemed Alêlabî dibêje: ((*Sultan Mûradê duyem li qesra Edîrna li temenê çil û hevt salîda vefat kiriye. Li ser vasiyeta wî nêzîk mizgevta Mûradiyê li Bursa yê hatiye weşartin*)).[150]Di vê derê de roman nivîs bê amaje kirinê bo dîrokê behsa vê mizgevtê dike.

Li gor romanê be Xanî' ji bo parastina destnivîsa xwe du destnivîsên din ji ber vê derdixe û dibe bajarê Riha û Bedlîsê, Gruba Xencerên nîvê şevê li çend cîhekî de hewla dizîna dest nivîs û berhemê wêjeyî daye van cihan jî ev bun (Xorasan, Dîmeşq ango Şam, pirtûkxaneya Walî, mala dervêşekî li Helebê û navçeyên Botan û Hekarî) Diyare sedema helbijartina wan bajara ne jî tenê bo wê ku wan cîh û bajar rehendekî wan yê dîrokî heye, di heman demê de bêhtir xizmet ji bo piroseya vegotekirinê û piroseya vê zincîra buyerên ku yek yek li dû hevdû di romanê de hatine hunandin re xizmet kiriye, Yan jî xizmeta wan karakterên dîrokî kiriye di nav romanekî ku hatî karakterîze kirin, yan jî navên wan derketiye pêş bo mînak: ji ber çavkanî û jêderên dîrokî cîhê jiyan û mirina Îbnûlxelekan' ya li Şamê vedigêrînin, Ji ber vê roman nivîs naçare li gel nav anîna Îbnûlxelekan navê Şamê jî bikar bîne, Diyare Stenbol jî wek navendekî rewşenbîrî yê wê serdemê ya gelek nivîskar û helbestvanan berê xwe dayiyê ye, Ehmedê Xanê jî yek ji wan e (*Ehmedê Xanê her wê demê li Stenbolê dibe Feqe…*).[151]

Ji ber ku Ewropa bi giştî û London bi taybet malbend û cîhê jiyana gelek milet û gelên cuda cuda ye, Ji ber vê jî li hemû cîhanê mirov berê xwe didin wê derê, Îlya' jî yek ji wan ciwanan e ku, piştî reşkuj û kuştin û karesatên Bosna û Hersekê berê xwe dide Londonê û li wê derê behsa buyerên bajarê Serayvo yê dike, Ji ber vê jî em dikarin bibêjin roman nivîs gelek hûner û teknîkên bilind û baş kariye li gelek cîhên cuda de bixe berçavê xwandevanên xwe, Buyera kuştina çar zarokan li gundê Şamalay a ser bi bajarê Sarayvoyê aliyekî din ê nava romanê pêktîne, Bajarê Sarayvo dikeve ser bi welatê Bosna û Hersekê, Wê demê dikarê bê gotin ku di vê romanê de

---

[149]Xewnî pıyawe êranıyekan. R. 22

[150]*Dewleta Osmaniyan ji ber pêşketina têkçûna wê* Dr. Elî Mihemed Alêlabî û Ehmed Ebdulrehman Ehmed û Nîhad Celal Hebîba le Kitêpxaney Narîn, çapî yekem , hewlêr 2007, R. 128

[151]Xewnî pıyawe êranıyekan. R. 28

gelek cîh dikevin berçav, Sedemê ev qas cîhên zêde bikaraniye û li wan derane buyeran vegote dike, hemû rêgezên ku hatine pêkanîn di nav romanê de, wek du aliyê dîwarekê ye û em nikarin ji yek cuda bikin. Cudayiya me jî tenê ji bo kar asan bike, ku sînorê lêkolîna xwe em bizanin, Ji ber vê jî wêjeya Mardîn wêjeyekî mirovî ye, di nav de hest û êş û xem û diyardeyên mirovî hatiye hunandin, Ji bo vê jî roman nivîs di naveroka vê romanê de dervey nêrîn û ramanên li ser netewî û nasyonalîzma Kurd, dixwaze behsa pirsgirêk û êşên mirovan bike Bi giştî, ew mirovane jî li kîjan bajar û welatekê bin pir zêde giring nine, Ji ber ya giring beyan kirina xem û êşên wan mirovaneye, Ev hemu sedemane jî dihêlin ku roman gelek cîhên dûr û cuda li berçav bikevin. Bi vê armancê jî beşeke buyeran xistiye bajarê Sarayvo yê û welatê Bosna û Hersekê.

Bajarê Meşedê cîhê ku di romanê de rûpelên herî zêde jê re hatiye cudakirin e, Herwaha Meşed bajarê ku cîhê parastin û Daldedanê ku di romana Mem û Zîn a Ehmedê Xanê de bi awayekî hûr li ser cîhê wî zilamî dike ye, ku jiyana xwe dike qurban û Las ji serjêkirinê rizgar dike ((*Tehmasp kurê melayekî ye ku yek ji gundên navçeya Sebzewar e…Dema Tehmasp hîn xortekî neh salî, berê xwe didin bajarê Meşedê.*))[152] Diyare sedemê hebûna bajarê Meşedê jî di nav romanê de wek me berî naha jî balkêşande ser rasterast peyvendiya xwe bi nivîs û navnîşana romanê ve heye, ku bi awayekî aşkera sûd ji çîrokekî di nava pirtûka Încîlê ya pîroz hatiye vergirtin, Ew jî xewna sê zilamên Îraniye ku xewn li ser dayîkbuna Hazretî Mesîh dibînin, Herçend di nav Încîlê de rasterast behsa cîh û welatê wan sê zilaman nayê kirin jî, lê baltêkêşandin ku ew sê zilame dibe ku Mox ango Mag bin, Diyare Mox jî bi zimanê Yewnanî tê wateya zilam ango rahîbên ola Zerdeştî ku Armanc rûniştvanên welatê Îranê yê naha ye, Ev sê zilame bi armanca parastin û secdebirinê bo Hezretî Mesîh birêdikevin bo Îsraîlê, Herwaha di nav romanê de jî  sê zilamên Îranî bi armanca parastina destnivîsa Mem û Zînê û herwaha parastina jiyan Las ku hebûna destnivîsê girêdayiye bi jiyana Las ve, berê xwe didine bajarê Hewlêrê, Ji ber vê jî bajarê Hewlêrê li gel bajarê Meşedê li gel yek bi awayekî berfireh cîhekê di nav romanê dagir dikin, Piştî xwendina vasiyeta bavê xwe êdî Mîlyas dikeve dû lêpirsîna birayê xwe Las’ Di encamê de berê xwe dide çend cîh û bajar û welatan, Roman nivîs waha behsa cîh û erdnîgariya Hewlêrê dike(*Biçin bo Kelhekî ku di nav bajarekî mezin de*

[152]Xewnî piyawe Êraniyekan.R.  52

*ye û nêzîk Nînovayê ye*)[153] ev nasandin û pênaseya Mardîn xelete û cîhê gumanê ye, Ji ber ku nêzîk bajarê Nînova bajarê Kerkûkê jî kelheyek wek ê bajarê Hewlêrê heye, Mîlyas’ di gera xwe ya ji bo Hewlêrê de serdana goristanê dike ku li wê derê gora Las ê birayê xwe bibîne, Piştî ku ji Xusrew’ pirs dike berê xwe dide bajarê Meşedê.

Çayxaneya meçko wek cîhekî kevin ê dîrokî li bajarê Hewlêrê di nav romanê de tê behs kirin, Roman nivîs rasterast navê çayxanê nayne, Lê bi piştrastî dema dibêje çayxaneya li bin û damenê kelhê, bala xwandevanan rasterast diçe ser çayxaneya meçko. Dema ku dibêje(*Em çobune wê çayxaneya di binê kelhê de, helbestvan û wêjevan lê di civiyan. Ew der serdemekê penagaha Las bu*)[(2)154]buyer gelek li bajarê Londonê pêktên Herwaha Hindîstanê jî çend buyerek pêk tên û di romanê de derketine pêş.

### 3.3.3. Rehendê dîrokî û karekter

Divê em di destpêkê de vê baş bizanin kesayeta nav romanê nabe ku bi çavê waqiî ango rastî em lê binêrin, Ji ber ku roman nivîs bixwe avadike û di afirîne, Dikare hin caran roman nivîs sûd ji kesayetekî nav cîhana rastiyan ango waqiî jî bigre û bi awayekî hûnerî û xeyal û tevgerînekî dahêneriyê li romanê de bikar bîne, Ji bo vê ((*Bingehê karakter di romanê de asan nîne, jêhatî bun û şarezayî û lêzanîna roman nivîs di bawerî dana xwandevanan de rol dilîze. Wê demê dahênanekî zindî û babetekî hatî xilqandin.Ji ber ku nirx bi mirovê kamil ango geheştî û zindî dide*. ))[155] ji vî alîve karakter bi kesekê yan bi çend kesan re tê gotin ku beşdarin di pêkanîn yan jî encamdayîna buyer û karekê de, Di vê romanê de gelek karakterên serekî û yên li kêlekê hene, Lê ew ê ku bêhtir armanca me ye karakterên dîrokî ne ku di romanê de rol digrin serxwe û rehendekî dîrokî ji romanê re bexşîne. Wek berî naha jî me anî ziman di xizmeta rizgarkirina destnivîsa Mem û Zîn de ye, Wê demê pir tiştekî asayî ye ku navekî dîrokî yê wek Ehmedê Xanê’ bibe karakterê serekî yê romanê, Ew jî dikare bê gotin ji ber du sedemane, ya yekem awe Ehmedê Xanê xwediyê destnivîsa Mem û Zînê ye ku bingehê hûnerî yê romanê xizmet ji parastina vê destnivîsê de ye

[153] Çavkanıye berî . R. 155
[154]. Xewnî piyawe Êraniyekan..*R.158*
[155] *bunyadi corekani rudaw le romani kurdi basuri Kurdistan da , (1985-1990),*Rêzan Osman Mistefa, hewler 2010 R. 43

ku nêzîk sê sedsala berdewam dike, ya duyem jî awe ku her li gel bihîstina navê Ehmedê Xanê bêhtir nêrîn û bala me diçe ser meseleya nasyonalîzma Kurdî, Ji ber ku wekî ku me berî naha jî anî ziman Ehmedê Xanê wek yekemîn rêberê helbesvanê nasyonalîzmê tê pênase kirin, Herwaha dibe ku yekem kes be fikra avakirina welatekî Kurdî pêşxistibe Herwaha nexşe û plan ji bo vê dariştiye. Wê demê sûd vergirtina ji karakterekî wek Ehmedê Xanê misoger dike ku ev romane romanekî dîrokî û siyasî ye ((*Piştî ku Ehmedê Xanê û Şêx Ilyasê bavê wî û feqeyekî xwarina êvari xwarin, Ehmedê Xanê berê xwe da Feqeyî jê re got ku, pirtûkek nivîsiye û dixwaze çend destnivîsan li ber vê derbixe, ku eger yek ji wan têk jî biçe, yek ji wan her bimîne*.))[156]Şêx Ilyas' wek melayekî tê naskirin yê wê demê ye û bavê Ehmedê Xanê' ye, Di romanê de navê wî waha tê behs kirin ((*Şêx Ilyas pirskir: Armanca te hin helbestên bîr û ramana îmanê ye?*))[157]

Sultan Muradê duyem' yek ji wan nava ye ku sîmayekî dîrokî ji romanê re dibexşe, Herwaha kesayetên wêjeyî ji aliyekî din ve dîrokî ne di nav romanê de Wek karakterekî li kêlekê rol ji wan re hatiye dayîn û ne heqî li hember wan hatiye kirin ji aliyê grubên ''Xenceriyên Nîvêşevê'' ve, ku ser bi dewleta Osmaniyan in, ji wan karakteran jî (Îbnûlxelekan, Îbin Sîrîn, Feqyê Teyran û Melayê Cizîrê).

Navê temamî yê Îbnul Erebî' (Şêx Mihyedîn Îbin Erebî) ye, Ji wan kesên yek jê ye ku zana û kesên herî mezin ê di aliyê tesewuf bu ye Di sala (558 kî-1164 zayînî) li welatê Endilûsê li dayîk buye, Di sala (638 ki-1240z)li Şamê ango Dîmeşqê çuye ser dilovaniya xwe,[158] Berî bi dest xistina destnivîsa Mem û Zîn roman nivîs bi sûd vergirtina ji jiyana Îbnûl Erebî' û dem û serdema jiyana wî û cîhê mirin û cîhê li dayîkbuna Îbnul Erebî' behsa kar û çalakiyên grubên Xenceriyên nîvêşevê û şevitandina 19 destnivîsan dike ku dibêje: ((*Herwaha di vê heyamê de 19 destnivîs têkbirine ku bi zimanê Erebî hatibun nivîsandin. Li gel hemû jî pir bi nirxbun, lê di nav wan 19 destnivîsan de du destnivîs hebun ku pir delal û bi nirx bun. Yek ji wan li Şamê li pirtûkxaneya Walî hatibû dizîn, di wê e hin helbest hebûn ku, Îbnul Erebî*

[156]Xewnî piyawe Êraniyekan.R. 22
[157]Çavkanıye berî R. 22
[158]*Eltarîx El Erebî, Elmoruxun El Ereb,* Şakir Mêgfî, Dar El ilim Elimlayîn- Beyrut, g 3, Sine 1987, c1, ê R. 430

*gelek sal berî naha nivîsîbun û bi navê ''Xewkirina Mihemed a di Dêrê de'' bu. Ya din jî li mala dervêşekî li Helebê hatibu revandin û destnivîsa Îbnulxelekan buye*)).[159]

Herwisa navê temamî yê Îbnulxelekan' jî (Ebu Ebas Şemsedîn Ehmedê kurê Mihemedê kurê Îbrahîmê kurê Xelekan)e di sala (608 ki-1212z) li bajarê Hewlêrê li dayîkbuye, Kesekî dîrokvan û kesekî gelek zana buye.[160] wek me balkêşan de ser Îbnulxelekan li bajarê Hewlêrê li dayîk dibe, lê Roman nivîs piroseya revandin û dizîna destnivîsa ve digerîne bajarê Helebê ve neku vedigerîne Hewlêrê, Bingehê vê buyerê û bi nav anîna bajarê Helebê ve dubare û rasterast sûd vergirtine li dîrokê, Ji ber ku Îbnulxelekan' deh salan li Şam û Helebê jiyan kiriye, Piştre demekê tê bajarê Mûsilê û piştî wê jî her li Şamê di sala (681 ki-1282 z)diçe ser dilovaniya xwe û vefat dike.[161]

Nav anîn û bi karakterkirina wan hemu kesayetiyên dîrokî, sedemê vê ew e ku ev romane romanekî dîrokiyê û roman nivîs bi rêya wan hemû kesayetên dîrokî ve hewl daye sîma û awayekî romana dîrokî di vê romanê de ava bike, Roman nivîs nav anîna kesekî din ê dîrokî ve bê ku vegote bike derbarê dîrokê ku bi awayî ye ke şaş u xelet sûd verdigre ji u dibêje: (*Fermandarê artêşa Osmaniyan Qere Mistefayê birayê Mihemedê Eprîlî, yek ji rêveberên herî diyar ên wê demê, yê Xenceriyên nîvêşevê ye*)[162]

Ev nave li pirtûka (Sedemên pêşketin û têkçûna Dewleta Osmaniyan ) de bi vî awayî tê gotin (*Mistefayêkurê Mihemedê Kubrîlî*), her çawa be me pir li ser rol û erkê vê kesayetê ranawestin. Ji ber ku awayê buyerê di nav romanê de bi awayekî diyar û berçav tişta derdikeve pêş fantaziye.[163]Di navbera bavê Mîlyas û qeşe de berdewam bîr û nêrîn serûbin dibin, bi taybet di derbarê kesayetiyên navbang û dîrokî de (( *Min piştî gelek salan şûnde zanî ew helbestvana ne Ferîdedînê Etar û Mevlanayê Rumî û Hafiz û Seidê Şîrazî bun*))[164]***Cengîzxanê***' rêveberê artêşa Mogoliyan navekî dine di romanê de, ku bi destnîşankirinê baltê kêşandinê sûd jê tê girtin, li nav û amûrên

[159] Xewnî pıyawe êranıyakan R. 25
[160]*Alam Morxun*, Receb Mehmud Bexît, Mektebe la Cizîre El urd- Qahire, 1984, R. 240
[161]*Abin Xelekan*: Wifyat El ayan Wabta El İzman, c7, R. 27-33
[162] Xewnî piyawe ÊraniyekanR. 35
[163]*hokari pêşketin û têkçûna dewleta Osmaniyan,* Dr. Elî Mihemed El Êlabî, Û. Ehmed Ebdilrehman Ehmed û Nihad Celal Hebîba le, Kitêbxaneya Narîn, Çapa yekem, Hewlêr 2007. R. 399
[164] Xewnî piyawe Êranıyekan R.45

dîrokî û hebûna wî di romanê de cîh digre û li tenişt navê wî navê ***Hîtler***’ jî li berçav tê girtin. (*Divê Hîtler û* rayxî *sêyem jî bi vê xemê serê xwe daynin, eger bixwazin me wêran bikin…*)[165]Em dibînin roman nivîs navê Hîtler û leqebe ew wek du navên serbixwe û cuda ji yek bikartîne, Di vê mijarê de jî ne ronîbun û alozî avabuye, Gelo rayxî sêyem ango kesayetekî din ê dîrokî ye? Yan misogerkirina navê Hîtler e?ji wan aliyan ve çavkanî û jêderên dîrokî bi du awayên din navê Hîtler bibîrtînin û bune nasnav ji bo wî jî, Ji wan nasnavan (*Fuhrer û **rayxî** sêyem*)[166] nav anîna.

Şah jina Elîzabets a duyem jî wek Şahjina Brîtanya rehendekî dîrokî daye romanê, piştî ku roman nivîs sala li dayîk buna Mîlyas’ û Ofîlya’ girêdide bi Şahjin buyîna Elîzabeta duyem ve, Şahjinê jî dibe kasatiye ke nav romanê ( *Şahjin ji bo heybet û mezinahiya xwe nîşanbide xelatê dide wan hemû dayîkên ku di sala ew buye Şahjin de zarokê wan çêbuye*)[167]wek berî naha jî me destnîşan kir beşekî buyerên nav romanê li sînorê Împaratoriya Safevî û welatê Îranê naha de ye, Ji ber vê jî sedemê ku tê hêvî kirin roman nivîs nave çend kesayetiyên dîrokî û çend rêveberên vî welatî balbikşînê ser û navê wan bîne û wek karakterekê rol ji wan re hatibe dayîn di nav romanê, yan jî navê wan bê anîn di nav romanê de. Ji wan jî (Şah Sultan Husên, Nadir Şah, Kerîm xanê Zend…hwd).

### 3.3.4. Rehendê dîrokî û buyer

Rêgezekî serekî û giring ê romanê ye bi temamî pêkahate ye nav romanê di astoye wî daye ew jî buyer e ku ((*Pêktê ji hin serpêhatiyên ku hatine rêkxistin û bi bandor û herwaha taybetmendî û cudayiya wan bi rêya demê ve bi awayekî ku hatî diyar kirin verdigrin*.))[168]em dikarin bibêjin bê buyer vegote pêknayê an jî çênabe, Her ji ber vê jî ji ber giringiya buyerê em nikarin ne ku dest li bikaranînê dibe ku bi kêmî em temaşe bikin. Ji ber ku((*Buyerên di nav çîrokê de, ferman, yan jî karekî çîrokiye ku tevgera karakter ava dike, bo pêşkêş kirina bi rêya ceribandinekî hatî*

---

[165]Xewnî piyawe Êraniyekan. R. 46

[166] ji bo zanyariyên zêdetir li vê pirtûka binêre: Benawbangitrîn û seyr û semeretrîn dadgayîkirdin le mêjûda, û. Şemal Ehmed, Xaney çap û pexşî nima, 2015, li 35-60

[167]Xewnî pıyawe Êranıyekan. R. *97*

[168]*geranewe le cirokekani ahmed mihemed ismaeil de,* D. peri salih mifti, wesanxaney haci hasim, hewler, 2012, R44

*diyar kirin a mirovahiyê ve*))[169]her wekî ku berî naha jî me balkêşande ser vê romanê, gelek buyerên dîrokî di nav xwede vedigêre, bi aşkerayî behsa du serdemên giring dike, ew jî serdema împaratoriya Osmanî û serdema şerê di navbera Iraq û Îranê û raperîna Herêma Kurdistana Iraqê ye ku di lûtke ango di asta herî bilind a wan serdemane de dikare hin buyerên dîrokî bibin nexşe û sitûna pêkhateya buyerên vê romanê.

Yek ji buyerên dîrokî jî mirina Ehmedê Xanê ye, ku li gor roman nivîs dawiya sala (1705) jiyana xwe ji dest dide, lê li gor belgeyên dîrokî be, Ehmedê Xanê salên dayîkbun û mirina wî (1650-1707 z) tê zanîn.[170]

Buyerekî din di vê romanê de bi awayekî tê behs kirin jî dewleta Safeviya ne ku ((*Şah Sultan Husên li hember Efganiyên Yaxiyê şikest dixwe û çend salek şunde Safevî bi temamî hildiweşin. Piştî ku Nadir Şah desthilatiyê digre destê xwe û hikûmraniya Efşarî avadike û Meşedê dike paytexta fermanên xwe yên rewa*)).[171]Pêkhateya piraniya buyerên di nav vê romanê de têkelin ji rastî û xeyalên nivîskar. Dikare bê gotin dîrok beşa şêr ber dikeve, ji hûnandin û dariştina romanê de behsa Kerîmxanê Zendî dike û dibêje: ((*Dema ku Nadir Şah tê teror kirin û Kerîmxanê Zend, hikûmraniya Zend avadike û paytextê veduguhêze Şîrazê*))[172] Hikûmeta Zend (1753-1794) ev hikûmeta Kurdî li başûrê Îranê di sedsala 18.mîn a zayînî de ava buye, di heman sedsalê de Efganiyan ji rojhilat ve destbi dagirkirina Îranê kirine. Yek ji mercên nivîsandina romanekî dîrokî jî ew e, ku divê roman nivîsê romana dîrokî lê zanînekî baş hebe di derbarê dîroka wan buyerên ku di nav romana xwe de dike buyer, Bo mînak di nav romanê de bi vî awayî behsa hikûmeta Zend hatiye kirin ((*…Kerîmxanê Zend, hikûmraniya Zend avakir û paytext jî veguhezte Şîrazê û piraniya rûniştvanên Meşedê berê xwe didin Şîrazê û bi taybet jî xwandevan û hûnermend*)).[173]Em dibînin ku di pirtûk û çavkaniyên dîrokî jî vê buyer û pênaseya bajarê Şîrazê û hikûmeta Kerîmxan bi heman awayî li ser behs dikin. Li gor Salih Qeftan' di serdema hikûmraniya Kerîmxan de bazirganî û kiştûkalî ango zireet, li Îranê geşe ango pêşketinekî berçav avakiriye di derbarê ewlehî û asayîşê de jî

[169]*dirasat fi neqid el-riwaye,* D. teha wadi, el-hia'e el-misriye el-a'me lilkitab, 1989, R. 310
[170]*Mem û Zîn a Ehmedê Xanê,* Cemîl Êab, Çapxaneya Aras, çapa yekem, Hewlêr 2008 R. 11
[171]Xewnî pıyawe Êranıyekan. R. *33*
[172]*Çavkanıye berî. R. 34*
[173]*Çavkanıye berî. R. 34-35*

pêşketiye, Ji ber ku berê ji ber diz û kesên bertîlxwar nevêraye ji Îranê re derbas bibe, lê di serdema Kerîmxan de hemû bajarên Îranê pêşkeftinek jiyan kirine, lê tu bajarek di pîvanên Şîrazê de pêşkeftin û avadanî jiyan nekiriye. Navborî Şîraz kiriye paytext û li ser bingehê dadperweriyê karûbarên welat birêvebiriye. Kerîmxan bixwe ji ber ku xwandina wî nebuye, ji ber vê jî giringiyekî zêde daye vê mijarê û runiştin û merasîman de berdewam li gel kesên xwandevan û helbestvan pêktînan.[174]

Mardîn buyerekî din ê dîrokî dike nasnameya bajarê Hewlêrê, buyer jî behsa Holako dike. Nivîskar bi vî awayî bajarê Hewlêrê bi me dide naskirin û bi xwe navê wî bibîrtîne û dibêje: ((*Her di zaroktiyê de min bihîstiye, digotin Holako piştî ku sedan gund û bajarên bi hêz û dehan kelheyên ji polayê dixe bin lingê hespê şervan û cengaverên xwe, li pêş, rûniştvanên vê kelheyê de çokan datîne*))[175]li vê derê armanc êrîşa sala 1243 ye ku êrîşa ser kelha bajarê Hewlêrê ye.

Wek me got Şerê sala (1980-1988) yek ji buyerên dîrokî yê di nav romanê de ye ((*Di demekî ku Iraq û Îran nû ketibun nav şerekî bê yeman de li hember hev*))[176] Sala dayîkbuna Mîlyas û Ofîlya ev sale ye ku ((*Brîtanya û Arjantîn li ser grawekî naverasta Zeryaya Atlasê şer dikirin bu*))[177]di heman salê de behsa şahjina nû dike, ew şahjin jî Elîzabeta duyeme ku dibe şahjina Brîtanya, Li gor roman nivîs gulebarankirina çar zarokên gundê Şamala beşekî herî biçûk bu di komkujiya Albanan de (Arnavut), Pir babetî buna nav romanê û geşt kirina di nav çend serdem û buyerên dîrokî yên cuda, roman nivîs naçar dike avurekî li dorçerxana giring û dîrokî ya gelê Kurd biket, Li gor wî buyer ((*Her di şibiya roja zindîbuna miriyan. Xanî ji wê rojê re digot raperîn*))[178] Ev tê wateya ku buyerekî giring a wekî raperînê de jî amadebunekî wî ya temamî heye û gelek buyerên din ên giring kiriye bingeh, yan jî em dikarin bibêjin wan buyerane wek buyerên herî giring ên di nava romanê de derdixe pêş. Ji ber ku rêjeya herî zêde di nav romanê de wan buyeran dagir kiriye. Di mijarên berî naha de jî bi awayekî tejî me behsa raperînê kir. Ji ber vê jî pêwîst nake em carekedin dubare bikin, Ji aliyê din ve buyerekî din ê dîrokî di nav romanê de girêdayî ye bi welatê Brîtanya û şerê cîhanê yê duyem ve ((*Keşe digot dapîra wî di*

---

[174] *Dîroka gelê Kurd û netewa Kurd Turkman nîne.*Salih Qeftan, çapxaneya Çwarçra, çapî çwarem, 2012, R. 214
[175] Xewnî pıyawe Êranıyekan. R. *74*
[176] *Çavkanıye berî. R. 74*
[177] *Çavkanıye berî. R. 53*
[178] *Çavkanıye berî. R. 111*

*rojnivîsa xwe ya biçûk de nivîsiye; ‘’Divê Hîtler û rayexêsêyem jî bi vê xemê ve serî dayne eger bixwazin me wêran bikin. Îro ew bi balefir û topên xwe ve Dêr û pirtûkxaneyan di şewitînin, ez jî di penagaha taxa me de Omer Xeyam dixw*înim.)).[179]Armanc di vê buyera şerê cîhanê duyem a di salên (1939-1945) de û gelek welat beşdarî wî şerî kirin, ji wan welatan jî Almanya ya Nazî û Brîtanya, ku bu sedema têkçûna Almaniyan û têkçûna partiya Naziyan.[180]

Çend buyerên din hene ku bi awayekî ne rasterast sûd li wan hatiye vergirtin, Ev jî tê wateya ku roman nivîs rasterast wan buyerên dîrokî yên di nav romanê de nake buyer, buyerên ku hene jî çar buyerên giringin ku girêdayîne bi pirtûka dîrokî ya hatî şewitandine, Ev çar buyerên dîrokî jî bun sitûn û bingehê herî giring ên di nav romanê de.,Wekî ku xuyadike diyardeya ango hebûna şewitandina pirtûkê beşekî buyerên herî giring ê vê romanê pêk tine û bi awayekî bi giştî serpêhatî ji vê buyerê çavkaniya digrin, Ji ber ku çanda şewitandina pirtûkê beşeke li tirsa ku berdewam sîstem ango pergal û desthilatdar ew peyama wan a ku hebuye, di nav pirtûkê de veşartî bun, Ji ber ku pir caran miletek ango gelek di nava pirtûkekê de jiyana xwe parastiye û piştre jî li ser vê bingehê cîhanek avakiriye, ku mînaka vê jî cihûne ango Yahûdî ne û bi pişta xwe bi Tevrata xwe ya dawiyê ve girêdane û wek gel û welatekê jî teqez kirine û xwe ji belav bunê rizgar kirine, Di vê navbeynê de şewitandina pirtûka dibe dîrokekî wê kevin hebe û cara yekem şewitandina pirtûkan çava pêkhatiye, dibe ku ji aliyê tu kesê ve pir zêde neyê zanîn, Lê tişta aşkera û diyare çend buyerên şewitandinê yên mezin pêkhatine ku dîrokê vedigêrin ango vegote dikin, Ji aliyê din ve dîrok behsa Îskenderê Makedonyayî, Moxol, Tatarî û Sultan Mehmûdê Xeznevî dike, Dervey Îskender ewên din hemû jî Tirk in û şewitandin û talan beşek buye ji çanda wan: bi vegote kirina dîrokê ve em bi awayekî demildest balbikşînin ser şewitandina pirtukan:

-Îbin Nedîm’ nivîskarê “El-Fihrist” ku derdora salên 987 ê zayînî de nivîsandiye û amaje bi vê dike ku Îskenderê Makedonyayî 20000 çermên ga ji ber ku Avesta li ser hatiye nivîsandin şewitandiye.

-Herwaha di derbarê şewitandina pirtûkan de gelek tişt li ser Erebên misliman têne gotin; Lê hindek ji wan yên dinê bi direv derdixin, Lê disa jî Ebu Rihanî Bîrunî’

---

[179]*Çavkanıye berî. R. 46*

[180]*Benawbangitrîn û seyru semeretrîn dadgayîkirdin le mêjûda,* W. Şemal Ehmed, Xaney çap û pexşî nima, 2015, R. 38

di pertuke (Epar El-baqiye Eni El-qirun El xalye) di rûpelên 35, 36 û 38 de di nivîsîne: Dema 'Quteybe yê kurê Muslim Serdarê Hecacî yê kurê Yusif' geheşte Xwarezm û cara duyem ew der girt, ew kesên ku dizanî xwarezmî binivsînin hemu kuştin, yan jî kesên ku li ser dîrok û zaniest û buyerên dîrokî yên dema derbasbuyî xwedî agahîbun hemû kuştin û pirtûkên wan jî hemû şewitandin.

-Herwaha di êrîşa Sultan 'Mehmûdê Xeznevî' ya ji bo bajarê Rey de, beşek ji pirtûkxanyên mezin ên vî bajarî hatine şewitandin û li gor dibêjin sedemê şewitandinê jî ew bu, ji ber pirtûka Şîe yan di wan pirtûkxaneyan de bun..

-Herwisa Ansîklopediya pirtûkxane ye zanist û zanyariyan di nivsîne: Carekê şaristaniyeta mezin a Îranê bi destê hin êrîşkaran ve hatiye têkbirin, Vê carê bi destê hoz û qabîleyên Moxol û Tatar di salên 1220 ê zayînê de ew buyer pêkhatibun, ku hatin mizgevtên wan kirin cihên gow û hespên xwe têde girêdan. Pirtûkxaneyên wan şewitandin û destnivîsên wan ên pir bi nirx kirin amûrê şewitandinê û xwe li ber germ dikirin.

-Di serdema Rizaxanê Pehlevî' û Mihemed Riza şahê' kurê wî de jî ahengên şewitandina pirtûkan hebû ye û li vê derê jî nivîskarekî mezin ê wek Ehmedê Kesrewî derdikeve, ku bi xwe yek ji wan kesan buye ku rêveberiya wan ahengan dikir û di yekem roja çileyê de her sal ahenga şewitandina wan pirtûkên ku li gora wan wek ziyan bun di şewitandin.[181]

Dîroka dur û dirêj a şewitandina pirtûkan buye çavkaniya xeyal û fantaziyên nivîskar, di avakirin û damezrandina çanda pirtûk şewitandina vê romanê de û bikaranîn û girêdana vê meselê ya bi nêrîna nasyonalîzmê ve, Di beşa duyem a romanê de roman nivîs grubekî bi me dide nasandin ku navê vê (Xenceriyên Nîvê şev in) û ji kesên ku ser bi dewleta Osmaniyan pêktê, Karê vê grubê şewitandin û têkbirina destnivîsên bi nirx pêktê, Destnivîsa Mem û Zînê ya Ehmedê Xanê' yek ji wan bu ku armanca êrîşa wan grubê bu ku di awela romanê wisa hatiye ziman: ((*Piştî nîvroyekê xweş a sala 1692 yê bu. Ehmedê Xanê li ser kursiyekî biçûk ya wekî li mala wan bu rûniştibû û guh dabû bavê xwe. Dema ku behsa tevgera grubekî jêre dikir, ku wek şêrpenceyê di nav bazineya Împaratoriya Osmaniyan de belav bune û li kuderê destnivîsekî giranbaha û bi nirx biketa destê wan di şewitandin…Wî berê*

[181].hittpis://fa.wikipedia.org/wiki/%DA%A9%D8%AA%D8%A7%D8%A8%E2%80%8C%D8%B3%D9%88%D8%B2%DiB%8C#.D9.87.D8.AC.D9.88.D9.85_.D8.AA.D8.B1.DA.A9.D8.A7.D9.86 wîkî pediyay Farisî, Wergêranî Resûl Sûltanî

*hindek tişt diderbarê desteya Xenceriyên nîvêşevê de bihîstibu, lê di vê baweriyê de nebu ku ewna hinde bihêz bin, ku bikarin destnivîsên li cîhên herî bi ewle û qahîm de hatine veşartin di malande bi dizin û bi şewitînin*))[182] tenê ew maye ku em bibêjin, di serdema Osmaniyan heta naha dîrokê bi tu awayekî buyerekî şewitandina pirtûkan re şahidî nekiriye, lê di wateya wek diyardeyek bi pergal û bi awayekî berfireh pêknehatiye, Ji ber ku di meseleya şewitandina pirtûkan de û bi awayekî taybet û li ser bingehê takekes de li gelek welatan de pirtûk hatine şewitandin Ne tenê li welatên paşketî, her li welatên pêşkevtî de jî ev rewşane hatine jiyan kirin, herwisa Ji dibe ku hindek buyerên bi vî awayî hatibin kirin ew ji tenê jî ber pirsgirêkekî takekesî ava bibe, ku zêdetir di meseleya ol û dijî ola de piranî derketibe pêş Ne wekû ji aliyê ji holê rakirina gelên din.

### 3.3.5. REHENDÊ DÎROKÎ Û PIROSEYA VEGOTEYÊ

Bi pêwîstî dizanim ku berî behsa piroseya vegotinê bikim, di vê romanê de bi çend awayî ye kî vegotin hatiye kirinê Ji vî alî ve vegote ((*Buyerê yan jî jê zêdetir, nûçeyekê yan jî ji wê zêdetir vedigerê ku êdî li krokiya rastiyekê ve hatibe, yan jî bi dahînana gumanekê ve*))[183] ji vêderê armanca serekî ya vegotinê derdike, ew jî ((*Vegotin divê bi awayekî hûnerî vergêrê ango vegoteyê bike ku ji aliyê kesekê ve hatibe pêkanîn û arasteyî verger bê kirin û amûrên vegotekirina buyerekê yan jî serpêhatiyekê bîne ziman û armanca dariştinê jî hestên verger bixwe ye*))[184] hindek car piroseya vegote kirinê di romanê de rasterast cure yên romanê li cem xwandevan ve aşkera dike, Di romanekî dîrokî ye weku (Xewna Zilamên Îraniyan) a Mardîn Îbrahîm de, wisa li roman nivîs dike ku bê xwasteka xwe buyerên dema borî vegote bike û eger em bi hûrî li awayê vegotekirina raboriyê temaşe bikin û hinek li beşên axaftinên taybet ên li ser beşa kar biponijin, emê bibînin berdewam kar li ser awayê raboriya sade û raboriya dûr dane, Ev jî her rasterast me ber bi dîrokê ve dibe.

---

[182]Xewnî pıyawe êranıyekan. R. 21
*[183] Micdî Wihbe 341*
*[184]tekniki geranewe le romanekani (Abdulla serac), rezan rehman xidir, wesenxaney rojhelat, hewler 2012, R35*

Roman nivîs di destpêka romana xwe de û di nav çîroka din de heta astekî serbixwe bi teknîkekî bilind ve Ofîlya wek kesê ku di nav romanê de vegoteyê dike bi xwandevanan dide nasandin, Ev çîroke di beşa yekem a romanê de ye, piştî wê ciwanekî li yanesiban pileya yekembunê jê re derdikevê, ku nirxê vê du milyon paunde, ji ber vê jî ew ciwane bi vî pareyê zêdeve biryara vekirina senterekê dide, ku taybet ji bo wan kesên ku di aliyên derûnî de têkçûne û pirsgirêkên wan xemgîniyê hene ji bo wan vedike, Ofîlya' piştî ku bavê xwe winda dike, heta astekê di aliyê derûnî de têkdiçe û ji vê sentera derûnî re tê birêkirin, Bi awayekî li vê senterê bi armanca dem derbaskirinê û li wê derê pêşbirkekî nivîsîna pirtûkan ji bo nexwaşan tê birêxistin kirin, Xelatê yekem jî pirtûka Ofîlya' digre ku di heyama şeş mehan de ev romane tê darijandin û piraniya buyeran bi zimanê wî ve wisa tê vegote kirin: ((*Ez naha li binkeyê ku xwedê giravî ku kesên wek min nexwaşê xemgîniyê ne, ji bo wan hatiye avakirin û vê çîrokê dinivsînim*))[185] di risteya yekem a romanê de dibêje: (*Piştî nîvroyekî xweş a sala 1692 ê bu*)[186] Di be ev romane di destpêka sedsala bîstûyekê de hatiye nivîsandin, Belê raste behsa dawiya sedsala hevdemîn dike û ev a belgeyeke ji bo sûd jê vergirtinê, bi taybet di derbarê buyer û kesayetî û cîh û amûrên dîrokê de, Piroseya vegote kirinê di vê romanê de heta astekî alozî dinav de hene, dibe ku ev jî bi sedema vê teknîka nû ya di nav piroseyê de hatibe bikaranîn ve pêkhatibe, Vegote kirin li gel birêveçuna buyeran bihust bihust berdewam dike. Lê li hindek cîhan de (kêm tişt dizane) zanyariyekî baş li ser buyeran tuneye ((*Ezhurkariyên reva çîroka Şevket û birayên wî nizanim*))[187] li hindek cîhan de jî vergêrvane(her tiştî dizane) dikeve pêş buyeran û despêk û dawiya buyeran bi xwandevan re digehîne Di nîvê romanê de behsa çare nivîsa destnivîsa (Ehmedê Xanê) dike û mizgîniya rizgarkirina destnivîsê ji xwandevanan re radigehîne, ((*Ez naxwazim bêjim bê hebûna Las destnivîs rizgar dibû, nexêr ez tu demekî waha nabêjim Eger Mîlyas neba kesnizane ka wê rizgarkirina vê destnivîsê çend sedsalên din bi dawî ketiba*))[188]ev tê wateya ku Ofîlya xwandevan piştrast dike ku destnivîs rizgar buye, Bi vî awayî berî buyeran dikeve û wekû vegotevanekî hertiştî dizanê derdikeve pêş û bal dikşîne.

---

[185] *Xewnî pıyawe eranıyekan. R.341*
[186] *Çavkanıye berî. R. 21*
[187] *Xewnî pıyawe êranıyekan. R. 42*
[188] *Çavkanıye berî. R. 50*

Ji bo vegote kirina buyer û serpêhatiyên nav romanekî çend cor û awayên cuda yên vegotekirinê hene, Roman nivîs jî bo nivîsîna romanekê xwe davêje awayên vegotekirinê bi vî awayî Ev jî pêktê li ((*vegoteya yekdengî, vegoteya du dengî, vegoteya pirkesî yan jî pir dengî*))[189] teknîkê pir dengî di romanê Kurdî de Bi hûrbuna di nav romanê de derdikevê, ku ev romane tenê ji aliyê yek kesî ve nayê vegotekirin û dibe ku roman nivîs sûd ji vê teknîka hewçerx verbigre, ku çend kes beşdarbin li piroseya vegotekirinê de, Las dervey ku behsa jiyana xwe dike, roman nivîs karakterekî wekî Las dike vegotevanekî beşek li romanê de Ev rewşe ji bo Îlya jî bi heman awayî ye, ku hin caran wek vegotevanekî pir diyar derdikeve pêş, Di beşa yekem a romanê de roman nivîs bixwe rola vegote kirinê digre ser xwe, li gel bi dawî buna beşa yekem rola roman nivîs jî bi dawî dibe. Em dikarin bibêjin vegotekirin di vê romanê de pêkhatiye ji awayê pir dengiyê, lê bi giştî jî beşa şêr a vegotekirinê ber Ofîlya dikeve û vegotevanê serekî yê nav romanê de ew bixwe ye.

### 3.4. Rêbaza Rexne Ya Bayografî "Jiyan Name Ya Roman Nvîs"

Wêje beşek giring ê jiyanê veduguhêze nav hinavên xwe, ji ber vê jî gelek caran tê gotin wêje eynika civakê ye Ji ber ku hemu diyardeyên civakî di nav de têne ragehandin, Nivîskarê wêjeyî yan jî roman nivîs jî berî ku wêje û estetîk ava bike, takekeseke ji takekesên civakê, Hemu pirsgirêk, milmilane û diyardeyên cuda cuda yên civakî rasterast bandorekê li du xwe dihêlin û li ser hest û hizir û bîr û nêrînên wî nivîskarî, Lê gelek cudayî jî hene di navbera takekesên civakê û roman nivîsekê de, Roman nivîs û wêjevan berî hemu mirovan diyardeyên ku pêkbên û buyerên li derdorê pênase dikin û baldikşînin ser wan, Ji ber vê jî dema pêkanîna nivîs û berhemekî wêjeyî de kêm roman nivîs hene ku bikarin jiyaname û ezmûnên xwe ji bîrbike, yan jî li berçav negre, Dema ku roman nivîs di nav romana xwe de buyerekê dike berhem gelek caran buyerên derdora xwe jî di nav piroseyê de vegote dike, Bi heman rengî dema ku li hewla avakirina karakterê romana xwe de ye, kesên derdora xwe û kesên ku nasyarên xwe jî dadirijîne. Di babeta cîh û demê de jî vê rewşê bi

---

[189] *Pirosey geranewe,* Heme Mantik, berêweberêtî çap û bilawkirdnewey Silêmanî, çapxaney derya, 2013, R. l65

awayekî diyar li gel raborî û jiyana xwe dike yek, di wan mijare de hemuyan de jî car car bi awayekî agahdarî û bi armanc pêktên û car car jî bê ku agahiya wê jê hebe bi awayekî serser dikeve nav dil û hinavên roman nivîs de, aliyên ponijîne bi awayekî bê agahiya wî dikevin nav romanê û dibin bingehê nivîsa wêjeyî, Gelek caran jî roman nivîsek di dema berhemanîna yekem a romanî de bi awayekî berçav û berfireh jiyan û ezmûnên xwe davêje nav romana xwe de. Mardîn Îbarahîm ku di sala 1974ê de li dayîk buye, di sala 2002ê heta 2012ê li Brîtanyayê jiyan kiriye.Di temenê xwe yê heşt saliyê de, bavê wî dimre û keçekî heye bi navê Ofîlya.*

Wan zanyariyên li jor li ser nivîskar hatini nivîsandin bi awayekî diyar û berçav di nav romanê de rengdaye, piraniya buyerên di nav romanê de yên li Brîtanyayê peyvendiya xwe rasterast bi jiyana nivîskar ve heye, Ji ber ku di heyama raborî de

______________________________.

* hevpeyvîn li gel Mardîn Îbrahîm 17.01.2014 Hewlêr –Royal Moll

roman nivîs bo deh sal li welatê Brîtanyayê jiyan kiriye, Deh sal têr dike ku roman nivîs bikarê sûd ji jînge û çand û ezmûnên welatekê verbigre, Bi têkeliya xeyal û fantaziyên xwe ve beyan bike û bi amûrên heyî ve dikare bingehê romanê bike berhem.

Di bersiva wan pirsyarên ku çima Mardîn rewşa mirina bavê Ofîlya’ ewqasê bi awayekî diyar nîşan daye Dema ku bavê Ofîlya’ yê dimire bandora ku li ser vê keçê bi awayekî zêde û di asta nepixandinê de ye, Ji ber ku piştî mirina bavê vê zimanê vê yê axaftinê namîne. Heta wusa lê tê ku dikeve rewşekî derûniya pir xirap de, Roman nivîs bixwe di temenê heşt saliyê de bavê xwe winda dike û dibe ku mirina bavê xwe û têkelkirina jiyana karakterekî nav romanê li hev anî be û ji ber jê heskirin û heman hestê roman nivîs bixwe ya ji bo bavê wî be, Di derbarê rengdana mirina bavê wî di nav romanê de Mardîn Îbrahîm dibêje: (*Rastûrast peyvendiya xwe li gel tuneye, lê dikare li ser asta* ***nest "la w'î"*** *peyvendiyekî veşartî û di bin re hebe. Ji aliyê min ve tu buyerek nayê derbaskirin. Tu buyerek nayê derbaskirin û kevin nabe. Hemû buyerek di jiyana min de heta dawiyê dimîne. Heger mayîna wan buyeran di sînorêhişyariya me de nebederveyagahiya me, di nav zindî buna jiyana me de dimîne û bandorê li ser jiyan, rabûn û rûniştina me û nivîsên me de xwe diyar dike, hin caran jî li ser jiyan û çalakiyên me xwe nîşan dide*.)** dibe ku ev bersiva Mardîn

Îbrahîm bersivekî me razî bike nebe, Ji ber ku Mardîn bi sê awayan û buyerên nav romana xwe de qala mirin û ji dest dana bavê xwe dike, Buyerek mirina bavê Ofîlya ye ku Bandorekî xirap li du xwe dihêle dibe sedemê ji destdana hêza axaftinkirina Ofîlya' Buyerekî din jî mirina bavê Las' û Mîlyas' e, Buyera sêyem jî dibe peyvendiya rasterast a bi roman nivîs bixwe ve hebe, Ew jî mirina bavê Xanî ye ((*Roja li dayîkbuna min de dayîka min li ser min giyana xwe ji dest dide, hîn ez di temenê xwe yê heşt saliya xwe de bum bavê min ji aliyê kûdateçiyan ve ango darbekaran ve, di dawiya salên şêstan de tê kuştin*))[190] Bi ponijandin û lêhurbuna ser kesayeta Xanî ku karakterekî nav romanê ye, ezmûn û dîroka jiyana roman nivîs rasterast xwe diyar dike, Ji ber ku wekî ku berî naha jî me destnîşan kiribu Mardîn Îbrahîm di temenê xwe yê heşt salî de bavê xwe winda dike.

Ji vî alî ve bi giringîdan û lêhurbun li rawestgehên giring ên jiyana Mardîn Îbrahîm û berevajî kirina bi buyer û serpêhatiyên nav romanê ve, îşaret bi peyvendiyeke bihêz û rengdaneyekî rasterast tê kirin, Bi awayekî eger jiyanameya Mardîn Îbrahîm em bixwînin, emê hest bikin dubare em mijûlê xwandina romana ''Xewna zilamên Îraniyan'' in, ji bo vê armancê jî ya herî baş ku ez dizanim nivîsa vê gotûbêjê parve bikim, ku tê de çend pirsekî girêdayî bi romanê bixwe ve girêdayî ne, rengdaneyeke di nav jiyan û ezmûnên nivîskar Mardîn Îbrahîm re hatine pêşkêş kirin û rasterast wekî ku li xwarê hatî nivîsandinê ye:

**pirs*: Sant Beev yek ji wan kesan bu ku rêberên rexneya jiyanameyê bu, (Biyografî) hewl dana kirina mijar û bi armanc kirina jiyana nivîskar dide, Heta ku di vê mijarê de li du hurkariyên nav nivîsa wêjeyî ve biçe û bixe ber rêjeya lêkolînan û analîz û rawekirinê, Vî alî ve Beev ragehandina karên rexneyî yên xwe giringiyekî mezin didetê û kar li ser dikir, Derxistina zanyariyan bu di derbarê jiyanameya nivîskar bixwe de, ku pêkdihat ji du ketin û lêkolîn kirinê û arastekirina çunayetiya kesayet û rewşa malbatî û hûnerî, bi taybet aborî û herwaha hewldana têgeheştina lêzanîna bihûst bi bihûst jiyana nivîskar dide, ji aliyê bedenî tenduristî û derunî…hwd, bi vê dîtinê û bi armanca avakirina peyvendiyekê em dipirsin gelo rawestgeha herî giring ên jiyana Mardîn Îbrahîm çi ne?

---

**hevpeyvîn li gel Mardîn Îbrahîm 12.04.2016

[190]Xewnî pıyawe Êranıyakan. R. 131

**Bersiv*: Nivîskar yan jiyana xwe dinivsîne yan jî jiyana ewên din li quncikê dîtina xwe ve ango pencereya xwe ve dinîvsîne, Beşa piraniya buyerên nav romanên min jiyana ewên dine, lê ez hindekê li wan nêzîk bum, ku wek ezmûnê jiyana min lê hatiye. Diyare tu romanekî min tuneye ku bi awayekî peyvendiyên xwe bi min re tune be. Yan jî peyvendî bi jiyan û raboriya hemu mirovahiyê re nebe, ku min ezmûnê jiyan kirine li gel wan bixwe ne, cudayiya edîp ango wêjevan û roman nivîs li gel kesên din tenê ew e ku wêjevan dikare agahiyan li ser êş û azarên yên din bide. Her mirovek xwedî cîhanekî çîrok, bîranîn û serpêhatiyên taybet ê xwe ye, Lê bi xwe nikarin hemuyan vergêrin ango vegote bikin Ji xwe herkesek nikare estetîk ango xweşikiyê bike berhem, Gelek caran wêjevan ezmûnê ewên din, jiyana ewên din û êş, azarên ewên din dike beşek li ezmûn û bîranînên xwe û di nivîsînê de bi cîh dike. Hin rawestgehên giring hene li jiyana min de, ku hindek ji wan buyerên balkêşin. Gelek kesên din jî hene jiyana wan wek a min e. dibe ku şer ê Îran û Iraqê bandorekî xurt li ser dîtina min kiribe. Ez wek zarokekî hemu tirs, bê hêvîbun û karesatên vî şerî min jiyan kirin. Xwe vaşartin li tirsa bombe baranên balefiran, tirsa birayên xwe û nasyarên xwe ya dibe ku her çirpeyekê bên girtin  û bên kuştin, Xortekî ciwan ê cîranê me wê heftiyê jiyana hewserî ango zevac pêkanî heftiya piştî wî termê wî bi awayekî parçe parçe ji malbata wî hate vegerandin, ji ber ku leşker bu. Xortekî ciwan ê kesê me li leşkeriyê reviya bu û girtin, gulebaran kirin û heta naha jî tu yek ji wan buyerane ji bîramin neçûne û naçin jî, Rawestgehekî din jî mirina bavê min bu, ku wê demê ez heşt salî bum. Bavê min bi temamî heval û hogirê min bu û ez jî yê wî bum, Di sibeyekî zûde, em hemû malbat li hevşê razabun, Bi girîna dayîka xwe ve ez ji xew hişyar bum û got bavê we miriye, Piştre awahiyên me bi dozeran ji aliyê hikûmeta Baas ve hatin hilveşandin, Wê demê jî temenê min heşt sal(8) bu û hindek zarokên bê bav ketine nav nêrîn û nivîs, helbest û romana min de ku bi awayekî li ser buyeran siya wan tinebê.

Salên heştêyan salên  zaroktiya min in û serdemekî tejî li êş, şer û bê hêvîtiyê ve dagirtî bun Bombebaranên balefiran xweveşartina kes û bira û nasyarênme ya ji tirsa zilamên Baasî, herwaha girtin û lêdan û darve kirina ciwanên welat û piştre jî wêran kirina gundan û herwaha çekên kîmyayî û enfal, li gel wan hemû buyerane min jiyan kir Ji ber vê jî bandorekî kûr û bi êş li ser jiyana min û cîhana min a derûnî

ava kir, Wêjevaniya min çi helbest be û çi roman be nikare ji wan buyeran xwe qutbike.

*pirs: Gelek gazind li cenabê we tên kirin ku çima Pêşmerge tenê wek çekdar bi nav dikî û ji aliyê din ve jî çima te xwestiye di nav wan rêzan de(Pêşmerge) cîh bigrî û ji wan re dibêjî cengaver? Herwaha ji xwe navê diyar û pênaseya çekdarên xebatkar ên Kurd her berê de Pêşmerge buye? Yan jî ji ber ku xirap bikaranîna desthilat û bidestxistina armancên piştî şoreşê navê Pêşmerge bi awayekî rewa nabînin bo xebatkaran?

*Bersiv: Wêje bixwe ji ber xwe girênade bi filan tişt, yan navê wî çiye û di nav xelkê de jê re çi dibêjin, Pêşmerge raste di asta mîllî ango netewî de sembola xebat û berevaniyê ye, Lê ez wêjevan im Dîtinekî mirovî li gel min giringtire ji cîhanê re û ji bo pirsgirêkan, Nabe Pêşmerge wek hebûneke bê guneh û îdeal bibînim, Ma Pêşmerge şerê navxwe jî nekiriye? Ma Pêşmerge bi hezaran Pêşmergeyên din ên hêzên din ne kuştiye? Divê tund û berçav û em rastgotinê esas bigrin, Pêşmerge çend gule berdabin dagirkerên Kurdistanê û dijminan, hinde jî avêtine hemwelatiyên me bixwe û Pêşmerge hêzên din ên Kurd jî dane ber guleyan, Wêjevan mijûlê nivîsa xwe û yên din e pir ne giringe kesên din çi dibêjin, ya giring ew e wêjevan bi rastgotina xwe ve agahdariyên li ser dem û wextên dîrokî bide, agahdariyên ruhê netewî bide ku zerûrî dibe li gel ruhê mirovê me de yek bigre, Pêşmerge û kiryarên wî divê bên pênase kirin li gel hestên mirovî û yên exlaqî yên kur ve bên pênase kirin, heger na nabe û li gel tu nirxa vê li gel min tuneye.

**Pirs*: Di sal jiyana we ya li London û mana we ya li Îranê çi bandorek li ser xeyalên nivîskariya we ava kiriye di dariştina romanê de? Ji ber ku ev du cîhe ne cîhekî berfireh di nav romanê de dagir kirine.

**Bersiv*: Min li Îranê jiyan nekiriye, tenê çend car bi serdan çûme wê derê. Lê di derbarê Brîtanyayê de, ez deh salan mame û heta astekî temenê civanîya xwe ya 28 heta 38 saliyê min jiyana xwe li wê derê derbas kir, Dikarim bibêjim ji bo min wa li hev hat ku, hem cîhanekî din, hem xelkên din û hem jî ezmûnên din bibînim, Dervey vê jî derfetên din ji bo min afirandin ku bi kurî li ser raborî û bîranînên xwe

bi ponijim, Beşekî giring ê xwendina akademîk û lêhurbuna wêjeyî, min li Brîtanyayê dît, Heta astekê jiyana min pir dewlemend bu li wê derê, Nivîskarên din, ezmûnên din û çandên din min dîtin, dervey vê jî ku berdewam mirov zimanê Ingilîzî ku bixwe pir bandorekî bi nirxe ji bo kesê ku bixwaze fêr bibe. Dikarim bêjim jiyana min a li Brîtanya yê neba, ezê naha bi temamî kesekî din bam. Nizanim çava bêjim, lê bi piştrastî dikarim bibêjim kesekî cuda û pir cuda ji naha bibam, hem ji aliyê dîtin û cîhanbîniya min, hem jî selîqeya estetîka min wê cuda ba.

Lê xalekî giring heye ku ez amaje pê bikim, seferên wêjevan ji seferê bêhtir, di xeyalan de pêktê. Dibe ku te tu cîhekî cîhanê nedîtibe jî, dervey bajarê xwe dibe te tu cîh nedîbe, lê bikarî wêjevaniyekî pir giring jî bikî berhem û bidest bixî, Ya giring hêza dahênana mirove, ya giring hêza xeyal û fantaziyên mirov e, Teqana gur a wêjeyî di xeyal de pêktê, Dikare sefer û dîtina welatên din ve çandên din beşdar bikî û dewlemend kirina xeyalan ve berhem bidest bixî, lê bandorekî giring û zarûrî pêknayê.

*Pirs*: Nivîskar di berhemê xwe de zimanekî tund û tûj ê rexnegiriyê bikaraniye, gelo berhemê te eynikeke li pêş ruxsar ango ruhiyeta desthilatdarên Kurd de, ku di vê derê de kêmasiyên xwe bibînin, yan rê çareyekê tu ji wan re destnîşan dikî?

**Bersiv*:Karakterên di nav romana min de jiyana xwe, bixwe jiyan dikin Digrîn, aciz dibin, kêfxweş dibin û rexna dikin, Dervey vê jî giringe mirovên me bizanin cîhana me şirîn nîne, pîse, tejiye li zulim û sîtemkarî û ne şayesteye (layiq) bo mirov, Romana min qalavê rewşê dike ku rewşekî dervey mirovîbunê heye, Wêje ya min nikare makyaja rastiyekê bike ku, pîs û xirab û ne şirîne, Ji ber ku wêjeya min dixwaze pênaseyekê bike Tiştê ku min heye her ew e ku ez dikarim bi rêya nivîsên xwe bibêjim, karê min xulqandina estetîk ango xweşikbunê ye û avakirina fezayekî atmosfer estetîke, ku nivşên naha û yên pêşerojê tam jê bigrin û herwaha bi rêya xwendinê ve wateyekî bidin bi jiyana xwe.

Roman nivîs dikare gelek tişt li ser vê demê û dîrokê bibêje, ku tê de jiyan dike. Dikare gelek tişt bibêje ku dîrok bi awayekî fermî nikare bibêje, Dîrok zêdetir îşaret dike ser xetên giştî yên buyeran, lê roman dikeve nav hurkariyên gelek mijar û

meseleyan, Wêjevan beşdarbunekî giring dike li piroseya gohertina fezaya siyasî, civakî û çandî de, Piroseya gohertina buyerekî kit, tejî û dramatic nîne Ji ber ku di piroseyê de gelek cîhan beşdariyê lê dikin,  Wêje bi rêya dahênanê ve wateya estetîkê ya nû di cîhanbîniya me de digohere û wa li me dike ku bi awayekî din û li quncikêkî din ve em temaşey cîhanê û buyeran bikin, Ne karê wêjeyê ye ku rê çareyan destnîşan bike. Wêje bi temamî bi tiştekî din ve mijûl dibe, Wêje qala pirsgirêkên ontolojiya mirov dike Xweşiyên vê, êşên vê xem û şadiyên vê, jiyan û mirin û eşq û evînê dike mijar,  Lê bila li bîrame neçe cîhana me ne şirîne, pîse, tejiye li nedadperweriyê û sîtem û zilmê, Desthilatiya siyasî ya me li ser heman çanda siyasî ya bingehê xwe rojhilatiye, siyaseta me xwadiyê aliyê exlaqê mirovî yê kêm nîne, ewên ku xwediyê desthilatê ne li vê dere bi tu awayekî xwediyekî rewabuna siyasî û exlaqî nînin Ji ber vê jî bi awayekî di berxwe de reng dide din av wêjeyê de.

**Pirs*: gelo Mardîn wan çend salên li derve buye, aşîna buye li gel xelkên welatê Bosna û Hersekê, ev qas buyerên li wê derê pêkhatine xistiye nava romanê?

**Bersiv*: Nexêr tu kesekî ji xelkê Bosna û Hersekê nebuye hevalê min, hemû zanyariyên min ên li ser wan bi rêya xwendinê û ji çapemeniyê min bidest xistine, Lê ji ber hin ezmûnên wan di hin aliyan de nêzîkê yên me ne, bala min kêşa û bu sedem ku ez nirx bidim doza wan. Hem ji bo bibe peyamekî mirovahiyê jî, ji ber ku ez êş û xemên her mirovekî li cîhanê de dijî wek êşên dizanim. Ewên ku cîhan wan jibîr dike, wêje wan jibîr nake.

**Pirs*: gelo nivîskarê romana dîrokî, erkê ser milê wî ye ku mijar bi mijar buyerên dîrokî binivsîne? Yan dikare tiştên wek buyerên serdemekî diyar jî qala wan dike, tenê peyamekî xwe hebe, lê li gel rastiyan hevdû negre? Beşekî piraniya buyerên nav vê romanê de rengdaneya jiyanameya nivîskarin. Ya herî diyar bi cîh maye û nemana bawerî û hêvî  bi welat, herwaha  ji aliyê ciwanên welat ve piştî raperînê derketina dervey welate, diyare hûn jî yek ji wan ciwanan bun.

**Bersiv*: Nexêr roman nivîs ne dîrok nivîs e, roman nivîs dema ku dîrokê şirove dike, bi temamî giringiyê dide dîrokê û asoyên din li pêş dîrokê ve dike, Waqiî ango

rastiyên nav romanê heman rastiyên di nav dîrokê de nînin. Roman rastiyekî bi fikirandinê pêkhatiye, ne wekû rastiyekî di wateya ku em dibînin û tê de jiyan dikin, dîrok wêneyekî pir giştî û buyerên mezin digre navxwe, lê roman nivîs dikeve nav xetên hurkarî û amaje û şiroveya jiyanê û aliyên karakter ên pir hûr, Dîrok ji me re dibêje Ehmedê Xanê filan salê jiyan kiriye û filan salê de miriye, Lê wêje qala ji xew rabun û razan, eşq, xembarî û jiyana wî ya sade ya rojane û bi hûrî ji bo me qala hemû wan hurkariyan dike, Roman nivîsê dîrokî, dîrokê nanivîse, Ji ber ku nivîsa wî wêjeyî ye û çava ji bo vegote kirinê sûd ji gelek cîhanên din verdigre, herwaha bi heman awayî ji dîrokê jî sûd verdigre, Dibe ku li şirovekirina dîrokê de wek cîhanekê ji bo wêjeyê li gel dîrok nivîs bixwe cudayî hebin. Roman nivîs dîrokê nanivsîne, ji ber fikir li ser pêşdixe.

**Pirs*: Navbirina karakterên te, peyvendiya xwe bi jiyana te bixwe ve heye, bo mînak navên zarokên xwe te kirine navên karakterên serekî yên romana xwe, hem Ofîlya û hem jî Mîlyas jî. Ji bo navên xaltiya Rebîkaw Hêrbert, Îlya, Îşmaîlov, Las û Denkehenar hun çi dibêjin? Piştî ku çend navek di dîrokê ve tên xwastin, ji wan jî Xanî bavê Las, ji navê Ehmedê Xanê sûd hatiye vergirtin, Herwaha Tehmasbî jî sûd vergirtine ji Şah Tehmasbî, ku şahê Safevî ye û herwaha gelek navên din jî sûd ji dîrokê hatiye vergirtin.

**Bersiv*: Di rastiyê de berevajî vê Min navê karakterekî  di nav romanê de li zarokê xwe kiriye, ne ku navê zarokê xwe kiriye karakterê romanê ev berevajiye, Zarokê min piştî belavbuna romana min li dayîk buye, Beşek ji navên di nav romanê de hema nav in û temam in, navên din jî, ji ber ku min şiroveya dîrokê kiriye bo teknîka vegotekirinê, ji ber vê jî min baştir zanî ku navan jî her ji dîrokê veguhêzim, Wekî ku min hewldaye min xwestiye fezayekê bi xulqînim, li fezaya serdema wan buyeran ve biçe Ew jî min xwest navên ku ez bikarbînim peyvendiya xwe bi feza ya çandî û herwaha bişibe serdema wan buyeran.

**Pirs*: Piştî çar sedsalan hîn jî grubên xencerên nîveşevê li dû destnivîsê dikevin, di encamê de Las dibe qurban û tê kuştin, Gelo rewşa naha jî heman rewşe di derbarê nasyonalîzmê de? Dewleta Tirkan bi heman hizir û zihniyeta çar sedsal berî naha li doza Kurdan dinêre?

**Bersiv*: Mixabin di cîhana me ya naha de zebir ango derb, zeng, tundî, tîjî, çeng û kawilkirin ji berê zêdetir buye û kêmtir nine, Hîn jî li vê navçeyê û herêmê hikûmet hene li dijî pêşketina çandî, siyasî û netewî yên grubên civakî yên din in, Di naha de gotar û daxuyanî hatine gohertin, cil û berg, dew û çav hatine gohertin, lê rewşa mirovî ya navçeyê her di asta karesat bare wekî berê û jê zêdetir jî ye, Xewna wêran kirina yên din ên dervey xwe û paqijkirin ango tunekirina cudayiyan, sitû pê danîna ji yên dervey xwe re wek hebûnekî cuda hîn jî xewnekî zindî ye Di cîhanê de gelek tişt hatine gohertin Mirov, peyvendî, bajar û gund, awahî, amûr hemû hatine gohertin, lê xewna dagirkirina mirov ji aliyê mirov ve, herwaha xewna sîtem û dagirkeriyê, xewna perçiqandinê, xewna wêran kirina jîngeyê û çanda ewên din xewnekî zindî ye û pir bi taybet di vê herêm û navçeya me de li pêş e û hîn jî mirov nebuye senter ango navend, Hîn jî mirov wek amûrekê tê bikaranîn ji hin armancên îdeolojîk, olî û berjewendiyên din ên piranî caran bi temamî berevajî mirov bixwe ne.

*** Têbînî: Dema ku me ev gotûbêj li gel Mardîn Îbrahîm pêkanî. 11.04.2016

# ENCAM

Di dawiya vê lêkolînê de, piştî guftûgokirina mijarên ketine ber lêkolînê, em dikarin bi awayek giştî behsa encama herî giring a ku me bidestxistî bikin. Encam jî ji yên li jêr pêk tên:

Roman yek ji rêbazên herî giring ên edebiye. Bûyer, cih û kesayetiyên dîrokî dike amrazên bingehîn di hilberîna romanek dîrokî de.

Ji bo zêdetir ji romanek dîrokî fêm bikî, dîtina gelek gotar û wateyên veşartî, pêwîste lêkolînvan û rexnegirên edebî hewla hûrbînîna gelek regez û diyardeyên (fenomen) giring bide. Ji wan jî; serdem, jîngeh (ekolojî) û nijad.

Ev roman, romanek dîrokiye. Ji ber ku hemû roman behsa bûyer an jî çend bûyerên dîrokî yên giring dike.

Di nava romanê de fikra nasyonalîzma Kurdî bi awayekî berçav hatiye behs kirin. Ji bilî fikra nasyonalîzmê, em dikarin bêjin wêjeyeMardîn Îbrahîmwejekî miroviye ku derbirînê li hemû xem û êşên mirovatiyê dike. Bêyî giringîdayîn û vegera beşên nîştîmanî. Diyare hevgirtina fikrê nasyonalîzim û pêşkêşkirina edîbekî mirovî di nava romanê de, ne karek wisa hêsan e. Lewra em dikarin bêjin, romannivîs heta astekî zêde û bi awayekî serkeftî, karî li ser vê mijarê dû mijarên dijî hev kiriye yek û bi hev ve girêdaye.

Romannivîs di nava bingehê bûyerên dîrokî de, bi şaşî navek dîrokî, cihek dîrokî û salek dîrokî destnîşan dike.

Li ser bingehê rexneyên biyografî (Jiyannemaya Tekstnûsî), bi awayek eşkere jiyana nivîskar di nava romanê de reng dide û hest pê tê kirin. Ango romannivîs beşeke zêde ya jiyana xwe vegûhestiye nava romanê.

Kuştina jinan weke diyardeyek ku ji çandan Ereban tevlî çanda Kurdî bûye, bi eşkereyî di nava vê romanê de behsa wê hatiye kirin.

Ahmede Xanî weke helbest û kesayetiyekî dîrokî, di romanê de bi rêbertiya fikrê neteweya Kurd tê bi nav kirin.

Li gel fikra nasyonalîzim û neteweyî, behsa rewenda Kurdî ya li dîasporayê (tarawge) aliyekî din ê vegêrandinê ye. Di nav de fikra windabun anasyonalîzma Kurdî piştî raperîna sala 1991'an û piştî hilweşîna rejîma Baasê jî têxe ber çavan.

Tevî ku romanek dîrokiye, xeyal û fantaziyekî berfireh heye. Bi taybet jî di beşa dawî ya romanê de.

Bi hûrbîna li ser navnîşana romanê, hest bi aliyê dîrokî jî tê kirin. Ji ber ku behsa xewna sê zilamên Îranî tê kirin. Bûyerek dîrokiye û xewnê bi dayîkbûna Hz. Mesîh a li Orşelîm ve dibîne. Ev çîrok jî bi eşkereyî di nava pirtûka pîroz 'Incîl' li gor vegêrandina 'Meta' behsa wê hatiye kirin. Di vî warî de bi awayek giştî weke pirtûkek dîrokî sûd ji pirtûka pîroz Incîlê hatiye wergirtin.

**ÇAVKANÎ**

*Abin Xelekan*: Wifyat El ayan Wabta El İzman, c7, R.27-33

*Alam Morxun, Receb Mehmud Bexît,* Mektebe la Cizîre El urd- Qahire, 1984, R240

Aram Sedîq, *Nawnîşan le çîrokî Kurdîda,* Berêweberayetî Çap û belawkirdnewey Silêmanî, Çapxaney Karo, KERKWK 2009, R.22

Arî Osman Xeyat , *Bingehê buyeran,* çapxaneya Narîn, kerkwk 2011, R, 67

Avan Mihemed, *Komara Eflatun,* çapa yekem, Kerkûk 2010, R. 324

Azad Ebdulwahîd Kerîm, *Teoriya Edeb,* Çapxaneya Erabxa, Kerkûk 2007, R.13

Bextiyar Elî, *Wek Baskdara di nav Daristana tirsonekan*, Çapxaneya Endîşe 2012 , R.47

Celal Enver Seîd ,*Gotûbêj li Romana Kurdî Kurmanciya jêr di sala1991 – 2003* , zankoy selahedin, hewler 2013 , R. 20

Cemal nasir, *neziriye tarîx adabiyat,* çap û sala 1387 , Tehran Sixin , R. 39

Cemîl Êab *Mem û Zîn a Ehmedê Xanê,* Çapxaneya Aras, çapa yekem, Hewlêr 2008 R.11

Corc Seîd Yusif, *El-tigur El inqid El-Edebî fî alêr El hidîp,* Minşurat Dar El miktebe El heyat , Beyrut-Libnan, R. 44-45

D. peri salih mifti, *geranewe le cirokekani ahmed mihemed ismaeil de,* wesanxaney haci hasim, hewler, 2012, R128

Deven Hesen, *Deriyek li Felsefeya dîrokê*, Dezgay çap û belavkirina Rojhilat, 2011, R. 314

Ebdalistar Ehmid Gahir, *El İnqid wel Edeb fî El êr El Hidîp*, Migbe El Erşad,1983, R.119

Ebdule Xelîfe, *Min El-rîwaye , El-tarîxiye* , Dar ElErebiye , El İlim , Cezar , 2007 , R43

Ebdulezîz Hisên Fetuhî, *Fî el-Neqd El-Erebî El hidîs,* dar El-inhge El-Erebiye, 1993 , R. 62

Êlah Fiçil *, Fî El İnqid El Edebî*, Migbe mihemed, Dîmeşq 2007 , R.16

Elî Mihemed Alêlabî û Ehmed Ebdulrehman Ehmed û Nîhad Celal Hebîba *Dewleta Osmaniyan ji ber pêşketina têkçûna wê*, Kitêpxaney Narîn, çapî yekem , hewlêr 2007, R.128

Emînê Osman, *Mem û Zînî Ehmedî Xanî*, Çapa Yekê, Migbe El Cahiv, Bexdad, 1990, li 65

Eyan wat, W. Rauf Bêgird, *Serhildana romana Îngîlîz* , Dezgayê çap û weşana serdem 2009, R. 21

Ezîz Gerdî, *Hûnera Helbestê(helbestvanî) Arîsto*, Silêmaniye 2004, R. 31

Faq Mêgfî, Dr. Ebdalriça Elî , *Fî Elinqid El edebî El Edîp* , wezareta İlîm Alî walbihp El İlmî, Camie El Miwêl 1989, R. 169

Fensan jûv, *bûtîka roman*, W. Dr. Mihemed Rehîm Ehmedî, Dezgayê Aras, Hewler 2012, R. 15

Ferşîd Serînî , *Kevirên Ruh ,Dîroka TêgînênFelsefî ji kevin heta îro,* Dezgayê çap û weşana Serdem , 2014 , R30

Haşim Ehmed Zade ,*Ziman, Wêje û Nasname* , Dezgayê Aras , çapa yekem , 2011 , R.309

Haşim Ehmed Zade, *Cîhana roman,*nawendî roşinbîrî w hunerî andêşe, ٢٠١٥، R.8

Heme Mantik, *Pirosey geranewe*, berêweberêtî çap û bilawkirdnewey Silêmanî, çapxaney derya, 2013, R65

Heme Seîd Hesen, *şîîri û Şîmşêr,* dezgayê aras, Hewlêr 2012, R. 42

Heme Seîd Hesen,*Li heyivda bo rûy to û le peyivda bo xom degerêm,* dezgay aras, 2010, R. 77

Hemîd Ezîz, *Bineretekanî felsefey komelayetî* , çapxaney Rojhelat , Hewlêr 2009, R.79

Hesen yusuf bireji, *rehendi komelayeti le romanekani atay nehayi,* wesana mardin, HEWLER2010, R.50

Heyderî Hacî Xidir, *Rexne û îdeolojya* , Senterî lêkolînewey fîkrî û edebî nima , çapî yekem , hewlêr 2005 , R.25

Hîmdad Hisênî , RexneyaWêjeya nu ya Kurdî , dezgayê Mukriyanî çapa duyem 2010, R. 294

Hîmdad Hisênî, *Deriyek ji bo rexney wêjeyî ya nû Kurdî*, Dezgayê Mukriyan çapa yekem 2009, R. 39

Hisên Ehmed Himdanî, *Al-neqid Al-ictimaî fi El-edeb El-Erebi*, Migbe Camie El-eyn El-Şemis 1971, R. 117

hittpis://fa.wikipedia.org/wiki/%DA%A9%D8%AA%D8%A7%D8%A8%E2%80%8C%D8%B3%D9%88%D8%B2%DiB%8C#.D9.87.D8.AC.D9.88.D9.85_.D8.AA.D8.B1.DA.A9.D8.A7.D9.86 *wîkî pediyay Farisî, W. Resûl Sûltanî*

http://www.mwfpress.com/vidciqwa5.t1arr2bicct.hotmail

http://www.qaladze.info/la-mediakanawa/293-2011-05-05-00-38-18.htm

Îbrahîm Hesen Hemed, *Rengdaneveya kevneşopiya romana Kurdî 1985 – 1991* , Nameya Maseterê, Zankoya Selahedîn, 2011, R.44

Ihsan Tofîq simî', *waqî' El-rîwaye El-Erebiye,* dar El-wefa, beyrut 2002, R. 76

Îsmaîl Ebdulselam Mecîd, Dar Agilîe, Bîrut 1979 R 92

İzedîn Xalid İbrahîm, *El inqid El tarîxî fî El edib* El- heqayq El İgbae wel nişr- Bêyrut, 1994, R. 33

Karzan Kerîm Amîn , *Arastekanî rexneya şîîrî kurdî ,* Namey master , zankoy selahedîn , 2009 , R19

Kemal Meruf , *Teore nûyekanî rexney edebî,* çapxaney Lerya, Silêmanî 2012, R.28

Kemal Mezher Ehmed *kurte vegotinekî zanistî ya dîroka Kurd û dîrok* , çapxaneya Dar El-Efaq El-Erebiye , Bexda 1983 R.39

Keywan Azad Enver, *Rêbaza lêkolînan û Rêbazê lêkolînkirina dîrokê,* çapxaneya çarçira, çapa sêyem, Silêmanî 2008, R. 17

*Kovara Raman* , hejmara 177, R. 80

Leo Tolstoy, Hejar Rehîmî, *Hûner çiye?* Dezgay Mukriyan, hewler2009, R. 5

Mardîn Îbrahîm, *Xewna zilamên Îranî û kewtinî bore qela le hîkayetêkî konda,* Nawendî roşinbîrî û hunerî Endêşe, çapî duwem, 2013, R. 22

*Menhec Al-neqid Al-adebî,* Eni Dar Alimigbuat Cedîde-El-Îskenderiye,1984, R. 43

Mihemed Ebdulselam Kefaî, *Edebî Berawirdkarî,* Dezgay Tiwêjînewe û bilawkirdnewey Mukiryanî,2011, R. 43

Mihemed Selah Haşim, *Neqd El tarîxî fî El Edeb,* Minşurat Dar El miktebe El heyat, 1989, R. 53

Mihemed Silêman, *El-Edep w al-finune,* Dar Al-tinuyirg, Bîrut 1981, R. 85

Mîran Celal Mihmemed, *Bingehê buyeran di romana Kurdî de,* Çapxaneya Rebî' Silêmanî , 2009 , R.54

Mistefa Hisên, *El Edeb û el-tarix,* Dar El Meruf 1981, R. 32-33

Mistefa Rewuf, *Fî El-Şeir Wel Edeb, Ehmed Fiçil Şiblul* dezgayê çap û weşana hawdem, Çapa duyem, kerkuk 2009, R.11

Mûtesem Saleyî, *wêje û Hûner*, çapxaneya Rûn, Silêmanî 2007, R. 130

Nasir Îranî , *Henir Reman*, agae – Tehran , 1380, R. 48

Neme Qerenî Îsmaîl, *Hunerî jiyanamey xudî le edebî kurdîda*, namey master, zankoy selahedîn, hewlêr, 2004_2005 R48

Nerîman Ebdula Xoşnaw, *Arîsto mamostayê yeke*, Çapxaneya Rojhilat, 2014, R. 212

Newşîrwan Mistefa Emîn, *Bedem rêgawe gulçinîn*, kitêbî yekem, Aldar El Erebiye ll İlum Naşrun – Beyrut Libnan 2012, R. 47

Qasim Ebdî Qasim, Dr.Îbrahîm Ehmed El Îshwalî, *El-Rivayet El-tarîx fî El Edeb El Erebi El hidîs*, Dar El Meruf, Qahire 1979, R. 9

Rehîm Sabir , *Felsefeya dîrokê*, çapxaneya genc , çapa duyem , Silêmanî 2005 R 186

Reza huseyin, *Nezirîye tarîx Edebiyat* , çapa sala 1387 , Tehran Sixin , R.39

Rêzan Osman Mistefa, *bunyadi corekani rudaw le romani kurdi basuri Kurdistan da* , *(1985-1990*), hewler 2010, R. 43

rezan rehman xidir, *tekniki geranewe le romanekani (Abdulla serac)*, wesenxaney rojhelat, hewler 2012, R35

Rêzan Rihman Xidir, *Teknîkê vegotinê li romanên Ebdula Serac*,Silêmanî 2012, R.16

Ruz be, Mihemed Reça, *Edebiyat Masêr Ayran*, Cab Dûm, Neşir Rizgar, Tehran, R. 34

Şakir Mêgfî , *Eltarîx El Erebî, Elmoruxun El Ereb*, , Dar El ilim Elimlayîn- Beyrut, g 3, Sine 1987, c1, R. 430

Salih Qeftan, *Dîroka gelê Kurd û netewa Kurd Turkman nîne*. çapxaneya Çwarçra, çapî çwarem, Soran 2012, R.214

Selah aumer, *Pirtûka Gîrfan(Berîk)* , silemaniye 2011, R. 31

Selah Omer, *Roman û waqî'* , Dezgayê çap û weşana Serdem, Hewler 2008 , R. 94

Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî , *Binyadî gêranewe le dastanî ( Mem û Zîn ) î Ehmedî Xanê û romanî ( şarî musqare sipyekan)î Bextiyar Elî da* , dezgay mukiryanî , 2009, R25

Serdar Ehmed Gerdî, *Teoriya wêje*, Çapxaneya Mardîn, Hewlêr 2010, R. 32

Serdar Ehmed Gerdî, *Teoriya wêjeyî*, Çapxaneya Mardîn, Hewlêr 2010, R. 324

teha wadi, *dirasat fi neqid el-riwaye,* el-hia'e el-misriye el-a'me lilkitab, 1989 R. 310

W. Asos Mihemed Mela Qadir , *Dîrok çîye?* Çapxaneya Wezareta Perwerdê , çapa yekem , 2005 , R. 11

W. Cevad Mistefa , *Roman çîye? Komelek nwser* , dezgay mukiryanî, 2009, R. 89

W. Dr.Mihemed Tatanî, *Dr.Besam Qetus ,Derwazeyek bo mîtodekanî rexney hawçerx*, çapxaney Şivan çapî yekem, hewlêr 2011 , R51

W. Ebdulxaliq yaqûbî, *Rexneya edebî û Qutabxanekanî – Pêşekîyek bo teorî Charles Bresler* , çapa duyem, Hewlêr , 2007, R79

W. Ejî Goran, *Roman û pîşeya nivîsandina roman* ,dezgayê rewşenbîrî û belavkirina Kurdî, Bexda 1982, R. 5

W. Enwer Qadir Mihemed , *Pirensîpekanî edebnasî berawird* , *Aleksander Dîma* , çapxaney kemal, 2001 , R. 182

W. Hejar Rehîmî , *Edebî Berawirdkarî ,Mihemed Ebdul Selam Kefaî* , Dezgay Mukiryanî , çapî yekem , 2011, R48

W. Sebrî Çawşîn Xano, *Xewnamey Îbin Sîrîn û Kurdî,* Nawendî çap û belawkirdnewey Soran 2015, R. 6

W. Şemal Ehmed, *Benawbangitrîn û seyr û semeretrîn dadgayîkirdin le mêjûda,* Xaney çap û pexşî nima, 2015, R35-60

W. Şîrîn K, *Tîşkêk bo ser roman* , , Dezgaya Serdem , 2006 , R. 8

W. Şivan Ehmed , *Nivîsîn û Bêdengî,* Dezgayê Rewşenbîrî Cemal Irfan, çapxaneya pîremêrd, 2015, R. 61

W.Ebdulxaliq Yequbî , *Charles Brêslêr, Rexney Edebî û Qutabxanekanî* , Dezgay Aras çapî duwem , 2007 , R35

Welîd Qesab , *Menahc El-Enqid El-Edebî El hidîs* , dar El-fikir _Dimeşiq 2007, R.25

*xerîte al'alm alşamil syasî*

Zahîr Rojbeyanî, - *Karubarîvegoteyê* , dezgayê çap û weşana Serdem, 2010, R. 7

## XWE JÎNENÎGARÎ

Di 17/6/1992 li bajêr a hewlêr ê hatim dinya yê. Lise ya xwe ji xwendinge yê “Barzanî Nemir” qedandiye herwisa lîsansa xwe  li zanîngeha selaheddînê qedandiye. Niha jî xebat dikim ku lîsansa bilinda xwe li zanîngehe yuzuncu yîlê biqedînim....